


kovara hunerî, çandî û lêkolînî ya kurdên anatoliyê

bîrnebûn


hejmar 64 2016



Em dinivîsin, çunkî
em dixwazin fêrî xwendinê bibin

MIZGÎNÎ BO ZAROKAN!

Çîrokeka evîndariyê ya nû bi kurdî li kitêbxaneya zarokên kurd zêde bû.



Çîroka Hêstirên Graniyê li ser du pêşengên bihêz angî cinê ku navê wî Tijda ye û rahîbeya xweşik a Îrlandî ya bi navê Grania ye û bi îlhamgirtina ji efsaneya 500 bakîreyan ku efsaneyeke kevn a kurdan e, hatiye nivîsandin.

Dema ku ji ber hatina artêşa Romayê civaka Graniyê dikeve rewşeke metirsîdar, Tijda û Grania îtifaqekê pêk tînin ku di encama vê îtifaqê de gelê kurd pêk tê. Di çîrokê de xwêner dê bibînin ku 500 xalîçeyên efsûnî bi hişkî vedinişin erdê, hêstirên êşê dibin yaqûtên sor û baxçeyekî efsûnî ku dê darên hinaran jê derkevin.

Ji ber mijarên xwe yên koçberiya bîzorê û wekheviya zayenda civakî, Hêstirên Graniyê çîrokeke perîyan a mafên mirovan a sedsala 21ê ye.

Hêsirê Grania sanikêka efsûnî ya ke îlhamê xo efsaneya kurdan ya 500 bakîreyan ra gêna. Na sanike behsê di serekanê bihêzan, bi nameyê Tijdayî cinêkê mêrxasî û rahîbeyêka îrlandî ya rindeke Grania kena.

Gama ke komelê Grania hemverê artêşa Romayî de keweno rewşêka xetere, Tijda û Grania pêameyîşêk virazenê. Nê pêameyîşê înan ra pey neteweya kurdan peyda bena. Dewamê sanike de wendoxî vênên ke 500 xalîçeyê efsûnî bi hawayêko huşk ginenê erdî ro, ancî wendoxî vênên hêsirê ke xemî ver yenê war, benê yaqûtî û baxçeyêkê efsûnî ke henara tewr verêne tede yena ra zî xebêrdar benî.

Bi babetanê xo yê surginiye û têduştîya cinsan, Hêsirê Grania se-serra vîst û yewine de sanikêka heqê merdîman a zî.

Dagens Nyheter yek ji rojnameyên Swêdê ya herî mezin e. Mahmut Baran wek "Portre" da nasîn.



DN, Lördag, 20 februari 2016, Foto: Magnus Hallgren



Mahmut Baran ji gundê Hecîlera Cîhanbeylîyê ye. 1979an, di 19 saliya xwe de hatiye Swêdê. Li Swêdê ji bo xwendina universîteyê ji derve di ber karê xwe yê rojane de lîse careka din xwendiyê.

Li Stockholmê hem unîversîteya aborî û hem jî unîversîteya huquqê xilas kiriye. Li daîreya bacê çend salan wek pispore bacê xebitîye. Piştî di du bîroyên mezin ên avukatan de kar kiriye.

Mahmut Baran wek dadwer ji bo Dadgeha Îdarî ya Bilind hat hilbijartin. Dadgeha Îdarî ya Bilind a Swêdê ji 16 dadweran pêk tê. Mahmut Baran yekem dadwerê bîyanî

ye ku ji bo vê dadgehê hatiye hilbijartin.

Em bi navê redaksiyona *Birne-bûnê* serbilindiya xwe radigihînin û pîrozbahîya Mahmut Baran dikin.



bîrnebûn

ISSN 1402-7488

Tidskriften utkommer 3 nummer per år.

Çar mehan carekê derdikeve.

Utges av Apec Förlag AB

hejmar 64 | 2016

Ansvarig utgivare: Ali Çiftçi

Editor: Ali Çiftçi, Seyfi Doğan, Muzaffer Özgür

Koma hevkarên vê hejmarê

Ali Çiftçi, Dr. Mikaili, Xizan Şılan, Muzaffer Özgür,
Nuh Ateş, Seyfi Doğan, Mem Xelikan, Celal Sönmez,
Hesen Huseyin Deniz, Mûlla Evîndar, Gurdo,
Hesen Polat, Rohat Alakom, Memê Mala Hine,
Serdar Öztürk, Berat Qewindam, Ahmed Yaşar,
Seyîdxan Anter, Marina Siyabend

Adress

Navnîşana li Swêdê

Box: 8121, SE 163 08,

Spånga/Sverige

E-post

info@apectryck.se

Internet:

www.birnebun.eu

Têkili/Îlişkî

Danimarka: Irfan Baysal, 0045-27 11 58 83

Belavkirin / Dağıtım

Ewropa:

Muzaffer Özgür

Birnebûn

Postfach 900348, 51113 Köln / Almanya

Tfn: 0049-172 298 24 51

Türkiye

İstanbul

Selahattin Bulut/Medya Kitapevi

İstiklal Caddesi, Elhamra Pasaj No: 130/6, Beyoğlu

Biha/Fiyatı:

Europa: 5 Euro

Türkiye: 5 TL

Abone

Swêd: 400 SEK • Almanya 50 Euro

Welatên din ên Ewropayê: 50 Euro

Îşveç hesap numarası: (Birnebûn) bankgiro: 402-2224

Ji bo aboneyên li derveyî Swêdê / Îşveç dîşîndakî aboneler için

APEC, "Birnebûn" Bankgiro-Stockholm/Sweden

BIC/SWIFT: DABASESX

IBAN: SE23 1200 0000 0123 5020 6874

Çap / Baskı: Apec- Tryck AB



Em dinivîsin, çûnkî em dixwazin fêrî xwendinê bibin

Wêneya berga pêşîn: Ji arşîva Celal Sönmez, *Em dinivîsin, çûnkî em dixwazin fêrî xwendinê bibin*.

Wêneyê piştî bergê: Di Newroza 2015an a li Egeby Gård a Tensta-Stockholmê, ji kamereya Ali Ciftci hatiye girtin.

Her nivîskar berpirsê nivîsa xwe ye.

Mafê redaksiyonê heye ku nivîsên ji Birnebûnê re tînin, serrast û kurt bike. Ger nivîs çap nebin jî, li xwedîyan nayên vegeandin.

Waqfa Kurdên Anatoliya Navîn li Swêdê û

Komela Ziman li Almanyayê piştgirî kovarê ne.

Naverok

- | | |
|---|--|
| Ji bîrnebûnê 6
Ali Çiftçi | 46 Veguherîn - Franz Kafka
Wergera ji almanî: Nuh Ateş |
| Kokteyla KOMKURD-AN 8
Mem Xelîkan | 55 Hêstirên Graniayê
Rohat Alakom |
| Nasandina Hêstirên Graniayê 14
Ali Çiftçi | 58 Wêne
Seyfi Doğan |
| Em dinivîsin, çunkî em dixwazin
fêrî xwendinê bibin 16
Celal Sönmez | 61 Şîrîna min, welatê min!
Gurdo |
| Cejna zimanê dayîkê 26
Mem Xelîkan | 65 Hîrê Meseleyê Luye
Arêkerdax: Serdar Öztürk |
| Bawer neke 33
Meme Xelîkan | 66 Di perwerdeya zarokan de parastin
Hesen Polat |
| Helbest 34
Seyfi Doğan | 71 Sîyarê Têrika-7
Dr. Mikailî |
| Rêvitî û cîhbûna li Ewropa pir gran bû 35
Muzaffer Özgür | 77 Tirba lawikî gêwir û zîyareta hêja
Ahmet Yaşar |
| Te ez berdarm deşt û çolan 39
Gurdo | 82 Hinek rêzikên zimanê kurdî
Hesen Hüseyin Deniz |
| Dergîstî 40
Mûlla Evîndar | 87 Zivistan û baweriyên kurmancên
Xorasanê li bara wê
Berat Qewîndam |
| Çîroka Kumsorik û taybetmendiyên 41
çîroka li ser pîrika merixur
Memê Mala Hine | 93 Kiloça serê salê li cem êzdiyên
Ermenîstanê
Marîna Siyabend |
| Zêr 44
Seyfi Doğan | 95 Bizmarê zingarî û gûzên Qendîlê
Seyidxan Anter |
| | 99 Hestên jar
Xizan Şîlan |

Ji bîrnebûnê

Pîştî rojên zivistanê yên sar, tarî û dirêj bi hatina biharê re rojên germ û ronî dilşahiyeke dide meriv û tevgereka din dikeve nav xwezayê. Bi tava rojê dunya germtir û xweza xweşiktir û jîyan li hember meriya şîrintir dibe. Xwazika hemû demsal wek biharê bûna...

Aniha li welatê me li her derê gul û gulsosikan reng dane. Jîyan li ser erdê dêûbavan li gor erf û edetên xwemalî di mehên biharê de geş û şîrintir e.

Di vê hejmara biharê de em ê bi nivîsên li ser bûyerên dilşa bi hev re bin. Kurdên Anatoliya Navîn piştî koçberiyeka bi sedsalan cara yekê ye ku li welêt bi navê xwe û ji bo parastina ziman û nasnameya xwe ya kurdî hatin ba hev. Bi navê KOMKURD-AN xwe bi rêxistinî kirine. Ji hevkarên me birêz Mem Xelîkan li ser şahiya vekirina komeleyê, bi sernivîsa *Kokteyla KOMKURD-AN* nivîsiye. Em li vir careka din vê xebatê pîroz dikin û ji hevalên rêvebir re serkeftinê û ji bo ev xebat pêşkeve jî ji hemû kurdên ku li herêma Anatoliyayê ne, piştgirîya vê hewildanê hevî dikin.

Celal Sönmez, bi sala ne ku li Swêdê li şaredariya Botkyrkayê mamostê zimanê kurdî ye. Piraniya şagirdên wî ji kurdên Anatoliyayê ne. Mamoste, li ser metodên fêrbûna xwendinê û pîrsgirekên perwerdeya bi

zimanê kurdî tercubeyên xwe bi sernivîsa *Em dinivîsin, çunkî em dixwazin fêrî xwendinê bibin* nivîsiye. Nivîseka balkêş e.

Bi sernivîsa *Cejna roja zimanê dayîkê* Mem Xelîkan di nivîseka din de agahiyên li ser vê civînê pêşkeş dike.

Muzaffer Özgür bîranineke bi navê *"Rêvîti û cîhbûna li Ewropayê pîr giran bû"* li ser koçberiya kurdên ji Anatoliyê ya salên piştî 1965an ber bi Ewropayê nivîsiye. Jîyana ji cîh û warê xwe bidûrketin, li xerîbistanê bi ziman û çandeka nû ve rûbirûbûyîn û zahmetiyên koçberiyê ji serpêhatiya xalê xwe, bi me ra parve kiriye.

Mûlla Evîndar serpêhatiyeke berê bi navê *Dergîstî* bi devoka reşiyên Anatoliyê nivîsiye. Zewaca berê ne weka nûha bû. Pîrê caran dê û bav van zarok dizewicandin, bêtî ku keç û xort hev bibînin. Li ser zewacên wê demê li her gundekî kurdên Anatoliyê serpêhatiyên pîr rengîn hene ku îro di nav civata me da bûne pêkenîn. Pêwîstî bi berhevkirina serpêhatiyên weng hene. Ev jî parçeyeka kevneşopiyên me ye û ev yeka siberojê ji bo pêşxistina wêjeya kurdî dikare roleka taybetî bilîze.

Memê Mala Hine çîrokeka bi navê *Komsorik* ku li gundê xwe bihîstiye berhevkiriye û herwiha taybetmendiyên

çîrokên li ser pîrika merixur nirxan-diye.

Birêz Nuh Ateş bi sernivîsa *Serpêhatiya merivekî ku veguhêriye, bûye kêzika* Frans Kafka wergerandiye kurmancî. Ev beşa dawîyê ji wergerê ye ku di hejmarên berê yên Bîrnebûnê de hatibûn weşandin. Bi vê xebata hêja ya wergerî birêz Nuh Ateş hem hunera Kafka bi kurmancî bi me dide nasandin û hem jî gotinên nû li wê-jeya kurdî zêde dike.

Rohat Alakom di nivîsa xwe de kitêba *Hêstirên Giraniyê* dide nasîn. Alakom nişan dide ku ev kitêp ne tenê bo zarokan hatiye nivîsîn, herwiha kitêp ji bo salmazinan jî balkêş e.

Seyfî Doğan bi sernivîsa *Wêne* wêneyekî şîrove dike û li ser girîngiya wêneyan disekine.

Di nivîseka din de Seyfî Doğan serpêhatiyeka jineka reşîya dide nasîn. Seyfî Doğan ev serpêhatiya ji devê bûka malê Hesî Reşîya Eşê, hildaye û bi zaravayê reşîya bi me re parve dike.

Bi sernivîsa *Şîrîna Min, Welatê Min!* birêz Gurdo xebatek li ser çend gotinên kurdî disekine û wan gotinan bi zimanên din ên Ewropa ve dide ber hev.

Serdar Öztürk, sê pêkenokên bi kirmanckî *Luye û Pisike, Luye û Kelo Bêaqil, Luye û Engure*, nivîsîne.

Birêz Hesên Polat di nivîsa xwe de mijara mezinkirin û perwerdeya zarokan de rola malbatê di kesayetîya zarokan de çiqas girîng e, lêkolaye.

Dr. Mîkaîlî bi zaravayî mikailîyên Polatliyê rêzenivîsa xwe ya *Sîyarê têrika*, beşa gera li Stenbolê dike. Ev serpêhatiya mikailîyan bi çend wê-neyên wê demê ve hatiye xemilandin.

Ahmet Yaşar, di vê hejmarê de gotareka balkêş nivîsiye. Di deme-ka weha ku li Rohilata Navîn û Kurdistanê ji sedema şer xelk mecbûr dimîne welatê xwe diterkîne û berê xwe dide welatên Ewropayê.

Berat Qewîendam li ser bawerî û rêûresmên demsala zivistanê, çand û folklorê kurmancên Xorasanê ku piranîya wan li gel kurdên Anatoliyê hevpar in, nivîsiye.

Seyidxan Anter li ser *kitêba Şopên şewata Licê-1993*an û bîranîneka xwe ya ji gereka li Licê nivîsiye.

Marîna Siyabend li gor bîrû-bawerîya kurdên êzdî yên li Ermenîstanê roja Newrozê çing pîroz dikin, bi navê *Kiloça serê salê...* nivîseka balkêş nivîsiye.

Bi gotina Marîna; kiloça serê salê, hêkên rengîn û agirê Newrozê bila bibin sembola yekîtiyê û serxwebûna kurdan. Û bi vê helwestê Newroza 2016an li we pîroz be!

Ali Ciftci

Kokteyla KOMKURD-AN

Mem Xelîkan

memxelikan@hotmail.com

Dûv hewlêdan û xebateke dûdirêj ve, Komela Kurdên Anatoliya Navîn ya çandî, piştevanî, piştgirî û civakî (KOMKURD-AN) hatibû damezirandin. Avakarên komelê, dûv serlêdan û rêzname (tûzik) hate qebûl kirin, damezirandina komelê li roja 26.01.2016an bi kokteylekê pîroz kirin. Kokteyl, bi tevlêbûna gelek beşdarên û bi coş derbas bû. Kokteyl, li lokala komelê hate dayîn. Rêvaberan, ji bo ku navnîşana komelê were nas-kirin wisa bîryar girtibûn. Lê, hate dît ku, ji bo beşdar gelek zêde wûn, eleqedarî zêde wû cih teng hat, nêzikî 300-400 beşdar hebûn. Dîsa jî, ew roja bi coşêke mezin û kelecanyek germ derbas bû.

Serokê komelê, parêzer birêz Levent Kanat li jihevkerinê axaftinek kir. Di axaftina xwe de, wî hewcetîya komelê, armanca komelê û ji bo Kurdên Anatoliya Navîn, girîngîya wê anî ziman. Ji her partîyek kurdan, ji sazîyên civakî yên şarwer(sivil), ji rojname û kovaran, ji herçar perçên Kurdistanê



Serokê komelê, parêzer Levent Kanat

TV, akademîsyen û vekîlên kurd beşdarî kokteylê bûn. Ji beşdarên; Mamoste Dr. İsmail Beşikçi, ji vekîlên HDP Mehmet Mîr Dengîr Fîrat, Kadrî Yıldırım, Leyla Güven û ji Kurdên Anatoliya Navîn Akademîsyen prof. Dr. Halil Sarrıslan yek axaftin kirin. Her yekî ji wan, girîngîya damezirandina komelê anî ziman. Birêz Kadrî Yıldırım, di axaftina xwe de got, "gelek partîyên kurdan hene. Komeleke çandî pirr girîng e. Hewcetîya kurdan zêdetir bi komelên çandî yên ku ji bo dîrok, çand, ziman û folklorê lêkolînan pêkbînin, heye." û pesandina damezirandina komelê kir. Ji dervayî welat; bi navê Platforma Kurdên Anatoliya Navîn, birêz



Ahmet Gezer û du hevalên wî, bi navê kovara Bîrnebûnê birêz Hacı Erdoğan beşdar bûn. Di dûv axaftinan ve, sohbetên germ pêkhatin.

Li kokteylê KOMKURD-ANê, danezanînek li beşdaran û rojnamevanan belavkir. Di wê de, armanca xwe anîne ziman. Ji bo xendevanan min ew jî bi derxiste jêr.

“DANEZANA DAMEZÎRANDÎNA KOMELEYA ÇAND, PÎŞTEVANÎ û PÎŞTÎGÎRÎYA CÎVAKÎ YA KURDÊN ANATOLÎYA NAVÎN

Civakeke ku nîrxên xwe yên dîrokî û yên çandî pêş nexe, mirov nikare behsa geşedanên wê civakê bike. Di roja me ya îroyîn de li ser rûyê cihanê geşedenên di warê pêşketina teknolojiyê, zanist û ragihandinê de yên bi lez û bez pêk tînin dixuyên. Lê mêtînger û paşverû ji van geşedanên zêdetir sûdê werdigirin; tek-

nolojiya pêşketî bikar tînin, xurtir dibin. Kar û barê hêzên emperyalan hêsatir dikin. Ji ber vê yekê pêwistiya xurtkirin û pêşxistina tekoşîna gelên di bin zexta de nin ji her demê zêdetir derdikeve pêş. Di vê rewşê de em dibînin ku ji hêza emperyalan ya ku erdnîgariya Rojhilata Navîn li gorî berjewendiyên xwe teşe danê û parve kirine zêde kêr nebûye. Wan welatê kurdan kirine çar parçe û plansaziya bi bişavtinê tune kirina kurd kirinene meriyetê.

Bi van pêkhatinan kurdên Anatoliya navîn zêdetir bandoreke neyînî dijîn, bi bişavtineke tund re rû bi rû mane. Di van şert û mercan de pêwistî bi birêxistinbûneke bi rêk û pêk, tekoşîneke xurt heye.

Gelê Kurd, yek ji gelên ku di dused salên dawiyê de ji cihên wan hatine dûrxistin, li kirin ku li

ser erdnigariyeke din bijîn in. Bi gelemperî tê payîn ku gelê kurd di navbera salên 1750 û 1800'an de peyde pey ji welatê wan Kurdistanê hatine koç kirin û dûr xistin. Di vê pêvajoyê dîrokî de ji bo kurdan wekî Xoresan, Anatoliya navîn, Rojhilata navîn, herêma Kafkasyayê (ya nêzîk û dûr) cihên lê kurd hatine koçberkirin derdikevin pêş. Bi koçberkirinê gelê kurd ji welatê xwe hatiye dûrxistin, hewl hatiye dayin têkiliyên navbera wan bên qut kirin. Helwesta desthilatdaran a ji hev bike û bi rê ve bibe ketiye meriyetê. Her wiha hatiye payîn ku bi bişaftinê yekser bên tune kirin. Gelê kurd bi van kirinên kirêt re rû bi rû maye.

Ev dused sal in gelê kurd ji welêt koç kiriye û li çolên Anatoliya navîn bi cih bûne. Digel pêkûtiyan û dûrketina ji welêt kurdên Anatoliya navîn zimanê xwe, çanda xwe û gelnasiya (folklor) xwe ya resen heta niha parastiye. Kurdên Antolîya navîn ji ber dûrbûn û mercen fîzîkî, astengiyên siyasî têkiliyeke xurt bi xizmên xwe û kurdistanîyan re nikaribûne daynin. Têkiliyên di serî de heyî jî di borîna demê de di asta qutbûnê de maye. Kurdên Anatoliya navîn di destpêka koç

kirinê de di nav tixubekî biçûk de jiyana koçeriyê domandine. Di nîvê salên 1800'î de bi zagona binecih kirinê (İskan) cihên lê jiyane hatine bicih kirin.

Dibe ku bi vê helwestê hatiyê xwestin ku deriyê vegera welêt yekser bê girtin e. Di borîna demê de cihên lê hatine binecih kirin ji xwe re wek welat pejirandibin jî bi tu awayê welatê wan ji bîra wan neçûye, li hemû taybetmendiyên xwe, kurdayetîya xwe xwedî derketine, parastine.

Hesreta axa welêt bi xwe re her tim dane jiyandin.

Digel van tesbîtan em di nav nivîsên geroke û misyonên rojavayî de rastî hin agahiyên cuda tên. Li gorî van agahiyan demeke pir berîya koç kirinê kurd li Anatoliya navîn jiyabûne.

Em Kurdên Anatoliyê di serê salên 1960- 1970'an de di nav komele û rêxistinan ku ji hêla kurdên ciwan û rewşenbîr ve hatine saz kirin de dibînin. Têkûşîna Azadî û Demokrasiyê ya kurdan a di salê 1980'an de bandoreke mezin li wan kiriye, hişmendiya neteweyî xurtir bûye, ji bo wan hêviyên mezin afirîne. Kurdên Antolîya navîn bi piranî ji Rîşwanî ne.



Îsmail Beşikçi dema di kokteylê de deng dike.

Rîşwanî konfederasyoneke eşîran e. Ji bilî vê eşîrê Canbegî û Şêxbizînî jî henin. Ji bilî van li der dora Aksaray û Nîgdeyê li derdora çiyayê Hilkeçikê kurdên ku bi zaravayê dimilkî diaxivin jî henin.

Kurdên bi giranî di nav tixubên Enqereyê, Konyayê, Kirşehîrê, Aksarayê, Kirikaleyê, Çankiriyê û li Kayseriyê dijîn ku ji wan re Kurdên Anatoliya navîn tê gotin zêdeyî wan sunî/henîfî ne. Hejmara elewîyan pir hindik e. Zêdeyî kurdên Şêxbizînî jî sunî/şafîî ne. Di nav kurdên Anatoliya navîn de cudahiyên mezhebî û eşîrî wek pîrskîrêk zêde rû nedane, nasnameya kurdayetiyê ew nêzîkî hev kirine, têkiliyên wan bi hev re bi germî domyaye. Têkilî bi zewac û bazirganiyê (bi taybet bazirganiya heywan) xurtir bûne.

Hejmara şeniyê kurdên Anatoliya navîn di van salên dawiyê de du qat zêdetir bûye. Ev yek jî ji koça ji sedema şerê ku ev sih salin didome pêk hatiye. Bi vê koçê di navbera kurdan de têkiliyeke xurt afirîye, hişmendiya neteweyî ji berê xurtir bûye.

Digel tunebûna lêkolîneke akademîk û zanist tê payîn hejmara şeniyên Kurdên Anatoliya navîn serdestirî nîv milyonî ye. Van kurdan heta salên 1960'an hemû kurdewariya xwe parastine û jiyane. Zimanê dayika xwe bikar anîne û nîfşên nû fêrî kurdî kirine. Lixwekirinên jinan, keçîk û kal û pîran bi resentiya xwe hatiye parastin, sewal xwedîkirin, petina xwerinê, gotinên stran, govend û hwh. bi resenî hatine parastin û jiyandin. Em dikarin bibêjin ku di

1950 û 1960 tan şûn de çûna zaro-kan a dibistanan û xurtbûna têkiliya bajarvanitîyê deriyê asimilasyonê li kurdan vekirîye. Di 40 salên dawiyê bi taybet di serî de televîzyon, med-ya dîtbarî, internetê yekser deriyê asimilasyonê vekirîye hemû nirxin kurdariyê niha bi tunebûnekê re rû bi rû ye. Asimilasyoneke ku li demeke dirêj hatiye balav kirin di meriyetê de ye.

Em vê komeleyê ji bo bidest xistina:

1. Jiyanê azad û wekhev,
2. Ji bo berterefkirina xetereya asimilasyonê
3. Ji bo jiyandin û pêşvebirina çandê. Ji bo vê yekê di nav hewldana ku çanda me ji hêla Neteweyên Yekbûyî ve di nav bernameya parastina çandê de cih bigire,
4. Ji bo bidestxistina perwerdehiya bi zimanê zikmakî,
5. Ji bo destpêkirina lêkolînên dîroki yên zanist û bêalî,
6. Ji bo ev xwastekên me bînin bi cih anîn û bi zagonan bînin misogerkirin di qada fermî de bi dengê bilind daxwazan bînin ziman” saz bikin.

Kurdên Anatoliyê perçeyekî gelê kurd e. Em hê jî bi van hestan dijîn. Mafê perwerdehiya bi zimanê zikmakî, yek ji mafê mirovan ya bingeîn e. Asimilasyon sûcê mirovahiye ye.”

Rêvaberên komelê ji bo pêşerojê ve di civînên xwe de, çend bîr-yar girtin. Komîsyonên xwe amade kirin. Ez jî, ji wan re serkeftinê dixwazim û rêya wan ji hev be, mala wan ava be.

KOMKURD-AN ê roja 30.02. 2016 an de, bîrêz Nacî Kutlay dawetî komelê kirin. Ji bo ku ew, bi endamên komelê ve sohbet bike û ji bo têkiliyên KAN û Kurdên Kurdistanê fikir û ramanên xwe bîne ziman. Ew sohbetê jî, gelek baş derbas bû. Qasî 50-60 kes ji endamên komelê beşdar bûn. Kek Nacî, bi sohbetek xwaş bîranînên xwe kat kirin. Bi beşdaran ve sohbet kir, ew naskirin, ew jî gelek kêfxwaş bû. Di wê sohbetê de, xanima kek Nacî, xaltîya me Azîme jî hebû. Wê jî, jin û keçên KAN naskirin, sohbet kir û gelek kêfxwaş bû. Rêvaberên komelê, bîr-yar girtin ku her mehekê sohbet an jî panelek wisa lidarxin.

Orhan Atici (Adil Konya)

01/12/1985 – 11/09/2013



Navê kod: Adil Konya
Nav û paşnav: Orhan Atici
Dê: Songul
Bav: Mustefa
Çiyê hatiye dunê: Konya
Şuna şadetê: Girkê Legê/Rimêla Başa
Tarix: 11/09/2013



Basel, 21 sibat 2016

Orhan Atici kurdekî ji Anatoliyê ji Konya-Cihanbeylî, gundê Kel-hasan e. Orhan li Mersînê xwendekarê unîversîtê bû. Dema li wir dixwend pirê caran hat girtin, îşkence dît û bû hedefê faşîstên tirk.

Orhan heft-heşt sal berê biryara xwe dide û tevli têkoşînê dibe. Dema li Rojava Dewleta Îslamî, DAÎŞê êrîşê bajarên kurdan kir Orhan ji Qendîlê derbasî Rojava dibe û tev şerwanên YPGê li dij DAÎŞê şer dike. Di payîza 2013an de DAÎŞ bi hemû hevkarên xwe yên navnetewî û welatên piştgirê wan ve ji Serêkanîyê heta Girkê

Legê û Tilkoçerê bi sedan caran êrîşên dijwar dikin. Şerwanên kurd di bin ala YPGê de bi qehremanî li dij van êrîşan erdê xwe diparêzin!..

Di 11 îlona 2013an de Orhan şêhîd dibe.

Sersaxîya Orhan Atici di 21 sibatê de li Baselê bû.

Ji malbata Orhan û kurdên Anatoliyê bi sedan kes bejdarîya sersaxî û bîranîna Orhan Atici kirin.

Orhan Atici jî wek şêhîdên Kurdistanê bîrnabe û dê di nav tevgera kurd û Kurdistanê de her tim bijî!..

Ali Ciftci

Nasandina Hêstirên Graniyê

Efsane, çîrok û kevneşopî di pêşketin û bixwebawerîya kesayetiya miletekî de, bi taybetî bo zarokan pir girîng in. Em kurd wek millet ji ber sedemên bindestîyê ji dîrok û nasnameya xwe bêpar mane. Heta ji çîrok û efsaneyên xwe jî dûrketine an jî yên ku heta niha bi devkî ji me ra hatine gotin jî di bin tesîra ola serdestan de mane û ji rastîya me bi dûr ketine.

20ê sibatê, di arifeya roja navnetewîya zimanê dê de li Stockholmê çîroka bi navê Hêstirên Graniyayê ya li ser kurdan, keltan û eslê henaran bi kokteylekê hate nasandin.

Nasandina kitêbê ji alîye nivîskar Elizabeth A. Nolan ve hat kirin. Saar Keunen(wêneçêker), Anna

Sjöstrand-Hedström(wergêra swêdî) û Memê Mala Hine (wergerê kurmancî), Soran Îsmail (çîrok bi swêdî û kurdî wek kitêba bideng xwendiyê), ji redaksiyona Apecê, Amed Tîgrîs, Hesenê Metê, Îhsan Espar li gel mêvanên hêja bejdarî kirin.

Elizabeth A Nolan di gotara xwe de li ser çend noxteyên girîng ev dîtinên xwe pêşkeş kirin:

... - Ez wek emerîkîyeka Îrlandî û bi nejad skontlendî, gelek baş hest bi tûnebûna yan jî hindabûna zimanekî dikim ku piştî hindabûê edî nema dimîne. Birêz Ali Çiftçi ji sala 1988an û heta niha teqriben 90 pirtûkên zarokan çap kiriye çûnki bi dil û can ve bawer dike bi van



Soran Îsmail, İdris Okuduci, Hesenê Metê, Îhsan Espar, Ali Ciftci, Anna Sjöstrand-Hedström û Memê Mala Hine. Yên rûniştî: Elizabeth A. Nolan û Saar Keunen. Foto: George Kristiansen



Dimenek ji bejdarên nasandina Hêstirên Graniyê

Foto: Ali Ciftçi

berhemên hatî çapkirinê nasnameya zimanê kurdî tê parastinê. Cîhan xwe bo pîrozkirina 16mîn car Roja Zimanê Dayikê ya Navdewletî amade dike. Ez bêjim ji vê rojê baştir derfetek din nîne daku ev karê we kirî bête pîrozkirinê. Cenabê we bi çapkirina Hêstirên Graniyê rîskek berçav wergirt. Yekemcar e bi nivîskar û şewekarekê re kar dikir ku pêştir qet nas nedikir. Ji ber bawer pêkirin û bo hemû tiştî dîsa spasiya we dikim.

- Cara ewilî efsaneya 500 bakîreyan min ji penaberên ku piştî şerê Xelîca Yekem hatibûn Emerîka bihîst. Ev efsane bi min re hate parvekirinê. Hevkarekê min pir bi şerm ve behsa vê çîrokê ji min re kir. Hemû kareketerên nêr destdirêjî dikirin û karekterên mê jî qurbanî bûn. Gava hevkarê min efsaneyê ji min re vedigot xemginiyê li

ser rû û dengê wî hebû. Wî qet nedîkarî qebûl bike ku milletê kurd bi tawenekê hatibin ser dinê.

.... - Bo min Hêstirên Graniyayê ji bilî wek çîrokek, herweha wêneyeke derbarê çîpedukirinek (Dengekî nîzm) e ji Bostonê ku bi bayê bilind yê geşbînê li cihanê bi rê ketiye. Ev çîpedûye bilind û bilindtir dibe heta ku bû hawarek, dengekî bilind. Ev hawar dê di nêzîk de bigihîjê bilindtirîn çiyayên Kurdistanê... li hember mezintirîn xeyalên we yên hatî komkirinê raweste.

Yan hûn wek kurdek hatibin dinê yan jî ji dil ve hest bi wê çendê bikin, tika ye efsaneyên xwe, çîrokên xwe yên folklorîk û mîtên xwe parve bikin. Wan li mal yan jî li derve parve bikin. Li ser rûpêl, seko û şaşeyan belav bikin. Ji bo zarokên xwe bixweynin û çîrokên nû bi hevdu re binivîsin.

Em dinivîsin, çunkî em dixwazin fêrî xwendinê bibin

Celal Sönmez

celal.sonmez@botkyrka.se

Yek ji kêmasîyên civata kurdî li ya Ewropayê ew e ku em kêma cara ji serbûra xwendina zimanî kurdî ya li welatên cida yên Ewropayê -Swêd, Almanya, Holanda, Swîs ûwd- , ji pirsgerêkên li pêş xwendina zimanê kurdî, agahdar dibin. Li her welatekî, li her bajarekî mamoste bi tena serê xwe dixebitin. Sedemên vê yekê pir in, lê ez ê behsa tecrubeyeka xwe ya mamostatîya zimanê kurdî li Swêdê ji bo şagirdên temenbiçûk bikim. Li sê dibistanên ez kar dikim 112 şagirdên min hene û 106ên wan ji kurdên Anatoliyê ne. Destpêka vê sala xwendinê ya 2015-2016 li dibistana ku ez wekî mamostê zimanê kurdî dixebitim, cara pêşî ez bûm mamostayê hejmareka mezin ya şagirdên pola 1-2-3 û 4-5 û 6. Tecrubeya min wek mamosta xebitîna bi şagirdên 6 salî û şagirdên pola 1-2 û 3 kêma bû. Di warê fêrkirin/ fêrbûna xwendinê de li derûdora min her mamostayek “li gor xwe” metodin bi kar dianîn.

Vekirina girêkê û alfabe

Girêdanek rastûrast di navbera vekirina girêka xwendinê û deng û alfabe ya zimanekî de heye. Çunkî herf yan tîpên alfabeyekê, di heman wextî de dengên wî zimanî ne. Di qonaxên destpêkî yên xwendinê de zarok fêrî girêdana herf û deng, fêrî rê û metodên avabûna peyv, tekst û zimanê nivîskî dibin. Fêr dibin ku ji bilî axaftinê, mirov dikarin bi riya nivîsandinê jî xwe derbibirin.

Gelek pirs hebûn: “Gelo mamostayên zimanê kurdî ji bo şagirdên xwe yên destpêkê sinifên 1 û 2 û 3 kîjan metoda vekirina girêka xwendinê bi kar tînin?

Şagirdên me di kîjan qonaxê de girêka xwendinê vedikin? Sinifa 3? Sinifa 4 yan 5? Sinifa 6 yan 7? Yan jî gelek şagirdên me piştî sinifa 9ê jî bi temamî girêka xwendinê venekirine? Nikarin teksteka kurdî bi awayekî rehan bixwînin û têbigihin? Li pêş vekirina girêka xwendinê ji bo şagirdên zimanê kurdî yên temenbiçûk, yan



temenmezin yên li Swêdê yan li Kurdistanê kîjan asteng hene?

Li Kurdistanê (başûr bi alfabeya aramî) kîjan metod tên bi kar anîn?

Mamostayên zimanê kurdî yên li Swêdê xwe radigirin heta şagird fêrî alfabe û xwendina bi zimanê swêdî dibin, paşê dest bi fêrkirina xwendina bi kurdî dikin? Yan fêrbûna xwendina bi swêdî û xwendina bi kurdî bi hev re? Kîjan astengên pedagojîk li pêş fêrbûna xwendina bi kurdî derdikevin?

Tecrubeya min û mamostayên li derdora min hem kêr bûn, hem jî ji hev cida bûn. Nebûna lêkolînên di vî warî de jî astengeka mezin bû. Her mamostayek li gor zanîna xwe,

yan pirtûkên fêrbûna xwendinê ji zimanê swêdî werdigêrandin, yan jî bixwe li gor tecrubeya xwendina xwe ya destpêkê ya li Turkiye, Îran û Îraq û Sûrîyê ji xwe re materyalên dersê çêdikin û bi kar dianîn.

Du metodên cida yên fêrbûna xwendinê

Zanîna xwendin û nivîsîne du şîyanên bingehîn in ku rê li ber mirovan xweş dikin: ji bo beşdarbûn û kartêkirina jîyana rojane. Di civakên demokratîk de xwedî kompetensa bilind a zimanî wek şertekî ye ku tu bikaribî giş înfomasyona civakî ya li ser jîyana civakî, rêveberî û jîyana rojane werbigrî. Ji bo jîyana kar û

bikaranîna hemû amûr û cîhazên teknîkî, xwendin pêwîstîyeka yekcar girîng e. Pêşketina civateka analfabet pir zehmet e.

Loma qonaxa destpêkî ya fêrbûna xwendinê her tim bala lêkolîneran kêşaye û li deverên cida li ser vê qonaxa destpêkê ya fêrbûna xwendinê gelek lêkolîn hatine kirin. Heta îro hemû cûre û awayên fêrbûna destpêkî ya xwendinê di bin sîwana du metoden de kom dibin:

1- Metoda sîntetîk

2- Metoda analîtîk

Metoda sîntetîk

Li gor metoda sîntetîk mirov di destpêkê de fêrî tîp û dengên tîpan dibe. Paşê fêrî xwendina kîteyan/heceyan dibe, paşê fêrî xwendina gotinan û frazan dibe, paşê fêrî xwendina cumleyan dibe û dawîyê êdî dikare tekstan bixwîne.

Li gor metoda sîntetîk mirov ji hêsanîyê ber bi zehmetîyê ve, ji beşê biçûk ber bi beşê mezin ve, ji abstrakîyê ber konkretbûnê ve diçe.

Metoda sîntetîk li gor rêza tîp=d eng>kît>gotin>riste>hevok>tekst ava bûye.

Metoda analîtîk

Li gor metoda analîtîk mirov ji tekstê berbi gotinan ve, ji konkret-

bûnê ber bi abstrak ve, ji beşê mezin ber bi biçûk ve diçe. Herî dawîyê ji mirov li ser tîpan, û dengên wan di gotinan de fêr dibe. Di vê metodê de naverok û wateya tiştê mirov dixwîne girîng e. Û ev metod xwe dispêre zanîna zimanê devkî û xezîneya gotinan ya şagirdan.

Metoda analîtîk li gor rêza tekst >hevok>riste>gotin>kît>tîp>deng ava bûye.

Gelek cûreyên din yên fêrbûna qonaxa destpêkî ya xwendinê bi piranî li gor yek ji van metoden e.

Li gelek welatan û gelek mamosta jî metodek ji van her du metoden pêkhatî bi kar tînin. Yan her du metoden bi hev re bi kar tînin.

Li Swêdê di warê fêrbûna xwendina zimanê kurdî de metoda sîntetîk serdest e. Piranîya mamostayan gava fêrî zimanên tirkî, erebî yan jî farisî bûne bi vê metodê fêr bûne. Û piranîya pirtûk û materyalên ji bo qonaxa pêşî ya fêrbûna xwendinê hatine amade kirin jî li gor metoda sîntetîk hatine nivîsandin.

Metodeka nuh: Bi nivîsînê fêrî xwendinê bûn

Ji bilî metoda “Xwendina li ser hîmê peyivînê”, vê dawîyê li Norveçê Arne Trageton bi navê “bi nivîsînê fêrî

xwendinê bûn” metodeka din ya fêrbûnê xwendinê bi kar anî. Li gor vê metodê şagird şûna qelem û kaxizê, di komputerê de yan li IPADê ji xwe re çîrok, yan tekstên vegotinê dinivîsin. Bê guman ev tekstên ku dinivîsin komeka herfên li ba hev rêz kirî ne û wateyeka wan rêzê dirêj yê herfa tune. Lê gava ku dinivîsin, tiştên ku dinivîsin, bi dengê bilind dibêjin jî. Paşê mamosta ji wan daxwaz dike ku teksta bixwînin û gava dixwînin, mamosta tekstê ji aliyê rastnivîsînê ve ji nûve dinivîse. Paşê şagird wê tekstê bi dengê bilind ji hev re dixwînin. Ji bo hemû hevalên xwe dixwînin. Paşê jî dibin malê û ji bo dê û babên xwe dixwînin. Vê dawîyê ev metod pêşdetir çûye: gava di komputer û IPADan de bişkokên hem tîp û hem dengê tîpê derdixin tîp bi kar anîn. Programa rastnivîsînê tê bi kar anîn. Li gor bikarhênerên vê metodê bawerîya zarok û piştrastbûna şagirdan ya ji bo xwendin û nivîsînê bilindtir dibe.

Xwendina li ser hîmê peyvînê

Yek ji cûreyên metoda analîtîk cûreya “Xwendina li ser hîmê peyvînê” ye. Ev cûre fêrbûna qonaxa destpêkî ya xwendinê di salên 1970 ê

de ji aliyê Ulrika Leimar ve hatiye pêş xistin. Li gor Leimar metoda sîntetîk rê nade şagird bixwe beşdarî xebata fêrbûnê bibe: her tişt li gor plan û rêveberîya mamosta tê kirin. Her weha li gor Leimar metodên sîntetîk guh nadin zimanê axaftinê û xezîneya gotinên şagirdan. Di metoda Ulrika Leimar de konkretbûna tiştê tê xwendin, anku têgihiştina tiştê tê xwendin, bingehe.

Tûrikê Gotinan

Metoda “Xwendina li ser hîmê peyvînê” piştî xwe hema bêje bi temamî dide tûrikê gotinan ê şagirdan. Şagird li gor hejmara gotinên xwe: zanîn, têgihiştin û bikaranîna gotinan dikare xwe derbibire. Tûrikê gotinan, peyvên ku şagird dizane çiqas pir bin, derbirîna şagird jî ewqas piralî ye. Bêguman di tûrikê şagirdêkê/a 10 salî de pirtir gotin he ne ji tûrikê şagirdêkê/a 6 salî. Li gor bisporên zimanê zarokan yê swêdî “zarokekê/a 6 salî –swêdî- nêzîkî 1000 gotinan dizane û dikare cumleyan ava bike û xwe derbibire. Lê ziman her pêş dikeve. Zêdetir gava em dest bi dibistanê dikin. Lêkolînerên di vî warî de dibêjin ku mirov di hundirê 9 salên pêşî yê dibistanê de fêrî 40 000 - 50 000 gotinên nû dibe.

Li gor vî hesabî mirov her hefte fêrî 100 gotinên nû dibe". (Håkansson, G. (1998) *Språkinläring hos barn*. –Li ba zarokan fêrbûna zimên-*Studentlitteratur*. Strömquist, S. (1984) *Barns språk*. –Zimanê Zarokan Lund: Liber.

Söderbergh, R. (1979, 1988) *Barnets tidiga språkutveckling*. –Pêşketina destpêkî ya zimanê zarokan-Gleerups.)


Zarokên kurmançîxêv di 3 salî, 7 salî, yan 12 salîya xwe de çend gotinan dizanin? Kurmançîxêvekê/a 20 salî, 50 salî çend gotinan dizane? Çend zarokên kurmançîxêv li dibistanê her hefte fêrî 100 gotinên nû dibe? Bêguman bersiva van pirsan tune ye û di paşrojeka nêzîk de jî em ê nikaribin bi xêra lêkolînan bersiva van pirsan bidin.

Lê ya girîng ew e ku di vê metoda fêrbûnê de mirov piştî xwe dide hejmara gotinên di tûrikê şagirdan de. Lewra pir girîng e mamesta hemû gotinên di tûrikê de wek gotinên şagirdan, wek gotinên kurmançîya şagirdan qebûl bike: Gotinên ji zimanên din –tirkî, erebî, farisî, swêdî- jî gotinên tûrika şagirdan in û şagirdên kurmançîxêv bi xêra wan gotinan jî xwe derdibirin. Ji ber vê yekê helwêsta mamosta

ya di warê "pakkirina kurmançî ji gotinên bîyanî" de pir girîng e, belkî jî di bikaranîna vî metodê de biryarder e. (Li ba mamostayan û li ba dê û babên şagirdan tendensek peyda bûye ku mamostatî fêrkirina gotinên resen, petî yên kurdî ye: pakkirina zimanê kurdî ji gotinên bîyanî. Di civata kurdî de ev tendens gelek carî serî li erkên din yên mamostayan standiye: pêşxistina zimanê axaftinê û têgihiştin, xwendina bi kurdî, nivîsîna bi kurdî û agahdarbûna ji dîrok û kultura kurdî. Mixabin heman tendensa pakkirina zimanê kurdî ji gotinên bîyanî li başûrê welatê me jî pir xuya û berbelav e. Kesên ku kurdîyeka pak, petî, resen dipeyivin yan dinivîsin, kesên ku peyvên tirkî, erebî, farisî bi kar naynin wek şarezayên zimanê kurdî tên dîtin).

Rojîn û Havîn

Rojîn û Havîn du şagirdên min in. Dê û babên wan kurdên Anatolîyê ne. Her du jî diçin pola 4ê, dizanin bi swêdî binivîsin û li gor temenê wan kurdîya wan ya axaftinê pir rehwana e. Her du jî pir hez dikin li ser texteya li sinifê jî xwe re tekstê binivîsin, yan wêneyan çêkin. Rojekê dîsa piştî xilasbûna darsa kurdî ji



min xwestin ku ji xwe re li ser texte her du jî çîroka xwe hem bi devkî
 tekstekê binivîsin. Min jî got baş e, dibêjin, hem jî bi nivîskî dinivîsin.
 lê teksteka bi kurdî binivîsin. Texte Gava çîrokên xwe xilas kirin, min ji
 kirin du beş û dest bi nivîsînê kirin. her duyan jî xwest ku çîroka xwe ji
 Gava dinivîsin, bala min kişand ku min re bixwînin. Gava yek bi yek



çîrok xwendin, çîrok rast gotin, lê teksta ku nivîsandibûn û gotinên ku digotin, li hev nedikir. Wan tekst li gor peyvîna xwe nivîsibûn. Lê tekst ji alîyê rastnivîsîna kurdî ve pir bêserûber bûn. Min yekser her du tekst jî di komputerê de ji alîyê rastnivîsînê de sererast nivîsîn û da wan ku bixwînin. Her duyan jî çîrok wekî berê anku rast xwend.

Plana dersê

Bi vê tecrubeya nuh min planeka dersê ji bo sinifa 3-4-5-6-7ê çêkir. Navê plana dersê “Em dinivîsin ji bo xwendinê” ye.


- Li gor vê planê her şagirdêk li ser texte, yan di komputera xwe de, yan li ser kaxizê dê teksteka vegotinê binivîse.
- Ev vegotin dikare bîrhatinek be, li ser bûyereka jîyane rojane be, yan jî teksteka xeyalî be. Şagird bixwe biryarê didin li ser çi binivîsin.
- Min wek mamosta ji şagirdan re naveroka –divê çi di hundirê tekstê de hebe- teksteka vegotinê nivîsî û vegot.
- Me hemû şagirdên pola 3 bi hev re cara pêşî teksteka hevbeş nivîsî. Şagird fêr bûn bê teksteka vegotinê çawa tê nivîsîn.
- Piraniya şagirdên sinifa 3-4-5 û

6ê xwest li ser texte teksta xwe binivîsin. Hin şagirdan di komputera xwe de, hineka jî li ser kaxezê nivîsîn.

- Hinek şagirdan xwest bi hevalekî xwe re du bi du, hineka jî bi tena serê xwe teksta xwe nivîsî.
- Min ji şagirdan xwest gava teksta xwe dinivîsin, di ber re bi devkî jî bêjin.
- Piştî nivîsîna tekstê min yekser bi telefona xwe wêneyekê tekstê girt.
- Û min yek bi yek ji şagirdan xwest ku teksta xwe ji min re bixwînin. Bê awarte di hemû tekstan de şaşîyên rastnivîsînê hebûn. Şagirdan tîpên alfabeya kurdî û swêdî tevlihev kiribûn. Gelek tekstên sinifa 3, 4 û 5ê ji ber şaşîyên rastnivîsînê ji bo min tekstên bêmene bûn. Bi tenê herfên li pey hev rêzkirî. Lê şagirdan ew rêz wekî çîroka xwe dixwendin.

Min çi kir?

- Min yekser wêneyekî teksta wan girt.
- Min ji her şagirdî/ê yek bi yek xwest ku teksta xwe bi dengê bilind ji hevalekî xwe re bixwîne.
- Min ji her şagirdî/ê xwest ku teksta xwe ji min re bixwîne.
- Gava şagird teksta xwe ji min re xwend, ez têgihiştim kîjan şaşîyên



• Xwendina tekstê pir girîng e, di vê xebatê de her şagirdêkî/ê gelek cara teksta xwe xwend, lewra divê ma-mosta çalakîyên cida yên xwendina tekstê peyda bike.

Min di tekstên şagirdan de çi guherand, çi neguherand?

Yek ji xalên girîng yên vê tecrubeya min bi şagirdên xwe re kirî ew bû ku min:

Gotinên tirkî, swêdî, erebî yên teksta wekî xwe hêlan û neguherandin. Çunkî şagird divê teksta xwe nas bike. Divê ew hest pê re çêbibe ku ew tekst teksta wî ye: gotinên tekstê gotinên wî ne û ne yên ma-

mosta ne. Ev xal pir girîng e, ji ber ku **divê şagird di teksta xwe pir zelal û vekirî XWE û KURDÎYA XWE bibîne.**

- Min varyanta gotinên bi kurdî yên şagirda neguherandin. Min negot ev varyanta şagird “ne standard e”, di medya kurdî de hîç bi kar nayê, yan kêma bi kar tê, ez dê şûna wê varyanta pir bi kar tê binivîsim. Eger şagirdan bo nimûne di teksta xwe de varyanta “weng” “soda” bi kar anîbin, min neguherandin, nekirin “wekî” “danê sibê”.

- Min bi tenê tîpên ku şagirdan bi tîpên alfabeya swêdî re tevlihev kirine guherandin.

Encam

- Şagird di teksta xwe de xwe û kurdîya xwe dibîne. Xwe nas dike. Tekst teksta şagird e, ne teksta pirtûkekê, yan teksta mamosta ye. Zimanê tekstê zimanê şagird e. Gotin gotinên şagird in.
- Piranîya şagirdên min yên sinifa 3 heta 7ê **cara pêşîyê tekstekê bi kurdî, bi zimanê xwe dinivîsin** û keyfa wan pir ji teksta wan re tê. **Bi xwe û bi teksta xwe serbilind in.**
- Bawerîya şagirdan ya ji bo zanîna zimanê kurdî difûre, şagird ji kurdîya xwe ji zanîna zimanê xwe piştrasttir dibin.
- Gava ez tekstên şagirdan yên orîjînal dixwînim, baştir dizanim kîjan asteng di warê xwendinê **astenga hevbeş** e. Kîjan asteng ji astenga takekesî ya her şagirdî ye û dikarim di planên bê de giranîyê bidim ser rakirina van astengan.
- Gava şagird teksta xwe ya orîjînal û teksta xwe ya sererastkirî didin ber hev, ew bixwe jî haydar dibin kîjan şaşîyên rastnivîstinê dikin û gava dixwînin jî kîjan tîpên kurdî û swêdî tevlihev dikin.
- Gava şagird teksta xwe ji dê yan bavê xwe re dixwîne, keyfa dê û baban tê û şagird vê keyfê dibîne, bi vê keyfê dihesê, **hestê serkeftinê** pê re peyda dibe.
- Ji niha de piranîya şagirdan **daxwaza nivîsîna teksteka din dike.**
- Me tekstên şagirdan –hem teksta bi kurdî, hem wergera swêdî- di Roja Navnetewî ya Zimanê Dayîk de wek pêşangehekê pêşkêşî şagird û mamostayan kir.



CEJNA ROJA ZIMANÊ DAYÎKÊ

Mem Xelîkan

memxelikan@hotmail.com



Roja 20 ê Sibatê, KOMKURD-AN û KURD-DER a Ankarayê, Cejna roja zimanê dayîkê (21 ê Sibatê) bi paneleke hevpar pîroz kirin.

Li panêlê, serokê KOMKURD-ANê birêz Levent Kanat û serokê KURD-DERê birêz Mustafa Karaman yek axaftin kirin. Her duyan jî, ji bo taybetî û girîngîya rojê fikir û ramanên xwe anîn ziman. Di panêlê de; bi navê KOMKURD-ANê, Mem Xelîkan û Xemgelî Bane, bi navê KURD-DERê, Sebahatîn Gültekin û Adar Jîyan axiver wûn.

Axiveran, di axaftinên xwe de, fikir û ramanên xwe yên ji bo taybetî û girîngîya wê rojê anîn ziman û li Tirkîyê astengîyên li ber zimanê Kurdan, zor, zordestî û pişavtina ku sedsalan li ser Kurdîyê dîyarî beşdaran kirin. Mem Xelîkan û Adar Jîyan; bi Kurmancî, Sebahatîn Gültekin; bi Dimilkî, Xemgelî Bane jî, bi şêxbizeynî axifin. Gelek kes, beşdarî panêlê bûn. Panêl, bi konsêra Koma Mûzikê, ya Kurd- Derê bi dawî hat. Min, ji bo xwendevanên Bîrnebûnê axaftina xwe biderxist jêr.

Mêvanên Rêzdar, Hevalên hêja hûn bi xêr hatin. Cejna we ya roja zimanê dayîkê, ji dil û can de pîroz dikim. Wek tê zanîn, roja 21ê Sibatê, ji sala 1999 an wir de ji aliyê sazîya Yekitîya Netewan (YN) a perwerde, zanistî û çandî (UNESCO) ve wek roja cejna zimanê dayîkê yî navnetewî tê pîroz kirin. Navê wê rojê yî heq, Roja Hêza zimanê Dayîkê ye. Ew roja, roja ku xwendevanên zanîngahan li Bangaldaşê, ji bo zimanê dayîkê, ji bo zimanê Bengalî berxwedidan û şer dikirin ji aliyê Polîsên Bangaldaşê ve hatine katilkirinê ye. Ji wê vir de, Yekitîya Netewan, ew roja wek cejna roja zimanê dayîkê qebûl û êlan kir. Netawayên, endamên UNESCO her 21ê Sibatê wê rojê pîroz dikin ku zimanên huro li ser dinê dijîn werin parastin

û nayên wendakirin. Li Kurdistanê jî ew roja, 21ê Sibatê, roja zimanê dayîkê hersal bi coş tê pîroz kirin.

Ji bo netawa bûyînê, yekitîya axê, yekitîya zimên- çandê û ji aliyê rih ve yekitî, sê faktorên girîng in. Her gel û netewak, bi çand û zimanê xwe li ser pêya ne. Yên çand û zimanê xwe ji bîrkirî û jîyana xwe bi çand û zimanê xwe nedomandî winda dibin û ji dîrokê paqîş dibin. Ji bo wê jî, dewletên dagirker ji bo pişavtin (asîmîlesyonê) cara pêşîn zimanê gelê bindest qedexe dikin. Ji bo ku wanan ji kok û eslê wanan biqetîne, naxwaze ewana bi çand û zimanên xwe bijîn. Dixwaze, wanan ji çand û zimanên wanan bi dûrxê û bi bîrkirin bide.

Ziman, vasiteke navbera gel de ji bo ku təkiliyan çêkin, hîs û fikirên xwe dîyar bikin, jîyana



xwe bidomînin, li erdnîgariya ku hatine dinê, mafekî bêîrade ya wanan hatiye dayîn. Mafekî xwezayî ye. Bi zimanê xwe axifîn, bi çand û zimanê xwe jîyan domandin û bi zimanê dayîkê perwerdeyî, ew pêşta birin mafekî mirovatî ye. Ziman û çanda gelekî qedexê kirin jî, sûcekî mirovatî ye.

Gelê Kurd, gelekî Rojhilata Navînî qedîm e. Tê gotin ku li Tirkîye hejmara Kurdan, 25 mîlyon in. Lê: bi Kurdî perwerdeyî hê qedexê ye. Ji bo qursên zimên çend gav hatibin avitin jî, bi kêmasî ye. Li ber bi zimanê Kurdî perwerde bûyîne, gelek astengî biderdixin. Lê, li hember her zor û zordestîya li ser zimanê Kurdan, dîsa jî Kurdan çand û zimanê xwe, jî bîrnekirine. Huro jî bi çand û zimanê xwe dijîne. Ji bo perwerdeyî ya bi zimanê dayîkê, bi hewldaneke mezin berxwedan û xebatan bikardînine. Bi zimanê dayîkê perwerdeyî mafekî nasyona le. Bi zanistî, ji bo gihastina meriv û di pêvajoya perwerde bûyîne de ji bo serketinê, bi zimanê dayîkê perwerde bûyin şert e. Bi zimanê dayîkê perwerdeyî, zimanê dayîkê parastin û pêşta birin jî, dewlet berpirsîyar in. Ji bo wan mafanan,

gelek peymanên navnetewî hene. Lê; Kurdan, hê ji wanan ti maf negirtine û ti fêdê nabînine.

Bi dîtina pispore û zimanzana, bi zimanê dayîkê perwerde bûyîn, ji aliyê pedagojîyê va jî pirr girîng e. Li gor lêkolînan, zarokek bi zimanê dayîkê perwerde bû, yê hê bi serkef e û gihîştina vî ya hê baş bibe. Bi du zimana, perwerdeyî li Tirkîye bi tirsê dîtî. Li welatên Awrûpa, her gelekî hindikayî perwerde bûyîna xwe bi zimanê dayîkê ye. Li wan welatana, yên bi 3-4 zimanên fermî jîyanê didomînin hene. Li Swêdê, bi 112 zimanan xwandin û perwerde bi kar tê. Dexwaza Kurdan, ya bi zimanê dayîkê perwerdeyî, mafekî mirovatî ye. Ew dexwaza, ti welatê perçe nake. Ti zimana jî tune nake.

Min li jor gotibû; Ji bo netawa bûyîne, yekitîya axê, yekitîya zimên û çandê û ji aliyê rihê we yekitî, sê faktorên girîng in. Gelek, ji axa bav û kalan veqetandin, çand û zimanê wî qedexê kirinê armanca xwe, ew ji kok û eslê wî bidûrxistine. Pişavtin û tunekirin e. Ji dîrokê, paqîşkirin e. Mînaka wê yê herî baş, Kurdên Anatolîya Navîn in. Çend sedsalan berê ew ji axa welat veqetandine û

bi kîjan sedemê dibe bibe (sûrginî, Aborî hwd.) li Anatolîya navîn bi cih û war kirine. Wek Kurdên Kurdistanê, wana jî her zilm û zor dîtine. Xwastine, li heremê ziman û çanda wanan bi bîrkin bidin û wanan asîmîle bikin. Lê, ya em pê serbilindin, KAN hetanî îro, nasnameya xwe ji bîrnekirine. Çand û kultira xwe parastine. Bi erf û edetên xwe, bi çanda xwe, bi taybetî yên folklora xwe, bi kurtasî bi nasname û Kurdatîya xwe jîyana xwe domandine. Li hember asîmîlasyonê, li hember her astengî û zordestîyê zimanê dayîkê parastine û gihandine îro.

Ti bajarê Anatolîya Navîn tinen, em bêjin Kurd lê najînin. Ji Mereş, Sêwazê û Keyserîyê de bigirin hetanî Kırşehir, Ankara û Konyayê Kurdên Anatolîyê li ser axeke me-

zin, ser erdekî mezin bi cih û war in. Hejmara wanan, bi lêkolînên amatorî nêzî milyonekî ye. Pirranî, hêjmara wana ya zêde, li sê bajarên Anatolîya Navîn û bajarokên wana ne. Ew bajarana; Ankara, Konya û Kırşehir e. Ji bajarokên Ankarayê, li Haymana û Polatliyê (2-3 gund) Kurdên Şêxbizeynî dijîn û bi devoka şêxbizeynkî diaxifin. Çar gundên şêxbizeynî jî, girêdayîyê bajaroka Kulu- Konyayê ne. Ji bajarokên Konyayê, li Cihanbeyli û Yunakê, ji bajarokên Ankarayê jî, li Polatliyê Kurdên Canbeg hene. Ew, bi Kurmancî diaxifin. Li bajarê Aksarayê, li dor çiyayê Hilkecik, Kurdên Hilkecikî dijîn û ew bi zaravayê Dimilkî diaxifin. Kurdên din, yên li Ankara, Konya, Kırşehirê û li bajarokên wan dijîn, bi Kurmancî diaxifin.



Kurd, li Anatoliya Navîn li ser erdekî mezin û berfireh bi cih û warin. Di navbera gundên wana de, gundên Tirkên bi kêmasî ne. Ji bo wê jî, demeke dûr dirêj hewcetîya wana yê bi Tirk û zimanê Tirkên nebûye. Li heremê, demeke dirêj bi zimanê xwe, erf û edet û kultîra xwe, bi gelnasî (folklor) xwe ya taybet jiyane. Navê gundên xwe bi Kurdî lêkirine. Wek Xelîkan, Gundê Omê, Bîrtalik, Bîra Bêrîna, Gundê Horê, Mala Mixkê, Mikaila, Zekere, Tabûra, Mîfkan, Bîra Şêxo, Sindiran Hwd. Dor aliyên xwe, Kanî, hewşo, çiya, çem, gir, newal bi Kurdî bi nav kirine. Mîna; Nala Pîrkê, Hewşoyê Mixkê, Goma Kevn, Fêza Morik, Kana Gilê, Girê Darê, Dara Paça, Baxçeyê Eysîkê, Îna Gewr, Çiyayê Îna Gewr, Çemê Sor, Çemê Malê Heskê, Kanîya Jêrî, Kanîya Kûrik, Bîra Husî Cenê û hwd. Li şîn û dawetên xwe, bi kultîra xwe rabûne û rûniştine. Ji hev û du dest berne-dane. Her tim, têkilîyên xwe bûne.

Demeke dirêj, keç û lawên xwe ji malbatên Kurd zewicandin. Waya, ji bo ziman parastinê, zimanê dayîkê, bi min giring tê. Meriv, dikare bêje, ew rewşa, ji ziman û folklorê Kurdî ya li

Anatoliya Navîn re bû star. Demeke dirêj, têkilîyên xwe bi welat re, bi meriyên xwe yên li welat mayîn re nebiriye. Çûne ziyaretan û hatine. Dengbêjên ji welat dihatîn, ji bo parastina zimên pirr keda xwe bûye. Xortên salên 1960 î şûva çûyine bajaran û zanîngahan, hevalên Kurdistanî naskirin û bi wanan re li komalên Kurdistan yên demokratîk û çandî cih girtine. Ji bo nasname parastinê fîda wê jî bûye. KAN, hetanî salên 1950-1960 î di aboriya girtî de (Kapalî Ekonomî) jiyane. Demeke dirêj, jiyana wana ya navbera wanan de, têrî wana kiriye. Lê; ji wan salan şûva, Nufus (hêjmar) zêde bû. Bi, pezxwedîkirin û cotgarîyê tenê dewar nedibû. Ji bo seddemên aborî, hewcetîya wana yê bazar û bazirganîyê bû. Ji bo wê jî, zimanê bazar û bazirganîyê gerez bû. Wê çaxê jî, ji ber wan seddeman, ji ber guhartina jiyana KAN ya aborî, sosyâlî û kulturî ji binî de dest bi xerav bûyîna Kurdîyê kir.

Dûv damizarindina Komarê, li gundên Kurd salên 1925 an şûva dibistanên Tirk hatin jihevîkirin û zimanê Kurdî hate qedexekirin. Ji bo ku nasnameya wana ji bîrîkirin bidin, hêdî hêdî, navê gundan

guherîn. Navê, hereman yên bi Kurdî, guherîn şûna wana bi Tirkî bi nav kirin. Kurdên heremê, Ji bo ku Tirkîyê biewîsin (hîn bibin), hêdî hêdî zimanê xwe xirab dikirin. Peyvên Kurdî hinek wenda û ji bîr dikirin. Wek; (nîvisandin, zozan, lorîn, lorik), û şûna wanan peyvên Tirkî dikirinê.

Dûv peyvên Tirkî, pêvakirek wek "kir" pêvadikirin û di jiyana rojene de weng diaxifîn. Mînak: yazmişkir, çizmişkir, açmişkir. Di axaftina rojene de, di devoka KAN de ji peyvên Kurdî, hinekan deng ketine. Wek Newal - Nal, Bihar-Bar. Stewr-Sewr. Hinek peyvan jî, deng hatine guherînê. Mîna, Rewş-Rewz, Raperîn-Ragerîn Rawestîn-Dawestîn. Meriv, dikare mînakên veng zêde bike.

Bi ser wan zor, zordestî û pişavtina li ser çand û zimên, ya em pê xenê û dilşad, ya em pê serbilind, çend sedsal in dîsa jî KAN, nasnameye xwe jî bîrnekirine û li ser lingên xwe mane. Li van salên dawîyê, piştgirîya komal û partîyên Kurda dikine. Li, nasnameya xwe xwedî derdikevin, ji bo kok û esilê xwe, ji bo dîroka xwe lêkolînan çê dikin. Ji 20 - 30 salî wir de, ji KAN bi kêmasî be jî, nivîskar, lê-

kolîner, helbestvanên bi Kurdî dinîvisînin, wênekêr, hunermend derketine. Bi Kurdî, Kovarên wek Bîrnebûnê, wek Vegerê hatine weşandin. Veger, li hejmara 9an dawî dayîbe weşana xwe jî, kovara Bîrnebûnê, kovara hunerî, çandî û lêkolîniya KAN, hejmara xwe ya 64 an di weşanxanê de li çapkirinê ye. Vana dilê meriya xwaş dikan. Hunermendên mûzikê, ji stran û kilamên KAN nêzikî 150 - 200 qaset û albûm çêkire. Dil dixwaze ku hewldan û berxedanên wisa hê zêde bibin. Çend mehan berê, Kurdên Anatolîya Navîn ji bo, li hemberî asîmîlasyona li ser çand û zimanê Kurdên heremê dawestên, çand û ziman, huner û folklorê ku mezinan gihandî îro biparêzin, bi navê (Komele ya Çandî Piştewanî, Piştgirî û Civakî ya Kurdên Anatolîya Navîn) KOMKURD-AN komelek damizirandin. Wêye, ji bo pêşerojê em gelek kêfxwaş û dilşad kirin. Îro jî, bi KURD-DER a Ankarayê va hevpar va panêla pêkanîn. Mala wanan ava be, rêya wan jihev be, serkeftinê dizwazim.

Hetanî huro, tu dexwazên KAN nebûne. Her yek, li herema xwe bi serê xwe mane. Tu têkilî yên wana ji bo mafên netewî mafên kesayetî



û demoqratik bi civakê re nebûne. Ji bo ku huro şûva, nasnameya me winde nebe, zimanê me ji bîr nebe, her Kurdek li mal bi malbat û zarokên xwe ve, li derve bi cîran û hevalên xwe re bi zimanê xwe bi-axife. bi Kurdî deng ke. Bi zimanê dayîkê, bixvîne û binîvsîne. Li sûke û kolanan bi zimanê dayîkê bi axîfin ku ew bibe zimanê her demeke jîyanê. Dixwaze, ji bo van mafên min hejmartî, ji bo bi zimanê dayîkê perwerde bûyîne xebata çêkin. Navên gundên xwe yên bi Kurdî, navên heremên xwe yên berê bi zimanê dayîkê, navên ji dest me hatîni girtinê bixwazin. Lêkolîner, nivîskarên heremê, bi profesyonelî lêgerîn û lêkolînên hê kûr bikin û bi belgeyên zanistî,

dîrok û kultira xwe bi dere holê xin. Xortên heremê yên li zanîngahan, li beşên dîrok û sosyolojîyê dixwînin, teze xwe ya mezûnîyetê li ser lêgerînên dirokî, ziman, kultur û jîyana wana ya li heremê pêk bînin. Kurdên heremê, sazîyên wek radyo, tv, kovar biderxistin û weşandinê hewl bidin û berxwe bidin. Vakîf û komelên demoqratik damizirînin, qursên zimên, bi zimanê dayîkê perwerdeyîyê bixwazin û berxwe bidin.

- Bi zimanê dayîkê perwerdeyî, mafekî xwezayî û mirovatî ye.

-Zimanê dayîkê qedexa kirin û pişavtin sûcekî mirovatî ye.

Mêvanên ezîz û rêzdar, ji bo guhdarî û beşdarî ya we spas dikim. Mala we ava be.

Bawer neke

Di sîngê welêt de kêr e
Xwîn diherike ji dil de
Bratî derew e
Bawer neke
Hevaltî jî nema
Çar alîyan de bombe baran e
Nabihîzin
Waya zûre zûra
Çeqel û guran e

Dorpêç kirî Amed Ferqîn
Û Botan
Çar alîyan de bi tanq
Û topan
Bin asîmanên reş tarî
Bêdeng û bêcan raketine
Dergûş û dayîk
Li sûke û kolanan

Dicle sor diherike
Lezgîn e
Sîngê Birca Belek xwîn e
Şahîd be Kela Amed
Va zilm û zora azadîyê bîne
Mizgîn e.

Mem Xelîkan

Helbest

li ser hezar rîyan meşîyam
li kevîyê hezar rîyan rûniştîm
li şevên pexîl ketim du aşqê
di şopên pêkên min da
stêrkan vekirin
ezî nuha li malake wêranda
bi bezîrganan ve bi kav dihîlîzime
bazara ke tevlihevê
bazara yên ku wenda kirî ye
li berxwedidînî
wextê direj dikiînî
heya ku xanî hildiweşê
dem herdem ne demê berêyê
cîh herdem ne eynî cîyê
fikirên kevn û tamsarkî
îştêhan renekin ser linga.

Seyfi Doğan

Bîranîn

Rêvitî û cîhbûna li Ewropa pir giran bû

Muzaffer Özgür

birnebun@hotmail.de

Di sala 1965an bi şûnda, ji gundên me yên kurmanc ên li Anatolîyayê jî koçberiyêka dûr û dirêj berva Ewropa destpêkir. Li ber dîwarên mala, li cimata li ser çûyîna Ewropa dihat sohbetkirin. Carcaran me dibîst ku ji gundêkî felan kes çûyê Almanyayê. Me jî dixwast em herin lê rê gelek dûrbû û perê me jî tûnebûn.

We demê me; li havînê li gund, demsalên bihar û peyîzê jî li Anqarê an jî bajarên din kar dikir. Li bajêr em li xana diman. Li Anqarê li meydana Etfayê xana kurmanca, ya kurdên me yên şêxbiznî hebû, em diçûn li wir diman. Dema me karekî rojana bi dest dixist kefa me dihat. Li înceata, li baxûbaxçan, li ber destên dewlemenda, li xan û konaxa yan jî li otela kar dikir. Welat jî ne wek mîna hîro bû. Belangazî jî derdekî mezin bû.

Dema zivistan dihat li bajaran jî

kar nedima, tunebû. Em vedigerîn gundê xwe. Li gund, me li pez û ga yên xwe mêzedikir. Berê berf pir bû. Xaniyê me jî biçûk bûn. Zivistan dirêj bûn. Dema me ya vala gelek bû. Li axir û tandiran de kaw dilîstin. Em li mala dicivîn. Hevalên sevtî xwe, dengê xwe xaş ji me ra kilam distirandin. Bi kilamên kurmancî govend dihata girtin. Evarên me bi gotina çîrok û destana derbas dibûn. Mezine me herdem behsa welatê jêr dikirin. Eş û kulên koçberiyê dianîn ziman. Merivên me li welat, mezine me jî li wir mabûn. Çîrokên jiyana koçberiyê, pez û kerî û destanên me yên berê rihe me bûn. Mem û Zîn, Siyabend û Xecê, Zembîlfiroş yên ji wan ten bîra min in. Kesek hebû ji welatê kalûpîrên me, ji Rihayê, je ra digotin Îbramê Tur, Dengêkî xwe yî zela û pir xwaş hebû. Dihad û li oda dima. Cimat

*Ev nivîs; di sala 2013an da, ji sohbeteka navbera min û xalê min Osman Aytaç da hatiye girtin.

li dor Îbramê Tur diciwiya. Bi sea-
tan destan digotin. Îbramê Tur bi
tene bû. Nezewcîbû. Gund gund
digeriya.

Li gundê me reçberî hebû lê kem
bû. Pezê me jî hebû, ji bo katixê
malê tera me dikir. Ez mezine malê
bûm û zewicîbûm. Kurikên min
hebûn. Birayê min jî zewicîbû. Di
berîka me de jî pere tûnebûn.

Min ji bo çûyîna Ewropa li
Anqerê ji gundîyê me, Hesenê Zexê
Kille gelek agahdarî girtibûn. Me
bi xwe nedikanî herin, lê îmkana
çûyînê bi rê ya dewletê hebû. Ji
gundê me çend kes derketibûn rê,
lê biserneketin û vegeriyan hatibûn
gund. Min amadekariya xwe kir,
ku ez bi rê ya dewletê herim Ewro-
pa. Min merivekî xwe, Heskê Mala
Mestî Yaylê jî agahdar kir û me
şora xwe kire yek û me li Anqarê
seriledana xwe kir.

Demeke bi şûnda xebera me
ya hatina helbijartinê hat. Em çûn
Anqarê. Li ber Dezgeha Karûkarker
Diyîne me xwe amade kir. Gereg
bû ku tu nexwaşiyên te tûnebin. Ji
bo we jî laşê me hat kontrolkirin
û rontgena kefesa me hat kişandin,
xwîna me hat girtin. Paşê bi dor
dor em kirin odeyekê û pirs ji me
kirin. Gotin:

Xwe bide nasîn? Tu xwandin
û nivîsandinê dizanî? Heta niha te
çi kar kiriye? Te li ku eskerî kir û
çend pirsên din. Dema ez derketim
derva keleşaneka mezin ketibû canê
min. Ji min bi şûnda xarziyê min
Hesik ket hûndir. Li dawiyê em
herdu jî hatin helbijartin.

Hesik ji min ciwantir bû û em
wek xal-xarziya bûn. Bi rêwîtiya me
em bûn bira jî, lê Hesikê herdem ji
min re digot xalo. Gelek kêfa min
bi hevaltiya wî dihat. Me piştî xwe
da hevûdu û em ketibûn rê.

17ê tîrmehê 1969an em, duûsed
kes bi şîrketa belafirê ya Hollanda
KLM ji Anqarê çûn Amsterdama
Hollanda. Dema em ji teyarê peya
bûn bi şikleka resmî hatin pêşvazî
me kirin. Koma muzîqa wan
lêdiket, heyecaneka mezin bi me ra
bû. Em birin, kirin malên fabrika-
ya kablo, me li wir kar kir.

Ji gundê me; Şixbekir, Teyarê
malê Satê, Seîde malê Pîrê ji ber me
wek turîst derketibûn rê hatibûn
Almanyayê. Lê bi rê ya devletê cara
yekemîn ez û Hesik hatibûn Ew-
ropa. Ji me 7-8 meha bi şûnda jî
Omikê mala Şexlî bi rê ya devletê
hat ba me.

Ji gundê me cîran û heval, ji
gundên dor me nas û merivên me

gelek hatin Almanyayê. Li bajarên wek Mûnih, Rüsselsheim, Haiger, Dillenburg û Rheinhausenê di fabrîkan de kar dîtî û li wan deran man. Kesên mal an jî kar didîtî seri li dewletê didan û xwe resmî dikirin. Bîranînê min gelek in. Ji bo te behsa çenda bikim.

Rojekê ji gundê me; Heçberemê Yemnê, Mexmoyê mala Şexlî û Heyderê Xanê, ji Şerefliyê jî Hecîyê Cemêl ten Almanyayê bajarê Haigerê. Wê demê çend kesên ji gundê me li wir wek turist dijîn û kar dikin. Ji bo mayîna wan îmkân çênabin. Ew biryara xwe didin û bi teksiyekê heta sînorê Belçîka tên. Nîkanin derbasî Belçîka an jî Hollanda bibin. Heyderê Xanê û Hecîyê Cemêl ji ber bêçaretîyê biryara xwe didin û vedigerin Tirkiyê.

Heçberemê Yemnê û Mexmoyê mala Şexlî carek din bi teksiyekê rêya xwe dibînin û derbasî Hollanda dibin û tên bajarê Amsterdamê û ber deriyê cîhe em lê dimen. Hevalên li Haigerê dimên navnîşana me didin van. Min pirs dikin.

Me jî wê demê xarina nîvro dixwar. Tercûmanê me bange min kir û got;

-Du kes hatine û daxwaz diki-ne bi te re deng bikin, te bibînin.



Osman Aytaç û Hasan Ateş

Navê te dayîne.

Ez rabûm bi tercûman re tevûhev çûm derva, ber deriyê em lê diman. Dema min ew dîtî, şaş bûm, çi bikim! Min tercûman re got “em wan bigirin hûndir.” Lê berpirsyarê ber deri qebûl nekir. Wê deme kesên xerîp û nenas nedikanîn tekevîn hûndir. Em demeke li ber geriyan ku ewî hat îmanê, min herdû birin hûndirê xwaringeha me. Me çend rojan bi alikariya hevalên ji gundên Anatoliya Navîn ew li cem xwe veşartin. Lê tercûmanê me bange min kir û got;

-Osman mezeke weng nabe. Ez dizanim ku merivên te li cem we ne. Gerege ku ew ji bo kar û mayîne ji xwe re cîhekî bibînin. Min got;

-Rast e, lê em bêçare ne. Çend roja sebr bike ez çareyekê mêzedikim.

Tercûmanê me merivekî baş bû peşniyara min erê kir. Me ji wan re li fabrîkeya daran kar dît, çend rojan kar kirin. Lê li cem me nedikanîn rakevin. Rojekê em ji kar hatin malê û tercûmanê me bange min kir û got:

-Mêzeke Osman, ew kar weng nabe. Em dikanin ji merivên te re rindiyêke bikin. Tu bi wan re deng bike, ewê li wir bê mal û bê kar pe-rişan bin. Ez alikariya wan dikim, eger bibên erê, ezê wan bişînim Almanyayê.

Ez çûm ba wan, min gotina tercûman ji wan re eşkere kir. Herdu jî şa bûn. Min bi tercûman re deng kir. Kesê wan ji sînorê Alman derbas bike li bajarê Enschede diji. Min ew herdu girtin, ji Amsterdamê bi trenê em çûn bajarê Enschede û ew kesê ku tercûman gotî bi navnîşana wî dît. Em ji sinirê Almanyayê derbas kirin. Me biletên xwe yê trenê girtin

çûn bajarê Rheinhausenê. Kurdên me li wir hebûn. Naye bîra min, lê bawerim şevê em li mala hevalem ji gundê Xelika (Qerecdaxê) man. Berê di nav însanên me de hevûdu girtin hebû. Li xerîbiyê piştgirê te tunebin jîyan bi rasti pir giran bû. Me heta sibe sohbet kir. Dilê me yî zîz bû. Hevalem ji me re kilamên şîna gotin, piraniyên me çav şil kirin. Roja din disa em bi trenê ketin rê û çûn bajarê Haigerê. Min ew teslimî gundiyan me kirin û çend roja li ba van jî mam.

Demeke bişûnda, Heçberemê Yemnê li wir bû karker û kar dît. Mala minê ciwan bû û jin û kurikên xwe li gund bûn. Di sala 1972an da, li cîhe kar qeze kir û çû rehmeta Xwedê. Mexmoyê mala Şexlî jî derbasî Danemerq bû, li wir cîh û kar girt. Ew jî li wir, di sala 1984an da çû ser rehma Xwedê. Rêvitî û cîhbûna li Ewropa pir giran bû.

Sala, demsala da du hev, min malbata xwe jî anî Hollanda. Lê demek hat dastî, min xwast vegêrim welatê xwe. Ez û xarziyê Hesik bi rêya nexwaşiyê tekevut bûbûn. Demekê bişûnda jî vegeriyan gundên xwe.

Te ez berdam deşt û çolan

Bi benek nediya ez te ve girêdayî me
Di kolanan de wek dinê beredayî me

Ew hesreta te derdek e, min bêhêz dike
Dilê minê birîndar bes ji te hez dike

Hatim ber deriyê te, tu ne li mal bû yî
Min sad carî pirsî, nazenîn tu li ku yî

Te dil û cergê min xwîn, ez birîndar kirim
Te ez berdam deşt û çolan, dîn û gêc kirim

Çi bikim ku yar Xwedê ew hesret daye me
Dîtina te miraza min e ji Xwedayê me.

Gurdo

17-11-2014 Lêlat

Mûlla Evîndar

mullaevindar@gmail.com

Li zemanê berê xort diçûn dergîstiyê... Ji ber ku SMS, Facebook jî tunebû, ji çend hefte carekê xort diçûn mala dergîsta xwe û li wir hevdu didiyan. Êsiv jî çûye dergîstiyê. Bavê keçikê tenê ji bo carekê îzîn dabû ku Êsiv were dergîstiyê. Lê problemek mezin heye! Bavê keçikê îzîn neda ku keçika xwe bi tenê li odê, bi dergîstê xwe va li ba hev bin. Xunga keçikê jî dan hêle. Li odê rûniştine, keçik û xunga xwe. Êsiv hat. Derbase ode bû.

Du keçik! Wexta ku keçik ji Êsiv re xwestin Êsiv keçik nedî, nîşan kirin Êsiv dîsa keçik nedîbû, niha ji van keçikan kîjan dergîsta xwe ye! Êsiv bi fedî ye, pirs nake. Dergîst bi fedî ye, xunga dergîste bi fedî ye! Wan ji hev fedî kirin, bin çavan re li hev mes kirin, gotin û sohbeta xwe gîşk ew bû. Êsiv li şûna xwe zêrek cîst (edet weng bû) û çû. Ji wan du keçikan yek bi Êsiv pir rind hat, heta ku bizewice ew xeyal kir. Bûk derxistin, Êsiv tûl heyne ji serçavên bûkê û di dilê xwe da go: „Ew tirsê li min bû“.

ÇÎROKA KUMSORİK Û TAYBETMENDIYÊN ÇÎROKÊN LI SER PÎRIKA MERIXUR

Memê Mala Hine

mem-hine@hotmail.com

Ez ê di vê gotarê de ewil versiyona çîroka Kumsorik a ku li gundê me dihat gotin binivîsim û dûre jî bi rêya vê çîroka Kumsorik ez ê taybetmendiye serke yên çîrokên li ser Pîrika Merixur binirxînim. Min ev çîrok ji meta xwe Ela Ceferê Hine guhdarî kir. Dema ku min deşîfrasyona vê çîrokê kir, min dengên -a ku li ba me dewsa dengê -e girtiye kirin -e û dengên -o ku li ba me dewsa dengê -a girtiye kirine -a. Ji bilî vê yekê min tu guhertinek nekiriye.

Yek hewuye yek tunewuye, Kumsorikek hewuye. Pênc şeşek jî gedena çûk hewune. Kumsorik di nav de girbûye. Ew çûne pincêr. Pîrikek têye, diwê “Gedeno hûn çi dikine?” Diwên “Em pincêr dikine.” Pîrik diwê “Werin, werin hindê min pincêr pir e.” Pîrik wan diwe û dike îçî. Diwê “Gedeno de rakevin. Kumsorik çikî gir e, ranakeve. Kumsorik dizane ew Pîrika Merixur e, dike gedexwe. Kumsorik diwê “Xewa min nêye. Ez birçî me.” Pîrik diwê “Kumsorik qurba tu çi bixwe?” Gotiye “Ez ê dikê sor bixwim.” Pîrikê gotiye “Ez qurban

te wim. Ez ê rawim te re dîkekî sor bikim.” Tere lê re dîkekî sor dike. Kumsorik dixwe.

Pîrik dîsa tê, gedexwe, kumsorik ranakeve. Pîrê gotiye “Kumsorik, yawrim tu çima ranakeviye. Gotiye “Diya min van çaxana me re mûj diqewirandin.” Gotiye “Ez ê jî biqewirînim.” Gotiye “De here biqewirîne.” Kumsorik mûjê xwe jî dixwe, dîsa ranakeve. Pîrika Merixur dîsa tê diwê “De rakeve” û tere. Kumsorik dindire pîrikê diranga dide çerxê. Diranga dide çerxê dike were gedexwe. Pîrik dîsa tê diwê “Kumsorik de rakeve.” Kumsorik diwê “Dunê van çaxan diya min bi elegê av tîna.” Pîrika Merixur diwê “Pa, ez jî herim bînim.” Kumsorik diwê “De here bîne.”

Va dişîne û dike here bi elegê av bîne. Va dişîne kaniyê, vana direvin. Pîrika merixur li van digere. Kumsorik derdikeve ser darê. Pîrika Merixur li Kumsorik digere, digere Kumsorik tune. Va diwê “Ê Kumsorik ez ê te bixwim.” Kumsorik diwê “Pîrê tu ki çito min bixwe? Qirş û qal tunene, tu

ki çito min bixwe? Min çêl ke, derê çêl girê de. Here êzingê xwe top ke, were min bixwe.” Pîrika merixur gotiye “Temam. Ez ê weyn bikim.” Radiwe dixe îçi çêl, derê çêl girê dide, tere êzing berhev dike.

Va dîsa radiwe, xwe çêl de derdixwe û golikê pîrê dike îçi çêl. Derê çêl girê dide û dîsa derdikeve ser darê. Pîrik tê diwê “Ê kumsorik te pir bi min kir, ez jî li te bikim.” Şivnik dide destê xwe, lê dixe. Golik diwê “qûr”. Pîrik diwê “Ha, çito mîna golika dike qûr qûr.” Halbukî golikê xwe ye. Cardin lê dixe, dîsa golik diwê “qûr”. Pîrik diwê “Mûjê min ê sorkirî derxe.” Pîrik cardin lê dixe, dîsa golik diwê “qûr”. Pîrik diwê “Dîkê min ê sorkirî derxe.” Pîrik cardin lê dixe, dîsa golik diwê “qûr”. Pîrik diwê “Ava min ê elegê derxe.” Pîrik ca vedike, çi veke, golikê xwe ye. Diwê “Te dî, golik jî çû.” Diwê “Kumsorik ez ê te bigirim, ez ê te bixwim.” Kumsorik kevirekî xwe yî aka derdixe, daydine ser darê. Diwê “Pîrê, pîrê devê xwe veke ez tême.” Pîrik devê xwe vedike ku Kumsorik were. Kumsorik kevir tavê pîrê, pîr dimire.

Çivroka min bû rast, min xwar pariyeke mast...

Di nav kurdên Anatolyayê de çîrokên li ser Pîrika Merixur gelek in. Wekî ku tê zanîn versiyonên çîrokên

Pîrika Merixur li Kurdistanê wekî pîrhebok derbas dibin. Dibe ku di nav kurdên Anatolyayê de jî çîrokên pîrhebok hebin. Lê bi qasî ku ez dizanim ev cure çîrok bêtir wekî çîrokên Pîrika Merixur derbas dibe. Dema ku em zarok bûn ji bo ku me bitirsînin digotin “Pîrika Merixur were we bixwe!” Bi rastî jî zarok jê ditirsîyan. Di nav çîrokên Pîrika Merixur de çîroka Kumsorik bi dîtina min çîroka herî balkêş e.

Ez ê bi rêya vê çîrokê hewl bidim ku taybetmendiyên sereke yên vegotina çîroka Pîrika Merixur binirxînim. Di van çîrokan de karaktera Pîrika Merixur e. Ev karakter ku her tim ji jineke pîr pêk tê vegotineke pederşahî ye ku jinan xirab nîşan dide. Ango jina ku kaniya jiyanê ye di van çîrokan de wekî mirovxur tên nîşandan. Bêguman di van çîrokan de hemû jinên pîr ne Pîrika Merixur in, lê di hin çîrokan de carna du xwişk carna jî dê û keç dibin Pîrika Merixur. Lê tu car ne birayê wan, ne jî kurê wan wekî mirovên merixur nayên nîşandan.

Di van çîrokan de Pîrika Merixur ji bo ku mirovan bixwe bi fêlbazî tevdigere. Ango Pîrikên Merixur hertim qurbanên xwe yan li derekê asê dikin, yan wan radizînin û bi vî awayî wan dixe dafikê. Lê belê di

van çîrokan de em tu car li rastî wê yekê nayên ku Pîrika Merixur bi ser kevin û qurbanên xwe bixwin. Her carê Pîrika Merixur yan diranên xwe “dide çerxê” yan jî “disû” ku dest bi xwarina qurbanên xwe bike. Lê her carê qurban bi zîrekî xwe ji destê Pîrika Merixur xilas dike. Di çîrokan de tenê mirovxuriya Pîrika Merixur di dema borî de pêk tê û di dema bûyerên vegotî yê çîrokê de em li rastî mirovxuriya wê nayên.

Kesên ku li rastî êrişa Pîrika Merixur tî, her tim bi zîrekî hewl didin û xwe ji destê wê xilas dikin. Di vê çîrokê de em dibînin ku Kumsorik gelek jîr e û xwe ji wan zarokên din ên biçûk berpirsiyar dibîne. Ew hema Pîrika Merixur nas dike û ji bo ku xwe û zarokên din xilas bike planan çê dike. Dema ku Kumsorik ji bo ku karekî wisa bide ber Pîrika Merixur da ku tu car nikaribe pêk bîne, hêmaya mîtolojîk a Sîsîfos tîne bîra me. Kumsorik di vê çîrokê de ji Pîrika Merixur re dibêje ku “Dunê van çaxan diya min bi elegê av tîna.” Ev hêma ku li gelek çîrokên ku li Kurdistanê tî gotin jî heye. Ev vegotin qala hewleke bêdawî dike. Lewre tu çiqas av tijî bikî jî av di elegê angî bêtîngê re birîje û hewla anîna avê dê her tim bê encam bimîne. Di mîtosa yewnana kevnar de jî Sîsîfosê

ku ji ber xapandina xwedayan hatibû cezakirin, dê her tim zinarekî gilover derxista ser girekî. Lê belê Sîsîfos dema ku zinar tîne nêzî ser gir zinar dîsa digindire jêr û ev hewl heta hetayê bê encam dimîne.

Bêguman di çîroka Kumsorik de pîrika merixur ewil hewl dide ku bi bêtîngê av bîne, lê piştî hin hewlan fahm dike ku ev yek ne pêkan e û dev jê berdide. Lê belê Kumsorik bi vê yekê digihîje armanca xwe û bi vî awayî pîrê diwestîne. Di çîrokê de tê nîşandan ku Kumsorik eger ku pîrê biwestîne dikare bi ser keve.

Her çîrokek rastiyan jîyanê hînî zarokan dike. Angî mezin bi rêya çîrokan rastiyan jîyanê bi awayekî ku zarok bikaribin fahm bikin ji zarokan re vedibêjin. Di çîrokan de ji zarokan re tê gotin ku çawa ku mirovên baş hene wisa jî mirovên xirab hene û divê li hember mirovên xirab bergiriyên xwe bigirin. Bi rêya çîrokan haya çîrokan ji metirsiyan jîyanê dibin û hwd. Dema ku em ji vê hêlê ve li çîroka Kumsorik dinîhêrin em dibînin ku ev çîrok ji zarokan re dibêje ku eger hûn jîr bin û bi hêvî hewl bidin hûn dikarin ji derd û belayan jîyanê xilas bin. Çîroka Kumsorik ji me re dibêje ku eger hûn tê bikoşin û hêvîdar bin hûn ê bigihîjin rizgariya xwe.

Bûkê malê Hesî Reşîya Eşê, ji hedîseyeke ku hatîyê serî xwe da xweş û xweş û hûr û hûr qal dikir.

Ez bûke acer im. Ez ê xwe ji male xazûr û ji merimalan re dipême. Li diwanê xazur û xasîyê dediwestime. Qiymetê cayên, tîyên û zeyên xwe dizanime.

Sibê zu radibime. Mangê didoşime û golikê mît bi şunda, mangê dibime teva naxirê dikime. Şorbê helîsê didima ser agir û doralîye malê rêş û pak dikime.

Dem, destpêka payîzê ye. Kerîyê mîhê bi şîr ê edî li colê dimêne û car caran gundîyê kom dibine û terine bêriyê. Berîvan û bertî li keran sûwar dibûn dicûn çolê herdê kerîyan.

Mêrê min şivan bû. Bêlên mehelê û pezê malê xwe diçêrand. Me hevdu pir nedidît. Ez jî diçûm bêriyê. Min bi hesret ew temaşa dikir. Lê me hêsên xwe bi dizikî nişan didan. Halîki vekirî ê di dilî xwe da aşîkar bikîni tune bû.

Ez ji bêriyê wegerîm bi şunda ez çûm bavanê xwe. Halnek, ez ê li eynê gundî bûk bûm. Min dîsa jî,

bîra mala bavane dikir. Min destên dê û bavên xwe paç kirin û ji birayî xwe biçuk re min cûm û leblebîyê serbişekir sandi bûn, min ew dan birayê xwe. Ew pir xenê bû. Wexte ku min xwanga xwe hembêz kir, girîyêkî bi min girt ne bê ne qalê bike. Ji hundirda û kûr.

Bi şev, deme ku herkes çu cîhê xwe, ez jî çûm odê xwe. Dişlikê min nedihat. Min ji xwe re sanqike xwe helşand. Wê demê, bûkan wek cîz sandiqêk bi xwe dibirin malê zêva û tiştên xwe dikirên. Min jî tiştên xwe yî bûkîyê û zêrên ku malê xazurî min ji min re kirî bûn kiri bû sandiqê.

Wexte ku min sandiq helşand, min zêrên xwe nedîn. Min çend caran, li hundirê sanqikê û nav boxçe ku min zêr kirinê meze kir lê serencam tim eynê. Telaşêkê ez heynam.

Min, devdeva nîvro, sandiq dîsa helşand û dît ku zêrên minê li cîh xene. Xenê bûm! Lê min tişt fehm nekir. Min sandiq kîlît kiri bû. Kîlît neheti bû şikênandin û sandiqê tu deren xwe nehatibûn parçekirin.

Deme ku min zêr kirin dest xwe ku zêrên şil in û bîhne xûyê jê tê. Min tu bersiv nedîn. Ez aciz bûm û tirsîm. Çi ecêb e. Nawêrime ku ji malbete re jî katkime. Çi xulîyê bi serî xwe kim.

Ezê ji tecrûbên xwe da dizanim dawîyê sebirê herdem bi xêr e. Min got ez ê bipêr.

Çend rojan du vê buyêrê, piştî nimijê yasîna, min xwe li odê direj kiri bû û xem û xeyalên xwe di ber xwe re derbas dikirin ku dengêk hat û bakî germ xwe li min pêça. Ez hîşyarê xwe bûm ku qeretîyêke beledî û por li piştê wek çemekî biharê diherike ku ê li ber sandiqê dawestiyê.

Qeretîyê pişta xwe di min alkiribû. Ava reş bi ber çavên min da hat û min xwe şaş kir. Wexte ku ez hatime xwe ku jinikê sandiqê vekirîyê û ê boxça ku zer tê da vedikê.

Min dengê xwe nekir. Jinikê beşibîrlîk bi stûye xwe da û bezing kirin destê xwe bi şunda beriyê xwe berve min kir. Lamba kira destî xwe yî raste û nezikî min bû. Ez bi şune xwe da nûskîm.

Wê xezalê, ez demekê temaşa kirim. Dest û lingen min li min sist bûn. Mejoyê min pûç bû.

Xezalê got; metirse! Hûn însan, yên ku jê netirsîn jê tidirsîn yên ku jê bitirsîn jî natirsîn.

Deme ku tîrsa min tenekê derbas bû, min li jinikê temaşa kir.

Keçeke beledî, çavşîn wek rengê ezman û avê behrê spî. Stû dirêj wek dara sêrvî. Lêw şekir wek dîlîmên şeftalî û didan wek rezên berxên berkozê. Tilî dirêj û qelew û çîpdirêj.

– Dawetê bîrayê min heye. Ez a zêrên te, piştî dawetê vegerînim. Eger du dixwazî, ez a te li terkîyê xanim. Em ê tevda govendê bikşînin û kêf bikin. Deng ji min derneket. Wê jî îsrar nekir.

Berikî here, vegeriya min û got;

– Jîyan gavek e. Fireh û kûr bikole!!

– Bi şev hêstêrkan mejmêre û bi roj jî axê mepîve!

– Zêrên ku nivînên te germ nekin, çi feda xwe ji te re hene qurban!?

VEGUHERÎN

- Serpêhatiya merivekî ku veguhêriye, bûye kêz -

Franz Kafka

Wergera ji almanî: Nuh Ateş

nuhates@web.de

III

-2-

Lêbelam tu kesî mêyla xwe nedida wî. Malbat bitûnî bilêxistina vîyolînê da ketibû. Mêrên kirêdar jî sifê, dest di berîyên şêl da, pir nêzikî kursîya noteyan kom bûbûn. Wan ê bikanîna noteyan bibînin û bêguman xwanga pê eciz bibûya. Lê pir neçû, wan di bin dengkirinên kêmbilind da, bi seriyên bervejêrkirî xwe paşva, berve pencereyê kişandin û li wir jî ew di bin çavlebûna bavê ya bixem da, man. Bi rastî pir zelal xwîya dikir, mîna ku bibêjî kêf û şahîya ku wan ji lêxistina vîyolînê dipan ne bi dilê wan be û ew ê ji wê xeyalşikestî bûne û ji pêşkêşiyê bitûnî xwaş danegerîne û ji ber nazikîyê xwe radigirine û bêhizur dihêline. Bi taybetî jî, ji şekila ku wan gîştan pê dûyê beligcixareyê di dev û bîvilên xwe ra berve jor berdidan, wer xwîya dikir ku ew ê pir sur bûne. De tu were wê, xwangê pir seg li vîyolîne dixist. Rûyê wê berve hêlekê xwarvakirî bû. Awirên wê bi

xem û baldarî didan pey rêzên noteyan. Gregor gavek din pêşva xuşîya û serîyê xwe rind nêzikî herdê kiribû, bi omdîya ku bi şîya bikira bi berçavên xwangê keve. Ma ew ajelek bû û çima muzîkê ew dikişand û xemgîn dikir? Ji ba wî, rêya ku wî bigihîne xurdeya nenas a ku ew bi hesreta wê bû, xwe pê dinimand. Ew î bi biryar bû, ku xwe bigihîne herda xwangê û rahêle derdawên fîstanê wê û bi vê rê, wê pê bihesîne ku ew kerema xwe bi vîyolîna xwe va bihê odeya wî. Çima ku li vir, di ser wî ra kesekî biqasî wî qedirzanê lêxistina vîyolînê tunebû. Wî nedixwast cihbihêle ku xwang êdî ji odeya wî derkeve, qet nebe hetanî ku ew dijî. Cara pêşî bû ku dûmena wî ya bixof bi kêrî wî bihê. Ew amede bû ku eynê demê xwe bigihîne ber her derîyekî odeya xwe û hêza êrişkaran bişkêne. Divîya bû xwang ne bi zorê, bi dilê xwe li ba wî bimê û li kêleka wî, li ser qenepeyê danîşe

û guhê xwe berve jêr, nêzikî wî bike. Û di pey va, wî dixwast sirra xwe ji wê ra vebike. Wî sedîsed nêt kiribû ku wê bişîne konservatoriômê, eger ev bêtara neketiba navberê, wî eva li Noela rabirtî, -ma Noel zûva ranebirtîbû?- ji gîştan ra eşkere biki-ra, bêyî ku guh pê gotinên dijber va bike. Ji van beyanan şûnda, xwanga ji ber hundirkeliyê hêstiran bibarîne û Gregor ê hetanî binçengên wê rabe û stûyê wê yê ji destpêkirina kar vir da vekirî û bê gerdanbend û stûkur, paç bike.

Merivê navîn berve bavê bang kir, got, “Mîrza Samsa!” û bêyî ku şoreke din bike, wî bi tilîya nîşanê Gregor yê ku giran berve pêş kaş dibû, bi hevalên xwe dinimand. Dengê vîyolînê ket. Kirêdarê navîn berî berve hevalên xwe kir û si-vik kenîya, paşê dîsa berve Gregor mês kir. Bavê berê hewce dît, şûna ku Gregor biqewitîne, kirêdaran bihewîne. Halbuku kirêdar di eslê xwe da dilteng nebûbûn, berevajî ji guhdarkirina vîyolînê pirtir, dîşliqê wan bi Gregor dihat. Bav bilez çû ba wan û wî li ber xwe dida ku wan bi hembêza vekirî berve odeya wan bibe û bi bedena xwe, sewa ku ew Gre-gor nebînin, pêşîyê li wan bigre. Bi rastî kirêdar denekî hers bûbûn, me-

riv nedizanî ji ber tevgêra bavê yan ji ber hayjênebûna ji hebûna cîranekî han î, wekî Gregor. Wan raveyek ji bavê xwastin, destê xwe heldinan, bi nehewînî rîhên xwe vedibiçirandin û xwe pir giran berve odeya xwe vedi-kişandin. Di wê navberê da, xwang ya ku ji ber dawîlêanîna lêxistina vîyolînê a ji nişkava, jixwevaçûyî bû, ji nûva hatibû xwe. Wê bîstekê, bi destên sistbûyî û bi rû xwe da berdayî, pê vîyolîn û kevanê girtî, li notayan mês kir, mîna ku hîn li vîyoline bixe. Pêçekê şûnda, wê bi hemlekê xwe berehev kir û hacetên muzîkê birin û deynan hembêza dayê ya ku ji derdê nefestengîyê û pişika ku bi lez dişûxilî, li ser paldanka xwe rûniştibû. Dûv ra, ew bezîya û xwe avête odeya li kêlekê ya ku kirêdar jî, ji ber çewsandina bavê, bilez nêzikî dibûn. Meriv didît ku çawa lihêf û balîf, bi destên xwangê yên hukirî ber-ve jor heldihatî û şûna xwe didîtî. Hîn ku kirêdar negihêştibûn odeyê, wê karê berehevkirin û helçinînê bi dawî kir, bi lez û bêdeng ji odeya derket. Ji avrûyê serhîşkîya ku dîsa pît pêgirtibû, bavê her çêşîd gramîya ku, çiqas bibe, ew jê deyndarê kirêdaran bû, ji bîr kiribû. Wî pir ling dida ser wan, ew didan ber xwe, kîngê ku borinî vê ser merivê navîn

ket û wî ling bi herdê va da, hîngê ew dawestî. Merivê navîn got, „ez li vir beyan dikim“ û pê ra, destê xwe berve jor helna û awirên wî li dayê û xwangê jî digerîyan, „ku ez bi heceta rabûnûrûniştinên pir bibed yên li vê mal û malbatê li rewac“ -pê ra, wî kin û jixwe bawer tu kir herdê- „peymana kirêyê aniha fesih dikim. Ez ji bo rojên ku ez li vir rûniştibûm jî tu bedelî nadim, bi ser da, ez ê bifikirim, -hun bi min bawer bikin- ka ez ê hîn çawa dawa hen xwastekên din yên bi bahaneyên hêsan li we bikim.“ Ew bêdeng bû û li ber xwe mês kir, mîna ku li benda tiştêkî be. Di wî devî da, her du hevalên wî he ma dest pê şoran kirin: „Erê, em jî aniha peymana kirêyê fesih dikin.“ Li ser vê, wî rahîste destikê dêrî û ew bi reqînî girt.

Bav bi halekî şewişî û bi destlêgerandinî berve paldanka xwe çû û xwe berda ser wê. Weng xwîya fikir, mîna ku ew bixwaze xwe ji bo xelmaşîya her êvarê, dirêj bike. Belam, pît hêjandina serîyê wî, wekî ku ew bê pêgirtî be, dinimand ku ew qet ranediket. Gregor bi dirêjîya wextê bêdeng û neliv li cihê ku ew lê bi ber çavên kirêdaran ketibû, sekinîbû. Çima ku plana wî neçûbû sêrî, ew xeyalşikestî bûbû. Kî dizane, belkî jî

bêteqetmayîna ji ber pir birçîbûnê rê nedida ku ew xwe bilevîne. Ew ditirsîya ku bîstekê şûnda, bi gu-maneke nêzikî sedîsed lihevketîyeka biqewime û cirma wê jî bi ser wî da bihê xwarê û dipa. Lêbelam, ew bi dengê girmîniya vîyolînê, ya ku ji hembêza dayê, ji bin tilîyên wê yên cirifonek ketibû, veneciniqîya.

„Dê û bavên ezîz“ xwangê got û sewa pêhêsandina destpêkirinê, destê xwe li maseyê xist û weha pêda çû: “Va rewza veng berdewam nake, ku hun vê qebul nekin jî, ez veng difikirim. Ez naxwazim ku bi navî birayê xwe, bane vî cenewarî bikim û loma tenê dibêjim: Gerek e ku em çareyekê bibînin û pê wî ji derîyê xwe bikin. Ya ku ji destê me hatî, me kir, me xizmete wî kir, me tehemule wî kir. Ez bawer im, kesekî ku ji vê mêylê da lomeyan li me bike tune.”

„Gotinên te rast in“ bavê ji bo xwe got. Dayê ya ku hîn nedikanî têt nefesê helne, bi nihêrineke dîwane, di destê li ber dêv da, dest pê kuxîneke fetisokî kir.

Xwang bi lez çû ba dayê û destê xwe da ber henîya wê. Bav, weng xwîya dibû, mîna ku bi ser gotinen xwangê va, hatibû ser hen fikirînên zelal. Wî xwe sererast kir û bi şeb-

qeya xizmetdarîyê ya di navberê firaqan, yên ku ji xwarina şevê da li ser maseyê mabûn, dileyîst û carcaran li Gregor ê neliv, mês dikir.

“Gerek e em hewl bidin ku wî ji derîyê xwe bikin,” xwangê tenê ji bavê ra got, çimkî dayê ji ber kuxîné tişteke nedibihîst. “hun her du jî, hun ê xwe di wî da bikûjin; ez dibînim ku eva bihê serîyê we. Şayed meriv, wekî me hemîyan, wer bi zehmet kar bike, ew nikane bi ser da li malê jî van meşeqetîyan ebedî bikişîne. Ez nikanim êdî xwe bidim ber vî barî.” Û wê dest pê girîyekî pir şên kir, hêstêrikên wê dirijîn serçavê dayê û wê ew bi destlivandineke mekanîk pak dikirin.

Bavê bi berketî û fehmkirîyeke balkişandî got, “keçê, de em çir bikin?”

Xwangê tenê milên xwe kutan, wekî nişana neçarîyê ya ku di wexta girînê da lê wê, beravajî ji xwe emînîya wê ya berê, peyda bûbû.

“De na ku, qet nebe ew me fehm bike,” bavê bi nîvpîrsînî got. Xwangê ji nava girî dest bi lez ba kir, mîna ku bibêje, ev ne yeke ku bihê kirin.

“De na ku, qet nebe ew me fehm bike,” bavê dubare kir û bi girtina çavan wî bawerîya xwangê ya dijberî vê, kire serîyê xwe, “hinge lihevha-

tineka bi wî va mimkun biba. Lê veng!”

Xwangê bang kir û got, “gerek e ew ji derîyê me here, çare tenê ev e, bavo. Divê tu xwe ji fikira ku ev Gregor e, xelas bikî. Bedbextîya me ya mezin ew e ku me ewqas dirêj bi vê bawer kiriye. Ma çawa ev ê bikane bibe Geger? Eger ev Gregor bûya, hinge wî ê zûva qebûl bikira, ku bi hevra jîyîna însanan bi heywanekî ha va, ne mimkun e û ew ê ji zûva bi dilê xwe biçûya. Em ê hîngê bê bira bimana, lê me jîyana xwe bi-domanda û êw ê di bîra me da bi qedir bima. Lê vengina, ev heywana î benda me bernadê, kirêdaran eciz dikê, tuê bibêjî wî dil heye ku malê bitûn bi dest xwe bixe û me gîştikan bavê derva. Carekê mês bike bavo;” wê ji nişkava wêrinî bi ser xwe xist û got, “ew dîsa dest pê dike!” Û wê bi vecinîqî ya ku Gregor qet fehm nedikir, bi qest dayê cihîşt, paldanka wê wêda livand û mîna ku bixwasta ji herda Gregor dûr bikeve, da dûv bavê. Bavê, yê ku ji ber tevgera xwangê tevlihev bûbû û rabûbû ser xwe û mîna ku sewa parastina xwangê be, li ber wê pîyên xwe hetanî nîvî berve jor heldan.

Hîç nedihata heşê Gregor ku bixwaze kesekî yan xwangê, ew qet

nedihate bîra wî, bitirsîne. Wî tenê dest pêkiribû ku çerx bibe û sewa ku bi şûnda vegere odeya xwe xîret dikir. Encax çerxbûna wî bal kişandibû. Çimkî, ji ber halê wî yê neçê, dema çerxbûnên dijwar divîya bû ku ew bi serîyê xwe bibe alîkar. Ji bo vê, wî serîyê xwe çend caran hilda û bi herdê va dabû. Ew sekinî û li dor û paş xwe mês kir. Wer xwîya dikir ku nêtê wî ya pak hatibû fehmkirin. Tenê vecinîqîyeke kurt bû ev. Niha gîştan bédeng û bixem li wî mês dikir. Dayê bi lingên dihevגיhandî û dirêjkirî li ser paldankê bû û ji ber wêstîyayîyê çawên wê hemahema diketin hev. Bav û xwang li tenîştahê hev rûniştibûn. Xwangê destê xwe di stûyê bavê ra bir.

Gregor ji xwebixwe ra got, “niha ez ê bi şîya bikim çerx bibim,” û dest pê karê xwe kir. Wî nedikanî ku fişîniya nefeskêşîyê ya ji ber zehmetîyan veşêre. Loma, wî li vir û wê ji bo vêsîniyê navber dida. Wekî din jî, tu kesî ling nedida ser, ew bi raya xwe bû. Gava ku wî çerxbûn hal kir, hema dest pê şûndavegerîna li ser henîyê kir. Bi dirêjîya dûrîyê ya di navberê wî û odeyê da, ew mat dima. Û ew bi berda nediçû ku wî çawa pêçekê di ber vê ev rêya, hem jî bi bêhêzîya xwe, mîna ku wî

hay jê nebe, ji paş xwe va cihîştiye. Timûtim xûşîn û fikira bi lezxûşînê di sêrî da, wî qet bala xwe nedida evê ku tu gotin û bang yên ji alîyê malbatê va wî tevlihev bikin. Gava ku gihêşt ber dêrî, wî serîyê xwe çerx kir lê ne bitûn, ji ber ku wî hîşkbûna stûyê xwe hês dikir û nihayed dît ku ji paş wî va tişteke nehatiye guhêrin. Tenê xwang rabûbû ser lingan. Bi awira dawîyê ra dayê ya ku ketibû xewa kûr, jê wî va xwîya kir.

Hîn nû ew hatibû odeyê, cîhlê derî bi lez û qeym hate girtin û singukirin. Bi reqînîya ji nişkava ya ji paşva, Gregor wer lerizî ku çîp di binî da duta bûn. Ev xwang bû ya pir bi lez. Bi şekileke repkirî ew dawestibû û dipa, paşê bi lingsivikî berve pêş bazda. Gregor qet nebihîst ku ew hatiye. Berî berve dê û bavê, wê bang kir û got, “nihayed!” û pê ra jî mifte di kevanê kilidê da bada.

“Û niha?” Gregor ji xwebixwe pirs dikir û di şevreşîyê da li derûdora xwe mês dikir. Wî hema kifş kiribû, ku wî hîç nedikanîbû xwe bilevîne. Lê ew bi vê mat nedima. Ya ku pirtir bi wî ecêb dihat û ji wî va nexwezayî xwîya dikir ev bû, ku wî çîng bi şîya kiribû bi van çîpên zirav hetanî niha çûye û hatiye. Bi ser da jî, wî xwe nîspî fereh hîs dikir. Her çiqas ku êş li

her derê bedena wî belav bûbû jî, wî ev weng hîs dikir û her diçû tîna wê kêmtir dibû û li dawîyê radibirt. Sêva kufikî ya ku di piştê da çûbû xwarê û dorûberê wê yê kulbûyî û ser bi xwelî û xubarê hatibû girtin, wî hemahema hîs nedikirin. Bi xemgînî û hezkirî wî malbata xwe tianî bîra xwe. Fikira wî ya di der heqe qewitandina wî ya ji malê da, bi guman di ser ya xwangê ra bû. Di vî halê betal û aramfikirînê da, ew hetanî ku seata qûleyê ji bo sisêyê sibehê lêketibû, ma. Destpêka ronîbûna derva, li ber pencereyê bû qismete wî. Paşê serîyê wî, bêyî hemda wî, bitûn kete ber û di bîvîlan ra nefesa dawî ya bê teqet derçû.

Sibehê zû jina xizmetkar hat odeya Gregor. Ji ber hêz û leza ku wê pê derîyên malê gîşt ji hev dikir û digirtin, her çiqas ew ji bo vê pir caran hatibû tembîkirin jî, raketina bi aramî ne mimkun bû. Gava ku wê, wekî ku kiribû edet, bi çavlêgerandineke kurt bi ser Gregor ra mês kir, tişteki xas yê bi rewşa Gregor va girêdayî bi ber çavên wê neketibû. Wê li ba xwe digot, ew î biqestî xwe nalivînê; wî xwe lê zexelî nandiyê. Wê ji wî her çêşid çînevîz dipa. Wê fikir ku bi şijîngê ya ku teseduf di dest da bû, wî ji hêla derî da gidîgidî bike. Gava ku ji vê

tu encam derneket, ew hers bû. Vê carê jî wê tozîkê ew dehf kir, lê gava ku Gregor di şûna xwe da nelivî ma, ew lê kete şike. Pir neçû, ew bi rastîyê hesîya, çav di serîyê wê da gir bûn û wê di ber xwe da kire weynî, lê pir nesekinîya û çû derîyê odeya raketinê bi lez vekir û bi dengê bilind berve tarîtiyê bang kir, got : « Hela carekê lêbinihêrin, wî can daye; li dera han ketiye, canûcîk jê kişîyaye! »

Hevjînên Samsa di nav nivîna xwe da rep rûniştibûn û difikirîyan ku veciniqîya ji ber banga xizmetkarê derbas bikin û berî wê, bi ber banga wê da herin. Paşê, mîrza û sitî Samsa, her yek ji hêla xwe da, bi lez ji nav nivînê daketin. Mîrza Samsa cila ser lihêfê avêtibû ser milê xwe û sitî Samsa tenê bi pîjema daketibû û her du bi vî halî derbas odeya Gregor bûn. Li vê navberê derîyê odeya mêvanan ya ku ji hatina kirêdaran vir da Grete tê da radiket, ji hev bû. Grete kincên xwe li xwe kiribûn, mîna ku ew qet raneketibe, rûyê wê yê zerkî bûyî ev nîşan dida. « Mir? » sitî Samsa got û bi pirsyarî lê xizmetkarê nihêrîya, lê dîsa jî dixwast ku bi çavê xwe bibîne; halbuku wê dikanîbû bêyî kontrolkirinê biderîne. « Ez bawer dikim, » xizmetkarê got û wekî delîl jî wê meyîtê

Gregor bi şijingê êpêy wêda, berve kenarê bir. Sîtî Samsa virda û wêda hereket dikiir, mîna ku bixwaze şijingê paşva bigre, lê nekir. « Niha, » mîrza Samsa got, « em dikarin dua li Xwedê bikin. » Wî nîşana xaçê kir û jinan jî xwe li wî girtin. Grete ya ku çavê xwe qet ji meyt nedibirî, got : « Mês bikin, ew çiqas pir jar ketiye. Ji zûva ye ku wî tu tişt nedixwar, xwarin çing dihatin û weng jî vedigerîyan. » Arast bedena Gregor bitûn pir tenik bûbû, meriv niha ev didît, çima ku ew êdî li ser çîpan bilind nedibû û wekî din jî, hedefa baldayînê nedihat şaşkirin.

«Grete were, pêçekê were cem me,» sîtî Samsa got, bi sivikkenekî bi keder. Grete da dûv dê û bavê, lê ne beyî ku ji paş xwe va li mêyît mês bikiira, û çû odeya raketinê. Xizmetkarê derî girt û pencere bitûn vekir. Her çiqas ku sibehê zû bû jî, tozîkê tîna germê teve hewayê teze bûbû. Dem, dawîya adarê bû.

Her sê kirêdar ji odeya xwe derketin û bi heyred çav li xurînîya xwe gerandin; ew hatibûn jibîrkirin. “Ka xurînîya me li ku derê ye?” ji wan yê navîn bi miruz ji xizmetkarê pirs kir. Wê tilî bire ber devî xwe û bi lez û bêdeng îşar da wan ku ew kerema bihên odeya Gregor. Ew hatin jî û li wir, bi destên di berîyên xirqeyên

xwe yên hendik qerçimî da, li odeya ku niha ronîbûyî, li dora meytê Gregor dawestîyan.

Li dera han, derîyê odeya raketinê hate vekirin û jê mîrza Samsa bi unîformeya xwe, di pîyekî da jina xwe û di yê dida keçîka wan, derket. Rûyên gîştan bi girî surûpundir bûbûn. Grete rûyê xwe dabû ser pîyê bavê.

“Apartimana min derhal terk bikin!” mîrza Samsa got û derî nîşan da, bêtî ku jinan ji xwe veqetîne. “Hun çi qest dikin?” kirêdarê navîn denekî bi teleşe û bi sivikkenekî şîrîn lêvegerand. Her duyên din bênavber dest li paş di hev didan, mîna ku li benda şabûnîyekê ya ji liberhevda-neke mezin a ku ew ê jê serkevtî derbiketana, bûn. “Ez bi meneya ku min gotî dibêjim,” mîrza Samsa bersiv da û bi refeqetîya her du hevreyên xwe li ser eynê xetî çû ser kirêdar. Kirêdarê navîn di pêşî da bêdeng sekinîbû û berve herdê mês dikiir, mîna ku tiştmiştên di serîyê wî da xwe ji nûva rêz dikiirin. “Êger weng be, hinge em diherin,” wî got û li mîrza Samsa mês kir, mîna ku bi bandora dîlnizmîyeke ku ji nişkava bi ser da hatiye xwarê, sewa vê biryarê icazeyeke nû bixwaze. Mîrza Samsa tenê bi çend çavgirtinîyên kurt yên bi

çavên gir, îşara erêkirinê da. Li ser vê, bi rastî jî kirêdarê navîn bi gavên gir çû odeya mêvanan; her du hevalên wî pêçekê, bi destên pir sakîn, guhdarî kirin û niha jî, ji tirs ku mîrza Samsa ê bikane di ber wan bikeve odeya mêvanan û pêwendîya wan bi serdarê wan va xerab bike, bi bazdanî dan pey wî. Li odeya mêvanan, her sêyan lengerên xwe ji westîyerê û gopalên xwe ji gopaldankê helinan û bêdeng apartiman terk kirin. Mîrza Samsa, wekî ku paşê derkete meydanê, bi bêîtîmadîyeke bêbinî, teve her du jinan derket pêş odeyê. Wan xwe bi derabeyê hebstartin û li her sê kirêdarên ku giran lê bênavbar bi merdîwana dirêj da berjêr dadiketin, dinihêrin. Kirêdar li çivekê her qatekî pêçekê ji ber çavan wenda dibûn û paşê dîsa xwîya dibûn. Her ku ew berjêr dadiketin, eleqeya malbata Samsa bi wan ra kêmtir dibû. Û gava ku berdestîkê qesabekî bi debaxa li ser sêrî, bi tevgêreke liserxweyî berve wan hat û paşê li wan rabirt û berve jor helkişt, hingê mîrza Samsa teve jinan derabe cihhişt û her sê bi dilferehî vegeyriyan apartimana xwe.

Wan biryar dan ku vê rojê sewa vehêsin û gerînê derbas bikin. Wan ev navberdayîna kar ne tenê heq kiribûn, bêşik ihtiyaca wan jî pê

hebû. Û ew li dora maseyê rûniştin û sê nameyên borînê nivîsandin; mîrza Samsa ji midurê xwe ra, sitî Samsa ji siparîşxwazê xwe ra, Grete ji patronê xwe ra dinivîsand. Wexta ku wan name dinivîsandin, xizmetkar kete hundir, sewa ku bibêje, ew dihere, çima ku karê wê yê sibehê êdî bi dawî bibû. Her sêyan ku bi ser nivîsandinê da xwar va hatibûn, siftê tenê serî ba kirin, bêtî ku bervê wê mês bikin. Kîngê ku xizmetkarê nexwast ji wê derê bi dûr keve, wan bi hers li wê mês kirin. “Niha çi?” mîrza Samsa jê pirs kir. Xizmetkar bi rûkenî li nav dêrî dawestîbû, mîna ku mîzgîneke xwaşbextîyê bide malbatê, lê ya ku ew a paşê, kîngê ku têr ji wê bihata pirsikirin, bi lêv bike. Perikê piçûk yê hêştirmeyê yê ku bi ser lengerê wê va hemahema repdaniştî û ji sêrî da hêrsê mîrza Samsa pê radibû, berve her hêlekê xwarva dibû. “Bi rastî hun hîn çi dixwazin?” sitî Samsa ya ku xizmetkarê pirtir jê ra hurmet dikir, pirs kir. Xizmetkarê got, “erê” û ji avrûyê kenekî nazîk da, wê nedikanî ku hema dengkirina xwe berdewam bike, “yanê ev tiştê han ê çawa bihê berterefkirin, gerek hun vê ji xwe ra nekin xem, ew hal bû.” Sitî Samsa û Grete bi ser nameyên da weng xwarve hatibûn, mîna ku dixwastin

nivîsandinê bidomînin. Mîrza Samsa pêhêşyabû ku xizmetkarê dil heye dest pê bike, bi hûrgilî her tiştî kat bike. Bi dirêjkirina destê xwe, wî ev red kir. Çima ku derfet tunebû xizmetkar kat bike, lezbûnîya wê hate bîrê û bi dilşikestî bang kir got, “De bi xatirê we gîştan” û bi bejîkî berê xwe çerx kir, di pey xwe va derî bi reqînîyeke mezin lêxist û apartiman terk kir.

“Vê êvarê, ewa ji karê xizmetkarîyê bihê derxistin,” mîrza Samsa got. Lê ne jina xwe û ne ji keçîka xwe cewabek neda wî; çima ku xizmetkarê, wekî ku xwîya dikir, hûzûra wan ya ku hîn nû dest pê kiribû, herimand. Ew rabûn ser xwe, çûn ber pencereyê û li wir bi destên di stûyê hevûdu ra birî, sekinîyan. Mîrza Samsa xwe di paldankê da çerx kir û mêyla xwe da wan. Paşê, wî bang kir û got: “De carekê werin wira. Bes e, êdî nekevin pey tiştên kevn û tozîkê bi gura min bikin.” Jinan hema bi gura wî kirin, bi lez çûn ba wî, bi ber dilê wî da çûn û nameyên xwe zû bi dawî kirin.

Paşê, her sê bi hevra ji apartimanê ya ku ew bi mahan jê derneketibûn, derketin û bi tiramwayê çûn dervayî bajêr. Kompartimana ku ew tê da bi tenê bûn, bi tîna zîya rojê germ bûbû. Bi rehetîya rûniştina pişt li ber qenepeyê, wan li ser şans û

omdîyên dahatîyê deng dikirin û ku meriv hûr lê binihêrîya, ew ne xerab bûn. Çima ku pêwêndîya kar ya her sêyan a ku wan hetanî niha qet ji hev pirsnekiribû, pir misaîd û ji bo pêşedemê bi avantaj bû. Ji niha da, rindbûneke çê ya rewşê, bêşik a di saye malguherîyê da mimkun bibe. Wan nêt kiribû ku derbasî apartîmaneke ji ya niha a ku Gregor pê qayîl bûbû, piçûktir, herzantir û li dereke rind, yanê yeke pratîk bibin. Gava ku wan veng sohbet dikirin, bala mîrza û sitî Samsa kişîya ser keçîka wan a ku her diçû şên û jînde dibû. Li van demên dawîyê, bi ser ewqas zehmetî û serêşîyan yên ku ew bengzerîkî kiribûn da, ew bûbû keçîkeke bedew, gihêştî û têrtijî. Bisakînî û hemahema bêzanetî û bi hevûdu fehmkirineke bi rêya awiran, ew difikiyîyan ku êdî wext nêzik bûye, ku ji keçîka xwe ra li mêrekî heşgihêştî bigerin. Gava ku li dawîya rêwîtiyê, keçîk di ber gîştan rabû ser xwe û bedena xwe ya cîwan vekêşand, ev ji dê û bavê ra mîna ku bûbû tesdîqeke ji bo xewnên wan yên nû û nêtên wan yên pak.

Dawî

Mainz, (Almanya) 27.01. 2016

Serpêhatiya newiyên cinan: Hêstirên Graniayê

Rohat Alakom

rohat.alakom@yahoo.se

Hêstirên Graniayê navê pirtûkeke zarokan ku ji aliyê Elizabeth A Nolan hatiye nivîsîn (Weşanxaneya Apec, 2016). Nivîskar bi xwe ji Îrlandayê ye lê belê li Amerîkayê dijî. Çapa kurdî bi herdu zaravayan kurmancî û zazakî ligel swêdî di carekê de wek sê pirtûk li Swêdê hatin weşandin. Angorî agahiyên nivîskar çapa orjînal ya îngilîzî di demeke nêz de derdikeve. Naveroka pirtûkê li ser bingehe çîrok yan jî efsaneyê naskirî, efsaneyêke dîrokî ava bûye.

Nivîskar mirov dikare bêje ku ji berhemeke folklorîk bi rê ketiye û di dawiyê de bi forma vegotina çîrokî teksteke edebî afirandiye. Çawa tê gotin Hezretî Silêman qasî 500 kesên mîna cinan sirgûnî Çîyayên Zagrosê kirine, ji lihevzêdebûna van cinan paşê kurd peyda bûne. Di pirtûkê de em rêwitiya wan a berbi Îrlandayê û vegera wan a dilşa ligel 500 periyên îrlandî dibînin. Çawa tê zanîn angorî şaxeke din Hezretî Silêman 40 kesên wek pehliwanan şandiye Ewropayê bona 40 jinên her xweşik jê re peyda bikin, bînin.

Lê belê dema ew bi van jinan vedigerin tîr, dibihîsin

ku Hezretî Silêman wefat kiriye. Ev kesan van jinan ji xwe re dikin bermalî. Di dawiyê de angorî efsaneyê kurd wek komeke etnîkî peyda dibin. Nivîskar Elizabeth A Nolan belkî vê şaxa (guharto, variant) efsaneyê peyda bûna kurdan bike mijara pirtûkeke din û xwendevanên xwe vê carê wek mînak li welatên Îskandinavyayê bigerîne.

Niha em êdî dikarin efsaneyê Hezretî Silêman berdin, berê xwe bidin naveroka pirtûka Elizabeth A Nolan a bi navê *Hêstirên Graniayê*. 500 cinên ku di dawiyê de bûne mirov, bûne kurd terkiserî dinê dibin diçin derdikevin Hiberniayê (Navê Îrlandayê bi latînî ku tê wateya Welatê Zivistanê). Lehengê pirtûkê yê mîrîn Tijda di xewna xwe ev welata dîtiye. Ji ber vê jî ligel 500 kesan li xalîçeyên xwe yê rengîn siyar dibin, difirin berê xwe didin Îrlandayê. 500 kurd bi pêşengiya



Tijda û 500 rahîbeyên îrlandî bi pêşengiya Graniyê gotinên xwe dikin yek, dizewicin û bi seyraneke vedigerin Kurdistanê. Ziman, dîrok, çand, edet û dezgehên xwe yên xalîçeyan jî bi xwe re tînin. Berî ku dest bi vê seyrana Kurdistanê bikin herdu aliyên evîndar di navbera xwe de peymanekê jî îmze dikin wekî azadiya jinan li Kurdistanê her berdewam û mayende be wek evîna wan, kurd careke din “dînîtiya nekin” û bi cinan re zêde nelîzin! Di zimanê kurdî de îdîom, pêwîja “bi cinan re listin” tê wateya kirina tişt û bûyerên neçê û bêpîvan. Li jêrê jî em ê bibînin vê carê cinekurd heyranîyekê jî peyda dikin.

Ji welatê xwe Îrlandayê derketin gelek diçe zora Graniyê, berxwe dikeve û hêstir ji çavên wê tîn xarê. Ev yeka navê pirtûkê jî tayîn dike: *Hêstirên Graniyê*. Ev hêstiran di pirtûkê de rol û fonksiyoneke din jî dilîzin, li Kurdistanê toven baxçeyên hinaran pêk tînin. Nivîskar hêstiran dike yaqût, yaqût dike hinar. Ev hersê peyv di pirtûkê de bi tehrekî hunerî dikevin zikê hev, bihûşteke derewîn peyda dikin. Mirov dikare bêje ku nivîskar van baxçeyan bi hêstirên çavên Graniyê av dide. Nivîskar di warê bûyer û mijar bi

pevgirêdanê de gelek jêhatî xuya dike. Dîzgîna hevahengiyê jî bernade. Êş, keder û nalîna Graniyê li ser vê rêya dûrvelatîyê gelek mezin e. Lê belê tişteki bike jî tune. Li ser welatê wan jî ewrên reş digerin. Mijara xerîbîyê di pirtûkê de dibe mijareke giring. Ji ber vê jî Elizabeth A Nolanê ev gotinên nivîskarê yunanî Euripides di destpêka pirtûka xwe de wek gotinên xweş, gotinên zêrîn bi cîh kiriye: “Li dunyayê tu eş tune ku ji windakirina welatekî girantir be!”

Grania, lehenga jinîn ku di zincîra bûyeran de roleke sereke dilîze di dawiyê de bi Tijda re mêr dike. Bi tevahiya 499 bûkzavayên din bi firê dikevin diçin derdikevin serê çîyayên Kurdistanê. Hejmara kesên porzer û çavşîn êdî li Kurdistanê her diçin zêdetir dibin. Bi hatina van îrlandîyan Kurdistan şên û mamûr dibe. Nivîskara pirtûkê vê carê navê fêkiya hinarê (nar) bi navê xanim Graniyê re girê dide, motîva hinarê jî dixê nav mijara pirtûka xwe. Pirtûk bi wêneyên hinaran xemiliye, ji ber vê di dawiya pirtûkê de rengê wêneyan jî zedetir sor dibin. Nivîskar xwendevanan vê carê li baxçeyên hinaran digêrîne. Dewran derbas dibe. Piştî gelek

salan rojekê rêya lêkolerekî fransî li Kurdistanê dikeve, li wir fêkiya hinarê dibîne û dixwaze navekî lê bike. Gelek difikire. Lêkolerê fransî ku çîroka Tijda û Graniyê bihistiye hema tîne navê vê fêkiyê datîne: “Sêvên Graniyê” (*Pommes de Gran-
nia*). Îro di gelek zimanên Ewropayê de peyva ku li cîhê hinarê tê bi kar anîn ji vê kokê tê.

Ev pirtûka bi wêne wisa xuya di-be bona zarokan hatiye nivîsîn. Lê belê kesekî 60 salî wek min pirtûk di carekê de bi kêfxweşî xwend. Careke din dîsa xwend. Divê mirovên hemû temenan (umir) vê pirtûkê bixwînin. Pirtûka Elizabeth A Nolanê ji çend aliyan gelek balkêş e. Cara pêşîn berhemeke edebî têkilîyên kurd-îrlandî ji xwe re kiriye mijar. Dema rojekê dîroka têkilîyên van herdu gelan bê nivîsîn bêguman *Hêstirên Graniyê* wê xwe bide bîranîn. Bi kêmanî niha teksteke ku em bikaribin li ser kar bikin êdî li ber destê me heye. Ew evîn, hesret û hêviya ku di pirtûkê de dikele bi alîkariya gotin û wênan Kurdistan û Îrlanda gelek nêzî hev kiriye. Di pirtûkê de ew teswîrkirina şova (show) 500 rahîbeyên îrlandî bi rastî hêjayî besndayîne ye. Li ser wan de her xweşî dibare. Mirov hew

zane ku dinya tenê ji Îrlandayê û Kurdistanê pêk tê. Di wan nexşeyên ku di pirtûkê de hene jî bes du welat hatine nîşan kirin: Hibernia û Kurdistan. Dema kesekî-kesekê ev pirtûka xwend êdî Îrlanda yan jî Kurdistan yekcar li ber dilên wan dikare hin jî şirîntir bibe. Ev rastiya jî nîşan dide ku edebîyat xweyê hêzeke wisa xurt e ku raste rast dikare mirovan –xweyê van rêzan jî- di bin bandûra xwe de bihêle, kêfa wan bîne, enerjîyeke mezin bide wan. Ne tenê bextê van dilketiyan, di pirtûkê de qeder û enînivîsa Îrlanda û Kurdistanê ku dişibin hev jî car car xuya dibe. Di pirtûkê de ewrên reş jî tên diçin.

Di zimanê kurdî de kesên aqildar, çavvekirî û zîrek re jî gelek caran bi çavekî pak dibêjin: *mîna cinan*. Ew tîpên kurd ku di vê berhema nivîskar de hene (Xêncî Zamoyê tembel) hemû mîna cinan in, cînekurd in, wek mînak ji tunebûnê neteweyek, kurd efrandine. Cinên nivîskar Elizabeth A Nolanê gelek şîrîn, maqûl û zîrek in. Nivîskara ku bi salan bi amadekirina vê pirtûkê mijûl bûye jî dişibe cinan, eger ew mîna cinan nîn bûya efrandineke wiha xweşik nikaribû binivîsîya, bi-afiranda!

Wêne

Seyfî Doğan

seyfi.dogan@arbetsformedlingen.se

Rîyêke reşê dirêj dibê berve rojhilat
û teng dibê wek pira cînwat.

Bareki giran e hesret

Zehmetekê mino zehmet

Jîyan, li derwayî welat.

Wêne yî rengîn e û bi ronahîyêke
tabîî hatîyê qeyd kirin. Tu tiştêkî
sunî, di nav wêne da tune.

Wêneyî bi rîyê asfalt dest pê di-
ke û bi ezmanî heşin diqedê.

Wêneyî li ser rîyê Xelka Jorê ku
berve Kulekê tere li heremê Kanîyê
Jêrê, hatîyê qeyd kirin. Wêne kê
qeyd kirîyê ezî nizanime. Min wêne
ji malbarê “Karacadagliyim” heyne

Çar reng ê hakim in. Reş, hêşin,
zer û kesk. Du objê hîn pir cîh gir-
tine, ezman û rengê wê yî hêşin û
asfalt û rengê wê yî reş. Ew herdû
objê û rengê wêne hema hema tijî
dikine.

Harmonîyêka rengan ê heye.
Rengên hevdû berteref nekine.
Bîlakîs, pişgirtîyê hevdû dikine û
hevdû dertêxîne ortê, pêşkeş dikine
û li hevdu têne. Rêngên wêneyê bi
rastî hawayê wê demê rojê û demsalê
didine. Dema ku meri li dor alîyê rê
dinêre, gîyanên zer xuya dikine û sîh

berve rojhilat dirêj dibine. Lowma,
bawer dikim, demsal havîna dereng
e û wext berêvarê ye.

Wêne yî bêdeng e. Kesek tune.
Tu erebên ku tên û terin tunen. Tu
heywanê ku li kevîyê rê dicêrin ê
xuya nekine.

Li ser pî çepê di quncikî berjêr da
sîya însanê yê ku xuya dike. Di-
kane ku wî însanî, ew wêne kişandî
be. Mimkûne. Dibe ku hevalî wî
anjî, xanima wî wêne qeyd kirîyê û
ew însana li pêş hevalê xwe dawestî
bû û ji bo yêkê jî kete çarçîva wêne.
Ez “wî” bi kar dînim, ji ber ku
kincên qeretê yê, tîpîk kincên ku
mêr hevînî li xwe dikine.

Pîyê wî yê helmeştine, serkot û
por qut e. Ew figura dikane ku jin
be jî? Bawer nekim. Ew cografya
hîn nehatîyê wê merhelê ku jin
wek mêra kincan lixakin. Lê ma ne
wê mane ku jinên ku kincên wang
lixwe dikin tunen. Hejmara wan ji-
nan gelek kêma in.

Baş e ew însana kî ye û cima ew
wêne qayd kirîyê. Rêvîyê derweyî
welat e? Berî ku dest bi rîvîyê xwe
yî derwe yî welat bike, xwest ku



sîya wî li Xelika cîhbîle!? Însanekî kezab û dilşewitî ye!? Wênekêş e? Însanekî ku aşiqê axê xwe yê? Ni-zanime!.

Sîya wî bi rê re paralel berve Kulekê direj dibê. Kulekê li gor Xelke Jor li rojhelatê yê. Deme ku sî berve rojhilet dirêj dibin wextê ji nîvro bi şundayê

Rîyê asfaltê berve rojhilat dirêj dibê û herkî berve rojhilat tere ê ziraf dibê û li şafakê digihê ezman.

Heşînîya ezmên, xwe wek hembêza dayikekê ji rîya reş re vedike û rê jî xwe berdida behra ezmên. Hêşînî bereket e. Dewlemendî ye. Firehîy e. Ji alîyê din da jî rîya teng dijvarî ye.

Rîya reşa ku berve Kulekê, berve xerîbîyê teng dibe, ruh halî însanî ku gundê xwe, malbatê xwe aşqên xwe li paş xwe cîhtîle resm dikê. Ruhê wan însanan wek rîya ku teng dibe, teng dibê û nefesê li

wanan qut dike. Teselîyek heye ku ew jî, rîya reşê berve rojhilat dirêj dibê û bi ezman ve dibe yek.

Ji bo xemgînîyê her malzemeh-eye. Payîz. Gîyayî hîşik bûyê. Rîya reş û rîya ku herkî tere teng dibe. Bêdengî.

A terî ku insên zêda xemgîn dike nivisa ku li jor rê bi koloneki ve bi darxistîyê.

"Karacadag Kasabasi –Güle Güle."

Gotineke giran e. Bawer dikim, bi piranî ji mêwanan re nivîsandini. Çimkî, kesî ku li Xelika hatîye dûnê an jî tekîlîyê xwe bi Xelika re heye Xelika bicîhnîle.

Ez bi xwe nezîkê nîv asir e ku li derve yî Welatî m. Hersal îzinê xwe li gund derbas dikim. Lê min tu caran gund bi ken û dilşayî li paş xwe cîh nihiştîyê.

Hesret barekî giran û bizehmet e. Globalizmê insanî bêruh û bêcan û bê cîh û war kirî ye. Dûnê her-roj mezin dibe. Mîrov xwe di nav mezinîya dûnê da wenda dike û ji xwe re cîhê kî ku xwe lê bi îtibar bi-hesibîne û ewla hês bike digêrê. Ew cîhe jî axa ku li ser hatîyê dûnê ye. Loma insanên cîhê ku lê hatî dûnê anjî zarokatîya derbas bûyê îdealîze dike.

Mejoy bijartî kar dike û bîraninên xweş tîna bîrê merîya. Loma, insanî cîhê ku lê hatî ye dûnê di ser her cîhe din re bilindtir û bi qiymet dibîna..

Bawer dikim herkesekî nostaljî bihistîyê û li ser nostaljîyê xwendîye. Lê nostaljî wek li kevnîyê hewes kirin tê fehm kirin. Ne tam cawte lê naveroka nostaljîyê tam terîf nekê. Nostaljî peyveke kevnê bi Yonanîyê. Mana wê; nexweşîya bîra cîhê ku lê hatî dûnê anjî zarokatîyê lê derbas bûye.

Însanî cîhê ku lê hatîyê dûnê anjî lê zarokatîyê xwe derbas bûyi idealize dike.

Hevalakî min, ji jina xwe re, li Stockholmê qala gundê xwe dike. Heval bi xwe nedikerî here Kurdistanê ji ber wê yekê jî, xanima wî bi serê xwe dice welêt. Heval, deme ku xanima wî li welat bû, ji wê re telefon dike. Xanima hevalê min ji hevalê min dipirse; ka cemê ku li kêlekê malê we zelal diherîkî!? Ka daristana ku tijî darên bi meywel!? Ka çûçîkên ku bi stranên xwe insanan ji xevê sibê radikin!?

Stockholm 2016-01-20

Şîrîna min, welatê min!

Qurdo

Konumuz Kürtçe'deki “**şîrîn**” kelimesi. Ama niyetimiz bir taşla iki kuş vurmak olduğundan, Türkçe **tatlı** kelimesini de **şîrîn** ile ebirlikte ele alacağım. Bu Kürtçe kelime bazı bölgelerde “**şêrîn**” diye de söylenir. Biz burda mesele karışmasın diye sadece “**şîrîn**” kelimesini kullanacağız.

Şîrîn kelimesi iki heceden oluşuyor. “**Şîr**” ve “**în**”. İlk hece “**Şîr**” kelimenin özünü teşkil ederken ikinci hece **—în** de ‘son ek’ görevi görmektedir. Kürtçe son ek **—în** Türkçedeki **—lı, li, lu, lü** soneklerine karşılık gelirmektedir. Örnek: xwê (tuz), xwey**în** (tuzlu), reng (boya), reng**în** (boyalı).

Kelimeyi doğru anlayabilmek için ilk heceden yola başlamamız lazım. İlk hece **şîr**’e baktığımızda şunları söyleyebiliriz. Kelime, Kürtçede süt manasına gelen “**şîr**” kelimesi ile homonimdir (eşşeslidir). Diğer bir anlatımla, **şîrîn** kelimesinin ilk hecesi **şîr**, Kürtçe süt mânâsına gelen **şîr** ile benzerliği, sadece ses benzerliğinden kaynaklanmaktadır. Kelimelerin birbiri ile baskada bir alakaları yok. Bu benzerlik de sadece bir tesadüften kaynaklanmaktadır.

Kürtçe’nin bir çok lehçesinde son bin ila bin beşyüz yılda “**s**” ile başlayan kelimelerin bir çoğu **ş**’ye dönüşmüştür. Yalnız Dersim’de hala “**s**” ile başlayan birçok kelime orijinal hali olan “**s**” ile kullanmakta ve “**ş**”ye geçmemişlerdir.

Bu **s**’den **ş**’ye geçisin en iyi örneğini “**şekir**” kelimesinde görüyoruz. **Şekir**’in orijinali Hindçe **Sakkara**’dır ve orijinal kelime “**s**” ile başlamak-tadır. Kürtçe ve Farsçada bu kelime önce **şakkar**’a sonra da **şeker**’e daha sonra Kürtçe’de bukumlu (tavandin) halin etkisi ile **şekir**’e dönüşmüştür. Türkçe, şeker kelimesi eski Kürtçe (Pehlevi) **şeker**’den alıntıdır. Hindçe **Sakkara** Arapçaya da **Sukkar** olarak geçmiştir, İngilizceye de **Sugar** (**şugır** diye okunur) olarak geçmiştir. İngilizce’de de “**s**” ile başlayan kelimeyi okunuşta zamanla “**ş**”ye çevrilmiştir.

Bu örnekte bize göstermektedir ki **Şîrîn** kelimesinin bir önceki hali **Sîrîn** (Serin, Sarin) olmalıdır.

Sîrîn’i teşkil eden sonek **—în** atıldığında, geriye ilk hece **Sîr** kalır. Bu kelimeyi de, Kürtçe **sîr** (sarım-sak) ile karıştırmayalım. Çünkü

bitki olan **sîr**'in (sarımsak'ın) tatlı anlamlarıyla bir alakası yok. Aksine sîr'in (sarımsak'ın) tadı acıdır. Burda da sadece ses benzerliği söz konusudur. Yani kelimeler homonimdir.

Bu durumda **Şîrîn**'in ilk anlamını bulmak için başka yerlere bakmamız gerekecek. Bize bir akıl versin diye diğer dillerde **şîrîn** manasına gelen kelimeler bir bakalım:

Türkçe **tatlı**, İngilizce **sweet**, (svit okunur), Hollandaca **zoet** (zut okunur), İsveçce **sötma**, Almanca **Süßkraft**, Kürtçe **sîrîn**.

Ben yapmış olduğum araştırmada **tatlı** kelimesinin **tuz** kelimesi ile alakalı olduğunu tespit ettim. Bu bir çok dilde bu böyledir. Örnek olsun diye aşağıya birkaç dilde “**tuz**” ve “**tatlı**” kelimesini bir tabloyla göreceksiniz.

Türkçe **tuz tatlı**

İngilizce **salt sweet**, (svit okunur)

Hollandaca **zout zoet** (zut okunur)

İsveçce **salt sötma**

Almanca **salz Süßkraft**

Kürtçe **sol** (zazaca) **sîrîn**

Özellikle Germen dillerinde **tuz** ve **tatlı** kelimeleri birbirlerine çok benzemektedirler. Türkçe ve Kürtçe kelimelerin bir açıklamaya ihtiyacı var. Türkçe TATLI kelimesine baktığımızda bu kelimenin de Kürtçe

kelime gibi bir sonek aldığı hemen görülmektedir. Türkçe sonek **-lı** (-li, -lu, lü) Kürtçe sonek **-în** ile aynı manaya gelir ve kelimeye **içermek** yada **ihitiya etmek** anlamı katar. Örneğin Türkçe de Renk kelimesine sonek **-lı**'yi yada Farsça-Kürtçe de alınma olan sonek **-in** eklediğimizde, RENKLI ve RENGİN kelimeleri ortaya çıkar ki, bunlar renk içeren yani renge bulanmış manalarına gelirler. Yani Türkçe TATLI kelimesinin ilk manasını bulmak için TAT kelimesinin ne manaya geldiğine ve nerden geldiğini bulmamız gerekiyor. İçine acı katılan köfteye “acılı kofte” deriz. Tuzu fazla kaçmış yemeğe çok “tuzlu” olmuş deriz. O halde TAT da yemeğe katılan bir şey olmalı.

Tatsız yemeğe **tuz** eklendiğinde yemek **tatlanır**. Hatta bazı yemeklere tuz katılmamışsa “bu yemeğin tadı tuzu yok” deriz. Zaten meselede buraya gelip kilitlenmekte yada başka bir deyişle mesele buradan kaynaklanmaktadır. Kanaatimce Tat kelimesi Tuz kelimesi ile aynı kalimedir. Bütün dillerde kelimeler zamanla değişir. Bu demek oluyorki belli bir bölgede tuz kelimesi “**tud**” yada “**tat**” diye değiştiğinde ve bu yemek “**tudlu**” yada “**tatlı**” dediklerinde başka Türkçe lehçeleri konuşan Türkler bunu ilk manası olan tuzla

ilişkilendirmemişler çünkü onlar hala tuz'u tuz diye kullanmaktadırlar. Bu durumda kelime ikincil bir mana edinip dildeki yeni yerini alır. Yani Tuzlu Tadlıya dönüşür. Z -> D değişimine iki örnek: Kadı asker -> Kaz zsker; Zrıya -> Drıya-> Derya; Zasta -> Dasta-> Dest.

Bir antiparentez olarak şunu da belirtmek gerekir ki, tuz eskiden bugünkü kadar kolaylıkla bulunmazdı. Ağır olduğu için de tasımacılığında çok zor idi. Bundan dolayı tuz eskiden bugunkine göre çok daha kıymetli idi.

Tuzun kıymetli olduğu eski dönemlerde, tuz ihtiva eden yemeğe, özellikle tuz katıldığı vurgulanırdı ki, böylelikle yemeğin tadının iyi olduğu belirtilmek istenirdi. Başka bir deyişle tuzlu yemeklerin tadı yerinde idi. Yani tuzlu yemekler tatlı idi. Yani tuz tat idi, tat da tuz.

Hollandaca'da tatlı manasına gelen **zoet** (zut) kelimesi de bu değişimi teyit ediyor. Çünkü Hollandaca'da zoet tatlı manasına gelirken, onun değişik bir telaffuzu olan **zout** (zawt) kelimesi de tuz anlamındadır. Bu zout kelimesi de Hollandaca **zilt** (tuzlu) manasına gelen başka bir kelimeden türemiş. Zaten bu noktada İngilizce sweet ile Hollandaca zilt kelimelerinin aynı kökten geldikle-

ri de bütün etimoloji sözlüklerinde bulmak mümkündür. Hollandaca zilt'de (tuzlu) de görüleceği üzere kelime **zil** (sol) ve sonek **-t**'den oluşmaktadır.

Hint-Avrupa dilinde tuz'un “*sal” olduğu bugün konu ile ilgili bütün sözlüklerde görülmektedir. Aynı kelime Proto-Hind-Iran dillerinde ‘**sol**’ olmuş olmalı. Yani Kürtlerin ataları tuz’a **SOL** derlerdi. Bugün Kürtçenin Dimili (Kirdki) lehcesinde hala tuz’a **SOL** denmektedir.

Sol (tuz) kelimesi – **în** son ekini aldıktan sonra değişik lehçelerde değişik şekillerde telaffuz edilmiş ve zaman içinde yeni formlar ve manalara bürünmüştür.

Bundan dolayı, artık kelimeler arasındaki bağlantı kopmuş oluyor. Aynı süreci Türkçe de yaşamıştır. Türkçede de sonek **-lı** yüzünden tuz'daki “**z**” kelimesi “**d**”ye dönüşmüş ve zaman içinde kelimenin ilk manası da unutulmuştur. Bunu Hollandaca ve İngilizce için de söylemek gerekiyor.

Kürtçede (aynı zamanda kardeş dil Farsçada da) sonek –**în** yüzünden Sol'un “l” harfi daha kolay telaffuz şekli olan “r”ye dönüşmüş (**solîn** -> **sorîn**), ve nihayetinde de ilk harfi s'yi (şeker örneğinde olduğu

gibi) ş'ye dönüştürmüştür (**sorîn** -> **şîrîn**). Böylece özünde tuzlu demek olan **ŞÎRÎN** kelimesi yeni anlamıyla ortaya çıkmıştır.

Bir çok dilde tuz ve tatlı kelimelerinin dikkat çekici bir şekilde birbirlerine benzemektedir. İşin ilginç tarafı tatlı kelimesinin « bal » ile alakalı olabileceği akla daha yakın durmasına rağmen, yukarda örneklerini verdiğimiz dillerin hiçbirinde bal kelimesi tatlı kelimesine benzemektedir:

Türkçe **Bal**, Kurmanci **Hingiv**, İngilizce **Honing**, Hollandaca **Honing**, Almanca **Honig**, İsveççe **Honung**.

Konumuza son vermeden önce şunu da belirtmek gerekir ki Kürtçe'den verdiğimiz örnekler Kürtçe'nin Kurmancî lehçesine aittir. Kürtçe'nin Dimilî lehçesinde **sol** tuz zaten demek, **solin** da tuzlu manasına gelmektedir ki bu da yukarıda verdiğimiz Kurmanci ***şirin** kelimesindeki ses ve anlam kaymasını teyid etmektedir. Öyle anlaşılmaktadır ki Dimili lehçesi Hint-Avrupa ana dilindeki **sol** kelimesini hiç değiştirmeden kullanmaya devam ediyor.

Kurmanci'de bugün tuzlu manasına gelen bir **sor** kelimesi de vardır ki bu kelime de **şîrîn** kelimesinin ya-

şadığı sürecin bir benzerini yaşamış olmalı. Çünkü Proto-Kürtçede tuz manasına gelen **SOL** kelimesi s -> ş ve l -> r değişimi geçirerek sol dan *sor'a nihayetinde de şor'a dönüşmüştür. Bu örnek de **solin** -> **şîrîn** tezimizi teyid etmektedir.

Yazıya son vermeden önce bir Kürtçe isminde bu **solin** -> **şirin** değişimi ile bağlantılı olduğunu belirtelim. Dilimizde s -> s değişimi yanında birde s -> h değişimi var.

Bence Helin ismi: **Solin** -> **Selin** -> **Helin** olarak bir değişime uğramış ve bu da tatlı mânâsına gelmektedir. Yani Helin isminin "hêlîn" kuş yuvası ile bir alakası yok. S -> H değişimine bir örnek: Dimilice'de 10 "Des" iken Kurmanice'de "Deh" tir. Bu konuda gayet çok örnek var ama bir bir örneğin yeterli buluyoruz.

Bundan sonra tatlı (şîrîn) bir şey yediğiniz de benim gibi sizin de aklınıza hep tuz gelecek mi acaba!

Konunun tadını tuzunu kaçırmadan yazımıza son verelim.

Şekir tu yî, **Şîrîn** tehl e

Cîwan tu yî Ferhat kal e

Şîrîn heyrana te ye, Ferhad qurbanê te be

26-02-2016 Lêlat

Hîrê Meseleyê Luye

Arêkerdax: Serdar Öztürk

Luye û Pisike

Yew luye û yew pisike sohbet kenê.
Luye nêvendena vana:

–Ez zaf hîlekar a û qurnaz a.

Dişmenê luye nêşkenê luye.

Pisike şermena vana:

–Ez zaf kayan nêzana. Ez hetê dişmenan de xo ra yew kay tena zana, o zî remeyîş o.

Luye vana:

–Bira, her durum de kayêde min esto. Ez eşkena bireme feqet ez haldê to rê zaf uzulmiş bena. Ez tersena ke dişmenê to yew roj to bikê.

Çend deqan ra pey vengê tazîyan ame. Nê tazî zî hetê înan ra yenê. Pisike a deqa veceyena serdê dare û kewena mîyandê pelon. Luye zî şaş menda. Fikirîyêna fikirîyêna...Ez çito birema? Luye zaf kayan zana feqet o wext nêzana çi bikera. Wexto ke luye fikirîyêna tazi rast yenê û dora luye gênê û luye kişenê.

Pisike serdê dare re ewnîyena û şikir kena seba ke zaf kayan nêzana...

Luye û Kelo Bêaqil

Yew luye û dostê luye kelo boynizderg vecîyayê reyêk (rayîrêk). Kel zaf saf û luye zî zaf qurnaz a. Hur dêmî zî zaf biyî teyşon rey de.

Kewtê yew quyu (bîr). Hur dêmî zî owk werda werda dima luye hedî nêşka owk biwera û vato:

–Quyu ra owk werdiş qolay a feqet nika de vecê na quyu ra! No durum zî zaf zor o. Ti ningonê xo berz ke ez veceya to ser û ez veceya tewer dima ez a to zî vecî tewer.

Kel vano:

–Ti ke çini bîya ez nêşkena veceya tewer. No fikir zî nêameynê mi vîr.

Luye veceyena tewer, kel quyu de maneno. Dima ra luye vana ke:

–Homa sakal da to feqet aqil nêda to. Eke aqil to estbîbînî ti nêkewtenê na quyu. Ez veceya, bi xatirê ro! Ti zî bifikire û dima ra xo berze tewer. Ez a to rê yardim bikera la nika karê mi, îşê mi esto. Qusurdê mi de mamene...

Luye û Engure

Rocêk yew luye zaf bîya vêşon û kewta yew rez (bax). Engure ra ewnêna ewnêna û ana xo kena mird. Feqet nêşkena biresa engure.

Se kena nêkane nêşkena engure biwera. Dima ra rez ra vecîyena şona. Çey ke ma nêşkenê xo dest ke ma ay ra vanê "ero".

DI PERWERDEYA ZAROKAN DE PARASTIN

Hesen Polat

Her jîyandar/candar bi halekî neçar tê serê erdê. Di nav jîyandarên de yê herî zêfî însan e û demekî dirêj hewcîyê parastinê ye. Loma malbat ji bona însan xwedî maneyek girîng e.

Ger parastin ne tenê di warê maddî de were fêmkirin. Zarokên di bin mayeta dewletê de bê malbatên xwedî kirin di alîyê maddî de zarokên malbatên neçar baştir bîn xwedî kirin jî xwe zêdetir mehrûm dihesibînin. Va jî nîşan dide ku hewcîyên mirov bi tenê cîhanîna hewcîyên maddî pêk nayê.

Bi taybetî ji bona pêşketina kesayetê malbat pir pêvist e. Zarok di malbatê de hinî bi xwe bawerbûnê dibe, gotin û kirinên kesên li malê de ji xwe re mînak digire, gor wan temela keseyeta xwe datîne. Di vî warê de tu tişt cîhê malbatê nagire. Bila neyê fêmkirin ku pîrsgirêkên malbatan tunin. Her malbatek xwedî pîrsgirêkên xwe ye. Bi xwe li serê erdê tu kes bê pîrsgirêk nabe. Kesên ku bê pîrsgirêk in, pîrsgirêka wan tunebûna pîrsgirêkan e.

Bê îstisna her tişt xwedî başî û nebaşîyên xwe ne. Loma „her nîmet xwedî kulfet e jî“ tê gotin. Tu tişt ne di sedî de sed tenê baş, ne jî tenê nebaş e. Başî û nebaşîya her tiştî gor miqdar, dem û cîh dikare curecure bibe fêmkirin. Tiştêkî pir zerûrî dema pir zêde hat kirin dibe ku zerarê bide mirov. Dibe ku piçekî kirina tiştêkî bi zerarê be jî. Va nîşan dide ku li serê erdê tu tişt bê fêyde nîne. Mînak: Alîkarî tiştêkî baş e. Lê alîkarîyek zêde dibe ku mirov hinî teralî ye bike. Axû bi xwe bi zerarê be jî kêma wê dibe derman. Bi vî maneyê de parastin ji bo mezinbûn û pêşveçûyîna mirov girîng be jî dema li ser pîvanê ket dibe sedema bêsinorîyê an jî xwe nebawertîyê.

Zarok çavên xwe li serê erdê vedike nake di pêşîra dîya xwe de xwe bi bawerî hîs dike. Di serî de dergûş xwe û dîya xwe mirovek dihesibîne. Hêdî hêdî ferqa navbera xwe û dîya xwe bihesê jî dê ji bona wê parêzger e. Loma dema dê ber çavan wenda be tedîrîng

dibe, digîre û diqêre. Hêdî hêdî ew hajîya kesên din ên di malbatê de jî dibe. Va kesana gor mezintîya malbatê bav, xweng, bira, dapîr, bapîr, bêsulmeya malê û hîn kesên din in. Her kes gor pêvendîyên ji dergûşê re di dinya wê de cîh digire.

Pir caran wer tê zanîn ku derguş mîna kaxezek spî tê serê erdê, bi gor dîtî û kirinên xwe, ango perwerdebûnê şiklê xwe digire. Îzahetek wusa bi serê xwe kêr û çewt e. Her kes bi bûyîna xwe ya serê erdê ji tev xwe re hinek nişêtên genetîk jî tîne. Her kes xwedî dê, bav û malbetekê ye. Di can û ruhê wî de nişêtên dê, bav û malbata wî jî hene. Her çiqas însan di warê şexsiyeta mirov de hinek tiştên mîna perwerdebûn, orf, edet bîne ziman jî di noxtekî şûve êdî gotin diqede. Her kes mecbûr dimîne ku gor bawerî û nêrinên xwe behsa qederê, behsa tiştên derî hiş, sedemên nayîn zanîn û hwd bike. Bi rastî jî mirov mîna ku tê dîtî nîne. Mevlana Celaleddîn Rûmî dibêje ku „hey mirov tu xwe çî dihesibînî, tu alemekî bi nehsed qat î.“ Mirov hîn ji fêmkirina qatekî re eciz e, ma çer dikare bibêje ku ew ji însan fêr dike? Lê va nayê maneya ku ger di derheqê însan de tu tişt neyê

gotin. Ger di derbarê perwerdeyê de tişt bîn gotin û ji bo fêmkirî nê hewl bîn dayîn ku hinek tişt ji me re aşîkar bibin. Dema mirov tu tişt nekir ewê hêdî hêdî piştve bikeve û tiştên dizane jî bîr bike. Tecrûbeyên mirov nîşan didin ku her hewldan ji bona hewldanek din pêviste û mirov pêşve dixe.

Di ciwata me de bi peyîva perwerdeyê zêdetir perwerdeya derî malê, ango di dibistanan de tê fêmkirin. Bi peyîva terbiyeyê jî zêdetir perwerdeya li mal. Bi rastî parçekirina perwerdeyê ne durist e. Tiştê hat serê mirov bi tenê di wî cîhê de namîne. Bûyera li mal di derî malê de jî li ser zarok xwedî bandor e. Bûyera li derve tê serê wî li malê de jî bandora xwe didomîne. Ger neyê bîrkirin ku perwerdeya li malê li ser zarok xwedî herî bandora qeyîm e. Hinek demên zaroktiyê de bandora perwerdeya li derî malê zêde bibe jî rola perwerdeya li malê her dem diyarke e.

Bunyeya malbatên me yêr gor edetan hat guhertin. Êdî jî peyîva malbatê zêdetir malbatên piçûk; ango dê, bav û zarok tên fêmkirin. Kalik, ap û met êdî ji malbatê nayên hesibandin. Bav zêdetir bi kar re, dê zêdetir bi zarokan re û per-

wedeya wan re berpirsiyar tê dîtin. Dê bi xwe di derve bişuxile jî va bara li ser milên wê ye. Dê bin vê barê giran de tecrûbeyên xwe yên şexsî dinêre û dike ku berpirsiyarîya xwe bîne cîh. Ji ber guhertinên mezin êdî tecrûbeyên dayîkê ên şexsî pir jî nikarin alîkarîya wê bikin. Ne civat civata berê ye, ne jî malbat malbata berê ye. Eynî tişt ji bona bav jî dikarin werin gotin. Hêjmara kanalên televîzyonan bi sedan in, înternet jî di bêrik û nivînên mirov de cîhên xwe girtine. Zarok jî zarokên berê nînin û zarokên dema xwe ne. Tiştên ku di derî malbatê hin bibe û bigire bê hed û bê hesab in. Zarok bin tesîra tiştên di medyayê de zêdetir xwedî hêz in de dimîne. Gor wan dixweze ku daxwezin xwe ji dê û bavên xwe bide qebûlîkirin. Pir caran bav naxweze tu tiştî bibîne û bibihîse, dêya neçar nizane ku çi bike. Dê hajîya pir tiştan e, dixweze ku bavê zarokan jê re alîkarîyê bike. Dema alîkarî nedît mecbûr dimîne gor hestên xwe hereket dike.

Gor temaşekirin û bîhistinên min pir dê û bav: „Em pir neçar û bê îmkan bûn, bila zarokên me hewesa xwe bigirin,“ dibêjin. Tu dê û bav xirabîya zarokên xwe naxweze

û va gotina jî ji bo rindîya zarokan tê bilêvkirin. Lê alîyê perwerdeyî de gotinek pir bi tehlûke ye, dikare zerarek pir mezin bide zarokan. Zarok ba dê û bavên xwe hinî jîyanê û sinorên jîyanê dibin. Dema ji alîyên dê û bavan de sinor nehat belûkirin zarok sinora xwe nizanin, di jîyanê de pir caran kulfeta nezannîna sinorê dikşînin. Dema zarok di salên ewil de alîyê dê û bav de zêdetir hat parastin û jê re pir zêde îmkan hatin amadekirin firsenda tecrûbekirinê mehrûm dimînin. Tecrûbeyên salên piçûktîyê çiqas bîr dereng xistin, destxistina wan weqas bi zehmet dibe. Zarokên piçûk dubarekeirînê zewq digirin, dixwezin zêdetir bicêriwînin. Dema tişteke gor xwestina wan nebû zû bîra xwe dikin, naxeyîdin, bi xwe bawerbûna wan naheje. Ji bona destpêkekê din her dem amade ne. Wexta dê û bav vê firsendê nedin wan, ji ber tecrûbeyan bitirsîn û wan zêdetir biparêsin tecrûbe hildana wan qut dikin. Zarokên bê hildana tecrûbeyên jîyanê mîna masîyên derî avê ne. Dema bi serên xwe man nizanin ku çi bikin, hember jîyanê bi tirs û bi xof dimînin. Pir caran jî kesên derî xwe sedema xof û tirsê xwe dibînin, jîyanê ji xwe

û malbata xwe re dikin doje. Wê çaxi mirov dikare behsa nexaşîyek derûnî bike ku ewê hemû kesên malbatê zehmetîya wê bikşînin.

Tu dê û bav naxweze ku zarokên wan bikevin halekî wusa. Lomaye ku ger dê û bav di alîyekî de îmkana jîyandina zaroktîyê bidin wan, di alîyê din de jî wan îmkannên tecrûbekirina jîyanê mehrum nehêlinin. Hinek tengasî û zehmetîyên zarokan kezeba dê û bavan bişewitîne jî ji ber ku di paşerojê de bikarin li ser pîyên xwe bisekinin lazime wan tecrûbeyan hilbigirin. Ya herî baş ewe ku; zarokan qasî hewciye ji tengasîyan biparêzin, lê bona hildana tecrûbeyên jîyanê jî bidin ber tengasî û zehmetan.

Ramanbûn û nêrîna zarokan ne mîna ên mezinan in. Dê û bav bibin jî mecbûrin ku vê ferqê her dem li ber xwe re binin. Dema wusa neyê kirin dikarin bibin sedemên pir şaşîtîyên mezin. Misogere ku tu bav û dê ji bona zarokên xwe xirabîyê naxwezin. Lê pir caran jî yên bi nezanîna xwe zarokan xirabîyê dikin jî ew in. Ji bona pêwendîyek durist a di navbera zarok û mezinan de bar li ser milên mezinan e. Mezin dikarin xwe daxinin sevîya zarokan. Lê zarok nikarin derbikê-

vin sevîya mezinan. Dema mezin li zarokan re kar ketin mecbûr in ku dakevin sevîya zarokan. Wer nebe muşkilat zêde dibin.

Xetayek bav û dê ên rojane ew e ku rojên îroj hîn mîna doh dihesibînin. Ji bi xwe nekarîne bikin, dixwezin ku bi zarokên xwe re her îmkannên ku ji dest wan tê peyda bikin. Dijwarîyên hatine serên wan tînin bîra xwe û dixwezin zarokên xwe hemû dijwarîyan biparêzin. Dema îmkanan bibînin weqas pir pêşve diçin ku naxwezin zarokên wan nanên di devên xwe de jî bicûn û daqulînin. Bîra xwe dikin û jîyan bi zehmetîyên xwe re xweş e. Rastîya jîyanê zû û dereng xwe aşîkar dike. Zarokên bi şiklekî pir zêde tînin parastinê hildana tecrûbeyan mehrûm dimînin, zû û dereng wan zehmetîyan dikişînin. Tecrûbeyên di dema xwe de neyên hilgirtin dû re dibin xwedî pir pîrsgirêkên din. Dê û bav bi wan tedarîkên sunî dixwestin ku zarokên xwe biparêsin û ji wan re çêyîtîyê bikin. Bi van kirinê xwe dibin sedema tehrîkirina hîgirtina tecrûbeyên wan û ew nîyeta wan e çê ji zarokên wan re dibe xirabî.

Her mirov gor salên xwe ên bîolojîk xwedî salên xwe ên derûnî

ne jî. Dema mirov bala xwe bidîyê dibîne ku di hinek deman de zarok dubareyê zewq digirin, di demekî de pir rik dîkin, di demekî de pir bi hereket in û hwd. Dema dê û bav vê ferqa zarokan nebînin û gor wê hereket nekin ji zarokan re dibin çeper. Ger zarok li gor sal û halên xwe werin destekkirin. Dema mirov ji zarok re îmkânên rehetîyê peyda kirin mîna destek bibîne di şaşîtyek mezin de ye. Destek gor sal û halên zarok ji bona tecrûbe û dershildanê îmkân peyda kirin e. Dibe ku zarok pir zehmetîyê bikêşîne. Armanc rehetîya an jî zehmetîya zarok nîne, armanc tecrûbe û dershildana ji bona paşeroja rastîya jîyanê ye. Herî hînbûna baş di nav rastîya jîyanê de bi hal û hereketên xwe, ango bi kirinên xwe hildayîna tecrûbeyên jîyanê ye.

Qet tiştek şûna tecrûbeyên rojane nagire. Kesên ku çêyîya zarokên xwe dixwezin ger gor salên wan ên bîyolojîk û psikolojîk îmkânên

tecrûbe hildana zehmetîyan bidin zarokan ku di paşerojê de zarok bikarin bi serê xwe wan tecrûbeyan îstifade bikin. Alîkarîya herî baş alîkarîya ku mirov jê tecrûbe û dersan hildigir e.

Pêşgotinek çînî dibêje ku: „Dema tu masîyekî bidî mirovekî birçî, tu jê re çêyîyekî dikî. Lê dema tu masî girtinê ji wî bidî hinkirin, tu jê re alîkarîyê dikî.“

22.12.2015, Stuttgart

Hesen Polat di sala 1964 de di gundê Qizilce ya girêdayî Depê (Karakoçan/Elazığ) hatîye dunê. Dibistana seretayî di gundê xwe de xwend. Dibistana navîn û lîse li Elezîzê xwend. Di 1988 de Zanîngeha Stembolê Fakulteya Siyasetê qedand. Di sala 1989 de hat Elmanyê. Di Zanîngeha Stuttgartê de di beşa sîyaset û perwerdeyê de master kir. Hîn jî li Stuttgartê dije.

Sîyare Têrika -7

Bi zaravayê mikaîliyên Polatliyê

Dr. Mikaîlî

drfyildiz@hotmail.de

Kevork û Os li bazara Stenbolê he-
ta êvarê geryan, ji malikê ra çî hew-
ce bi, gî kîrrîn. Os tenê bûya, diwe
ku ji bo vê danûstandinê deh cara
bihata çarşiyê. Ji ber ku wî qe nedi-
zanî ji malê ra çî lazîm e û çî nin!

Le Kevork yek û yek li ser her
tiştî difikirî, ku ew tişt pir biha wû
,diçû ji dereka din jî dipirsî û bazarî
dikir, hetanî ku fiyat ne bi dilî wî
bi, ew nedikirrî.

Bi a Osê bûya, kê çî xast, Osê
yê ew pere pêdayê û beyî bazariyê
bike, ewna bikirandina. Yek cara
bi avaya bazarîya Kevork, bîna Osê
dimîçiqî, dilteng diwû, le Kevork
dev jê bernedida.

Osê digot diwe ku Kevork û xa-
danî dukana bi hevkevin. Le war
nediwû. Piştî bazarîyê wana bi de-
ste hev digirtin û li badidan. Herdû
jî dilxaş û memnun. Os şaş diwû,
ew kîrrîn û firotina bi vî avayî qe
nasnedikir.

Piştî kirîna tiştê xelas bû, Os jî
fetil û pirr westîya bû. Kevork di
bin simêla da tim li wî mêze dikir
bi xu xu va dikenîya.

Osê ra got;

Osman Efendi te îro bazarî ku
pirr çetin kir ,pîroz dikim! Ka nika
me qehweka li ser arî komirê heq
kir! Ware em herin hêla deryayê
bîna xu bi berxudin û yek qehwa
wexwin!

Osê got le tiştî ku me kirrîyi? Kî
ye wana biwi malê?

Kevork disa bi devken; Meraq
neke, di bazarîyê me da anina malê
jî heye! Siwê giştike bînin malê.

Ji palê da daketin ber bi pira
Galatayê, wexta ku ji wir ra derbas
bûn, bîna masîyê li ser komirê sor-
kirî ket dev û bivîli Osê. Di telaşa
kîrrîna tiştî malê, birçîtîya ji bîr ki-
riwû.

Kevork ew fehî kir û got; Niha
wexta xarinê ye jî! Tu ji mehsiya
hez diki?

Os bi dilî zaroktiya xu bi kêf
keniya û got; Erê.

Çûn li ber mehsîfiroşikî sekinin,
Kevork got; Mehsîvanî mezin! Ka
du mehsîyê nav nê da jî bîdi me!

Mehsîfiroş; Kevork Efendi li
hêlê jî tiştikî vedixwin?



Aksaray-1905

Çi heye? Pirsî Kevork.

Şerbet û ava meyê! Mehsivan bersivand.

Li kêleka behrê kursî daynawûn, di nav kursîya da jî maseka çûk ji texta çêkirî. Xu avêtin ser wana, martiyê spî li ser wan ra difirîyan, li ser behrê keştiyê çûk û mezin li ber bê ji berjêr û berjor va xijdiwûn, diçûn.

Ku rûniştin, Osê westîbûna xu baştir hiskir. Mecal di jinûya da nemawû. Bîna ava behrê kûr bi kûr kişand cigera xu. Gavik şûnva mehsiye wana û du mey ê wana hatin. Bêyî ku ji hevra tiştikî biwêjin, hema nane xu geskirin. Herdu jî pirr birçî biwûn. Tehma mehsi heş li serî Osê bir, pirr xaş bû.

Çitoyî, hûn jê dilxaş in? Pirsî mehsifiroş.

Herduya jî beyî ku ji wî ra tiştikî biwêjin, sere xu berjêr va leqandin.

Mehsifiroş; Walleh hûn war birçî xanê dîkin ku, ez çi bidim we hûne jê ra biwêjin erê!

Piştî xarina mehsiya jî heryekî ji wana qehwek xwastin. Ew jî bi firfireka bi deng wexarin. Dû ra ji mehsifiroş xatir xastin û rawûn berbi malê ketin rê. Ewqas westiyabûn ku, di nivî rê da Faytonek çex kirin, rîya ku mayî bi faytonê çûn.

Ku hatin ber dêrî, Osê dile xu dîsa bi girme girmekê lê dida, bi kelecana bû, jixu fedi dikir ku, ew kelecana wî bala Kevork bikêşîne. Ji ber ku bi lez lêketina dilî wî ji bo yî keçika wî bû, ji bo Asparikê, Asparika ku dile wî jê ra mest biwû, dilê wî ji wî diziya wû. Kevork bi helqa dêrî girt û çend cara lêda, piştî çend

gava deri wewû, Asparik li ber wan bû, hema bavê xu hemêz kir û bi çavî bi meraq tiji û lêpirsî, berê xu çex Osê kir; Ka we tişta malê Osman Efendi gî kirî?

Kevork got; Erê delal min! Me tiştne baş û erzan kîrrîn! Kêfa te ye jî ji wan ra wari, ewna yê siwê bînin malê.

Os; Hoste Kevork nebûya min ê sê cara zêdetir pere bida wana, Xadê jê razi, pirr rind bazariyê dike!

Asparik; Ooo te hîn ez li bazarê ne dî me! Ku ez terim bazarê, esnafê çarşiyê ji ber min direve, cara din em hevra herin!

Osê dîsa fedi kir, serçav lê sor bûn, ji ber ew rehetiya wê. Berî ku di hundir kevin, çûn ser bîrê, ji wir av kişandin û peşta Kevork dû ra wî, dest ninge xu şuştin. Asparikê ji heryekî ra peşgîr hanî wû. Wana dest û ningê xu bi wana zaha kirin û derbasî hundir bûn.

Asparikê pîrsî; Ka ve şiv xarî?

Bavê got; Keça çi mi, em pir birçî buwûn, me li sir pira Galatayê mehsi xarin, lê tu dikari ji me ra yek zerikeyê av û qehweya bîni!

Asparikê bi dengê diljikestî; Bavo min ji we ra şiv da wû ser! Mi digot ka bira Osman Efendi jî biwîne ez çiqas xaş şiva çê dikim!

Bi qehirî û bi xem. Bavê got; Kevaniya mala min, Tu ye roke din marîfetê xu ra Osê bîdi.

Qehwe hatin, ew wexarin, Kevork jî Osê jî xu da ketiwûn, pirr westîya bûn.

Osê ew ferq kir; Hûne ji min ra musaade kin, ezê hîro jî herim nav hevala, ji wana xatîrî xu bixwazim, ji siwê pê da, ez hendi li mala xu bimînim! Û rawû pê û bere xu da ber dêri.

Kevork ji Keça xu ra got; Osman Efendi birêki delala min!

Os bi vê pir şa bû, ew pir diçû ecêwa wî, le li ba malbata Kevork ew tiştêkî normal û medenî bû. Xatîre xu ji Asparikê jî xwast û ket rê.

Heval li benda wî wûn, wî ew çîroka kîrrîna malê û tişta ji wan ra qal kir, le tu qala Asparikê nekir. Him ji xu fedi fikir him jî nedixwast ku bira tu kesik bi wî û Asparikê bikene, bi wana qerf û henekê xu bike.

Roya walîn, ew çû malê, heta êvarê hemala, paleya tişt û barê wî kişandin. Kevork çûwû kar, Asparikê herçik tiştik dihat heme pê digirt û di kişandin zik xêni, bê yî ku ji Osê ra tiştikî biwêji yan jî bi-pîrsi, ew didan ci. Osê qe tu jê ra peyvek nedigot, dilxaş diwû, te ye

bigota ew jina malê yî û mala xu didi ci.

Ku êvar bû, Kevork hat, wek hertim xu şuşt û maşt, Os li ber mala xu li ser sedirê rûniştî bû li benda gotineka wî bû.

Ew hat deste xu avêt pişta wî; Xadan mal! Çito yî?

Di saya we da! got Osê.

Asparikê li hundir şiv amade kirwû, şiva roke berê a ku wana ne xariwûn.

Ji wan ra got; li qusura min nenêrin! Min ne dikarî wana birrijînim, bavêjim!

Hûne îro, teze newin jî wana bixwin!

Gî bi hevra kenyan.

Pele bi rizê tijikirî û bi mihujên çûk û reş dawûn ser. Li ber wê jî şorba avê mirîşka û li doyê jî goşte mirîşka bi sewze sorkirî.

Tehma wana rind bû, Osê bi îstahekê ew xarin. Çavê Asparikê tim li ser wî wûn.

Piştî şiv xelas bû; Osê deste xu rakirin duayeka şivê kir, ji Xadê ra şukur kir, dû ra çex Kevork bû;

Me kêr kir! Bira Xadê zêde bike! Bira bereketa Brahim Xelil bi!

Ji Asparikê ra, di bin çava da; Desti te xaş bin, ew pirr xaş bûn! Asparik li benda va gotinê wî bû,

pir bi kêf keniya û got; Bavo binêri! Osman Efendi ji xwarinê baş fehmediki, ka te rokê min ra negotiye, ewna çiqas xaşin ya na!

Kevork keniya; Keça min eger ew ne xaş bûyana min ew zûva ro ser serî te kiri wûn!

Os wê şevê li piştî sala, ji wexta ku ji Êlê raviyayî da, bi dileki tiji huzur û serbilindî, di mala xu da, di nav nivîni xu da raket. Ew hissiyata serkevtinê, tehma tiştêkî bi kar û kanîna xu hilgirt. Bi vê sermest bû.

Ji reva xu da heta nika, gî ketin xevna wî.

Siwê zû payî bû, derket derva, mala Kevork hîn di xewê da wûn, Stenbol jî. Ji bîrê av kişand devrûyê xu şuştin av sar wû, dest û devrûyê wî cemidîn, le hat xu, heşarî bû.

Derket derva, ber bi mizgefta ku ew lê wezifedari va çû. Ji mala wî da heta wira qasî nîv saetekê diajot.

Hin kes nehatiwû. Wext jî wexta banga limê(Nimêj) bû. Ku kes hîn nedihat yan jî tunne wû, Os derdiket ser minarê ban dida. Os derket ser, bi dengêkî şewat û xaş ban da. Daket jêr li benda pêşimam dawastî ya.

Gavik şuwa ew hat û ji Osê ra; Osman Efendi! Eger tu her sibe

wekîna bandi, di mizgeftê da şûn
namine, xayrî muslim je warin limê
kin. Xadê ji te razî!

Cemaat jî hindik hindik berhev
bûwû, diketin rêzê. Os jî çû, ket
nav wana.

Piştî limiya siwê, wî hezdikir
Qur,anê bixwuni. Ji cemaat ê jî pirr
kes li benda xandina wî dipan.

Qasi saetek û niv ê Qur,an
xwand. Dû ra derketin derva, wî
xwast here dukana Kevork û kete
rê.

Kevork pirr bi kar mijûl bû. Osê
bêyî ku ji wî bipirse, lê dinêrî û ku
hewcedarî hebe, tişt didan wî. Kêfa
Hoste Kevork pê dihat, le bédeng

tenê di bin çava da li wî dinêrî.

Berî xarina nîvro, dest ji kar
berda, pala xu da iskembê û ji Os ê
ra got; Çirax! Tu baş bû! Lê ez ji bo
yarmetiya te tu mehanîyê nadim te,
ger tu pê bizani! Û keniya, ka em
niha tişteki bixûn bi hevra, te ew
heq kir!

Li ber dêri zarokekî qasî devdu
salî disekinî, ban wî kir; Arzunî!
Here ji me ra û ji xu ra jî xarina
nîvro bine! Bira kifte û piyaz bi, ji
Hosteyî Rum bîni, ya wî pirr xaş i!

Çex Os ê bû; Dilî te kiftexa-
rin xwast, tu dikare wari li cem wî
bixu! Him pirr xaş i, him jî paqij
i! Ew kiftê xu ji goştî Kurdistanê



Birca Galatayê-1854

hatiyê çê dike, ji zozanên çiyayê Şerefdînê, Çewlik û Serhadê, yanê ji welatî kal û bavi te!

Osê temel ew ji bîr kirû wû ku, ji Kurdistanê ye, kurd e. Wî digot qey ew li vir hatiye dunê û ji vir i. Jiyana xu ya berê ji heşî xu pa kiri wû.

Bi gotina wî ew carik hatin bîra wî, bi bê kur bifikiri got; Erê goştî pezî diçêri, pir bi tehm il!

Le hetanî ku Kevork ew gotiwû, vê qe bala wî nekşandi wû, ji bo yî wî goşt goşt bû.

Li dû xarinê wexta limê hat, wî destur xwest, çû mizgeftê.

Kevork li pê wî diqirîya; Çirax tu dikari dîsa wari, çito biwi, tu belaş dişuxli û rind dişuxli!

Ji vê şûva, ew der bû ciyê Osê, karê Osê ê duduya. Eger li mizgefta kare wî tunne wû, dihat vir û alikariya Kevork dikir. Ji vî işî hez dikir, le tenê ew ne sebeb wû.

Asparik jî pir cara dihat vir, wî ew pirtir didî, dile wî pê şa diwû. Hendi tu nedixwast here derik din, Heval pê dikeniyen, dizanîn ku wî dile xu di Asparikê da yi.

Digotin; Oso te keçika gawir dî, hevalê xu yî musulman ji bîra kirin!

Os ê digot; Hûn gawir in! Ew ji we musulmantir e!

Vê yekê bala Kevork jî kişandi wû, le wî dizani ku keça wî jî li hember Osê bê bersiv nine, ew jî ji wî hez dike.

Rokê li piştê kar, deriye dukanê bi hevra girtin, Kevork got; Oso tu qe çûye meyxana Stenbolê?

Osê got; Estagfurullah! Xadê ne ke! Çi kari min li ew derên meqrûh û heram heyî?

Kevork got; Lê ez dixwazim bi te va herin derika wakîna, eger tu naxwazi, kes tişteki nebaş bi te nadi kirinê! Lê ez dixwazim bi te va li ser tiştikî pîrr muhim, girîng deng kim!

Os ket şikê, lê nediwêrî, ji wî bipirse, ka ew çî ye!

Bi hevra çûn, li dorberî Galatayê Meyxane hewûn, wî ji derva va ew dîwû, lê bixu qe neketiwû hundirî wana. Hîn ji hevali wî her-tim diçûn, hinika ji xu ra dost jî girtiwûn.

Piranî keç û jini xayrimuslima di vir da kar dikirin, Yan jî e çingene û mitriba.

Ketin meyxaneyekê, xadanî wira rum bû. Ew kar piranî rume Stenbolê dikirin.

Kevork naskirin. Romiyekî zikgir û bejnkî, ber bi wana hat; Hosta Kevork te em ji bîr kirin, Gelo me qusurik li hemberî te kir!

Çima ne? Yan jî perê te tune ne?
Heneke xu bi wî dîkir.

Kevork ew bersivand; Rasti
Yorgi Axa! Bê pere mam, lê te belaş
xizmeta me kir, ma em kêfxaş bin!

Kenyan.

Kevork got; Şûneka bê deng,
sukûn bîdi me, em dixwazin bi
Osman Efendi va tişteki pirr girîng
qise kin!

Yorgi ew fehm kir, pekiya û ci-
hik ra wana da, xizmetkara hema
mase pa kirin, ji wan ra meze û du
xadax anin, xadaxê araqê, ên ha
çûk, qut, ji camê. Ka hûn tişteki
din dixazin paşayê min! Bi rêgirtin
û hurmet ji wana pîrskirin. Kevork
ji beriya xu hîn mecidiye derxistin
da wana. Ew şa bûn û çûn.

Şûneka tarî wû, li quncikan
da lambê gazê û neftê dişewitîn,
herçû çavi Osê hindik hindik tarî
hukirin, hundir baştir xanê diwû.
Masê çûk û gilower, li ser sehpayê
sê ningî û li dora wê jî çend baliv û
kursiyê çûçik hewûn.

Qasi deh panzde kesa di hun-
dir da rudiniştin, li cem hinka jî
jinên boyaxkirî, kil kişandî û sing û
berê wan vekirî rûdiniştin, bi wan
ra ketiwûn gotûbêjê, sohbet û mu-
habbetê. Li ser textekê jî çend jin û
mêrên stranbêj û sazband stranên

eşk û meşkê distiran. Ên ku hinkî
serxaş biwûn jî bi wan va tevhev dis-
tiran yan jî li pê bi keç û jinên li ba
wan va direqisîn, koçekî dilistin.

Osê bi çavi meraq tiji, li wana
dinêrî. Di derheqa va derana da pir
tişt bihîstî wû, le hîn qe bi çavi serî
xu nedî wû. Pirr pê ecewî. Pê kêfa
xu jî hat, ew aliyekî din a jiyînê bû.

Kevork xadaxa xu bilind kir û
bi serî xu jî ji wî ra got ku ew jî a
xu bilind ke Gunehî te li stûyî min!
Got.

Os dudil bû, dindariya wî
nedihîşt ku ew araqê, meyê wexwe,
lê nedixwast dilî bavî Asparika
porzer û çav heşin jî beşkênî. Çave
girtin, di zikî xu da got; Xadê tu
min efu ki û xadaxa xu bi ya Ke-
vork va li hevexistin û ew di carikê
da daqultand. Ew mîna ku dev, bi-
vîl û gewriya wî şewitand û daket
miğda wî. Hilmeka kûr kişand û
şaş û metal li çavi Kevork nêrî.

Kevork jî bala xu li ser wî bû. Di
ser da ji mezeyên ku hatiwûn xarin,
heşe Osê diçûn, lê di tariya meyx-
anê da vê tu bala kesî nedikişand. Ji
xencî Kevork.

Demekê bêyî ku ji hevra tiştikî
biwêjin, xarin, vexwarin û li saz-
benda mêze kirin. Kevork li ser hev
çend cara kuxîya, qirrik xu paqîş

kir. Ku wî dixwast qala meseleka girîng, muhim bike, tim war dikir. Osê kelecانىk girt.

Wî destpê kir; Oso li welêt yan jî li vira tu keçên ku dilê te têdani, tu jê hezdiki hene?

Os; Na na! Pîrr fedi kir.

Oso ez bi sala ji te pîrr kaltir im, le ez jî bûm xort, min jî dilgirt evîndar bûm. Yanê bi vê dixwazim ji te ra biwêjim, ku kesek evîndar bi, ezê vê fehm kim, biwînim. Keça min, delalîya min, porsora min jî dilê xû ketiye xortikî. Lê ew xort him ne yêrmanî yi, him jî ne xristîyan î! Lê xûna min jî pîrr dikele ser wî xortî musulman! Gelo ez pê dizanim ku ew xorta ji dinî xû, ola xû pîrr hez dike, le em jî ji ya xû!

Ez niha jî dipirsim; Ma ez niha çî bikim? Ez naxwazim li ber evîna du dilgirtiya bisekinim. Tu çî diwêji? Musluman û xiristiyanekê dikari bizewici, bêyî ku derbasi dinî wî biwi?

Heta nika qe nave tu xortiki yan jî nave Osê nehanî wû zimên. Os bi xû xû va ket şikê, gelo xortekî din jî dile xû ketiwû Asparika wî? Heşê xû tevlihev bû, ziman di dêv da perçevî, deng bi zorê jê derdiket.

Hoste Kevork ez çûke te mi, ew ne hedda min î ez êqil bidim te! Le qasî ku ez dinî islamê dizanim, tu

kesek bi zorê dini xû nagorri, eger ew jin û mêr jî bin! Pêxemberi me s.a.v û pîrr sultanê osmanîyan jî bi jinên nemusulman va zewicîne û ew mecbur nekirine ku, ew di dinî wana kev in.

Kevork nefeseka dirêj hilgirt û da. Dev kenîya, rû kenîya. Barik li ser rawû bû. Xadaxa xû bi meyê tiji kir û ji Osê car din pirs kir;

Oso nika ji bo evîna keçê min û zavayî min!

Osê qadaxa xû giran giran rakir, lê tu ye bê qey pîye xû kut bûwûn. Bi camêriya ji araqê bi yek va ji Kevork pirs kir; Kî ye ew xorta, evîndare Asparikê?

Kevork bi destî xû ew ji stû da girt ber bi xû kişand û got; Lawo min digot qey hafîz pîr zîrek û baqil diwin, zûtir ber ra terin! Tu yî lawo tu!

Heta nika keçek min hewû, ji vê şûva lawekî min jî heye! Yan jî dilê te ne di Asparikê da ye, min ew şaş fehm kir?

Osê sewt lê qut bûwû; Na na ez pîr jê hez dikim! Ar ket cên, devrû lê sor wûn, lê vê yekê di meyxanê da tu bala kesî nedikşand.

Xarina mayî bi lez û bez xarin, Kevork bang kir hesaw da, xatir xwast û rawûn pê.

Kevork got, nika em herin miz-
gînîyê bi porsora min din jî, bira êşa
dilîwêjîsivikbi, birarûyêwêjîbikene!
Li faytonekê sîyarbûn, ber bi malê
ketin rê. Kevork di rê da dest bi
klameka bi yermanikî kir. Avayî
klamê çiqas nas dihat guki Osê. Jê

fehm nedikir, lê te yê bigota qey
dengbêjekî di oda kalî wî da bi kur-
manci distirê. Ew qas nas...

Dem ber bi biharê wû, erd û ez-
man hindik hindik şên diwû, dar
û gul dipişkuwîn, dengê çûçika hîn
bi şêntir derdiket.



Xurmacî

Tirba lawikî gêwir û zîyareta hêja

Ahmet Yaşar

Di dawîya şerê cîhanê yê yekemîn de, gelek gel, malbat û însan bêcîh, bêwar û bêwelat man. Malbata Bodîz jî ji wan kesan yek bû ye. Malbata Bodîz jî li dawîya şer tên li deşta Haymana li gundê Kirk-pinar-Cêlika (gund niha giredayî Kulu-Konya ye) cîh û war dibin. 4-5 salan jî li wir rûdinin.

Malbata Bodîz bi eslê xwe Rûm in. Axê gund, Omê qere Millo piştgirî dide malbatê û Bodîz dike şîrike xwe û bi hevra dikanekê li gund vedikin.

Rojeka zivistanê li dûkana Bodîz tûtûn xelas dibe. Bodîz, lawê xwe Yordanê 15-16 salî ji bo tûtûne bikire û bîne, dişîne gundê Kozanliyê. Yordan xwe baş dipêçe û derdikeve ser rê. Li rê de berf lêdike. Li Kozanliya gundê Tirka, tûtûna xwe dikire û wedigere ser rêya xwe. Li ser rêya wegerê berf zêde dibe û bahozê berfê derdikeve. Yordan di bin dupîyê de nikane xwe bigîhîne gund.

Dema Yordan dime derengiye bavê wî Bodîz xwe davê malên

gund û alikariyê dixwaze. Gelek mer û xortên gund dibin berfê de derdikevin ser rêya Kozanliyê. Gundî li ser rê, li deşt û nevalan li Yordan digerin. Lê nabînin. Evar dibe û gundî vedigerin gund. Roja din dema berf disekine, carek din derdikevin lêgera Yordan dikin. Demeke bişûnda li ber zinarekî meyiye Yordan yê cemidî dibînin. Meyît digirin tînin gund.

Ji ber malbat ne misilman e, ji bo cîhê tirbê gengeşî dikeve nav gundiya. Gundî naxwazin meyiye Yordan li mezele gund binax bikin. Biryar didin ku Yordan gerege li cîhekî din be binax kirin. Li dawiyê, li joriya gund li ser girekî Yordan binax dikin.

Heta dema mirina Yordan malbata Bodîz li gund xwe bêkes nabîne. Danûsandina malbatê baş dimeşin. Lê dema cenezê Yordan li mezelê gund cîh nabîne tekilîya wan bi eş û giliyan di nav gel de xirab dibin. Baweriya misilmantîya gundiyên Cêlika, rê nade ku ji bo Yordan li nav mezelê gund du me-

tro ax bê dayîn. Ji ber wê meselê malbat pir dieşê. Demeka kin da jî Bodîz malbata xwe digire û koç dike ji gund tere.

Girê li joriya gund edi bi navê „Tirba Lawikî Gêwir“ tê nav kirin. Çand sala ber vê jî çend kesên ji gund li ber xwe didin û sembolik be jî kevrekî mezela didin ser tirba Yordan.

Ji gundê Ceêika-Kırkpınarê Hasan Akbina (Apê Hesen) ji ber pirsên aborî di salên 70de koçî derwayî welat dike û gelek sa-

lan li Danîmarka dijî. Jiyana xwe ya koçberiyê bi êş, derd û pirsan derbas dibe. Hesen li Danîmarka tolerans, kultur û pêşvebûna Ewropa nasdike. Dema tekevût dibe jî vedigere gundê xwe. Rojekê bi hevalê xwe dîtanişê û destek gul digire tere ser tirba lawikî Gêwir, ziyaretê Yordan dike.

Apê Hesen bi ziyaretê xwe ji Yordan an jî ji malbata wî bexşandina kal û pîrên xwe dixwaze an na, ne zanîn!...



Hasan Akbina (Apê Hesen)

Hinek rêzikên zimanê kurdî- kurmancî

Hesen Hüseyîn Deniz

C)- Rêzikên ji bo lêkeran:

1- Lêker dema di hevokê de wekî pêveber were bikaranîn, divê her beşa lêkerê pêk tîne cuda cuda were nivîsandin ku diyar bibe, lê dema lêker wekî navdêr were bikaranîn divê bi hev ve were nivîsandin. Mînak; dema pêveber be: Rojek wê were gelê me bi ser keve. Mînak; dema navdêr be: Serkevtina gelê me wê rojekê pêk were. *Ji vê yekê re di rêziman de, wekî navdêrîkirin û lêkerîkirin tê gotin. Dema mirov axavtinekê dike, mirov dikare bi awayê lêkerî ango bi awayê navdêrî biaxeve. Di zimanên bi awayê nivîskî û hindekarî de xwediyê tecrubeyeke hezar salî ne, vê yekê baş bi kar tînin. Lê mixabin ji ber ku zimanê me ew derfet nedîtiye, di wêjeya xwe de jî em negihîştine wê astê û ji bo wê, mirov nikare kategorîzekirinekê ji aniha ve bike. Lê belê gava hindekariya kurdî bi awayekî fermî li giştîya Kurdistanê serdest bibe û bi salan bidome, nivîsên bi kurdî mezin bibin û bigihêjin asta lêkolînkirina li ser zimên, wê karibin di vê xalê de jî pêşketinan derxînin holê.*

Dema mirov li gelek pirtûk û weşanên kurdî-kurmancî dinêre, dikare bi hêsanî çewtiya bikaranîna lêkeran a di awayê navdêrî û di awayê lêkerî de bibîne. Hinek nivîskar ji ber ku li ser mijarê ne xwedîagahî ne, hema çawa ji devê wan derdikeve wiha dinivîsin. Ezê bê ku navê nivîskaran bidim, ji yek – du pirtûkan, hinek hevokan li vir wekî mînak binivîsim:

Awayê di pirtûkê de hatiye nivîsandin:

... -Ez helbestvan û bilûrvanbûm. Dikaribûm bibûma mele. Ji ber ku ew karê min bûn. Lê kindirbazî ne tu karê min e. Ji xortaniya min pêde baweriya min tiştên wisa nehatî ye. Min ji bo mirovên wisa re digot ...

Di vê nivîsarê de çewtiyên bingeîn pir in. Ez awayê rast binivîsim û çewtiyan bi tîpên stûr diyar bikim:

Ez helbestvan û bilûrvan **bûm**. Min **dikarî** bibûma mele. Ji ber ku ew **karên** min bûn. Lê kindirbazî ne **ti** karê min e. Ji xortaniya min **pê de** baweriya min **bi** tiştên wisa **nehatiye**. Min ji bo mirovên wisa **re** digot...

Lêkera “bilûrvanbûm” divê wekî “bilûrvan bûm” were nivîsandin. Bilûrvanî pîşeyek e û lêkera bûn divê ji navdêrê cuda were nivîsandin. Wekî “ Ez mamoste bûm. Ez xwendekar bûm.”

Li aliyê din, lêkera “nehati ye” divê wekî “nehatiye” were nivîsandin, ji ber ku lêkereke xwerû ye. Ev yek di warê rêziman û wêjeyîbûnê de nîrxê nivîsandinê bêguman kêmtir dike. Dîsa di warê daçekan de, di kurdî de daçekek bi awayê “ji bo ... re” tine ye. Daçek an wekî “ji bo...” an jî wekî “ji ... re” he ye, lê belê bi awayê di nivîsê de hatiye nivîsîn tine ye.

Mînakeke din, ji pirtûkeke din:

... *Heskîf, Hewler û wekedin hukumdariya Osmanîya şer kirin. Ev hukumdariya Mire Kor bi qasî 5 salan berdewamkir. Dîsa listikên Osmanîyan mejûyê Mîr Mihemedê Rewandûzî tevlihevkir...*

Di vê nivîsê de tê dîtin ku lêker ne wekî pêveber wekî navdêr hatine nivîsandin. Ezê cihên çewt dîsa bi nivîsa stûr diyar bikim û awayê rast binivîsim:

... *Heskîf, Hewlêr û weke din hikumdariya Osmaniyan **şer kirin**. Ev hikumdariya Mire Kor bi qasî 5 salan **berdewam kir**. Dîsa listikên Osmaniyan mejûyê Mîr Mihemed Rewandûzî **tev li hev kir**...*

Wekî di van her du nimûneyan de jî tê dîtin, mirov qetên lêkerê pêk tînin bi ser hev ve nanivîse, berûvajî ji hev vediqetîne. Lê ku ez bixwazim vê nivîsê biguherînim awayê navdêrî, wê demê dikarim wiha binivîsim:

***Şer kirina** li hemberî hikumdariya Osmaniyan a Heskîf, Hewlêr û weke din. **Berdewamkirina** vê hikumdariya Mirê Kor a bi qasî pênc salan. **Tevlihev kirina** mejûyê Mîr Mihemed Rewandûzî a bi listikên Osmaniyan...*

Li vê derê “şer kirin, berdewamkirin, tevlihevkirin” êdî ne wekî lêker, wekî navdêr hatine bikaranîn û ji ber vê yekê jî bi ser hev ve hatine nivîsandin.

Wê demê divê di nivîsekê de, em vê rêzika rêzimanî her dem li ber çav bigrin. Lêkereke gava bi awayê navdêrî were nivîsîn êdî ew ne lêker e, ew navdêr e û ji ber vê yekê divê wekî her navekî bi hev ve were nivîsandin, lê belê lêkereke gava wekî lêker ango pêveber di hevokê de cih bigre, ger ne lêkereke hêsan ango sade be, yanî lêkereke pêkhatî be, wê demê jî çend peyvan pêk hatibe, mirov wan peyvan ji hev cuda cuda dinivîsîne.

Çend mînakên li beramberê hev bidim

Awayê Lêkerî

Mirov di şer de **têk çûn**
Serkevtina gel **pêk hat**

Awayê Navdêrî

têkçûna mirovan a di şerî de
pêkhatina serkevtina gel(gelî)

Du erebe **li hev ketin** **lihevketina** du erebeyan
Gel pêl bi pêl **rê ve çû** **rêveçûna** gel (gelî) a pêl bi pêl
Wî li pevçûnê **temaşê kir** **temaşekirina** wî ya li pevçûnê
Mirov dikare van mînakên zêdetir bike.

2- Xaleke din a grîng kişandina lêkeran e. Lêkerên kurdî-kurmancî gava tîn kişandin, li gorî kesan paşgiran digrin. Bi vî awahî mirov dizane bê kîjan kes tê bilêvkin. Bi gelemperî, ger lêkerek ne bi awayekî hişkehişk bê rêzik be, mirov ji bo kesan van paşgiran bi kar tîne:

kesê yekem ê kit / kesa yekem a kit : -im
kesê duyem ê kit / kesa duyem a kit : -î
kesê sêyem ê kit / kesa sêyem a kit : -e
ji bo her sê kesên kom : -in

Em dikarin li ser hinek lêkeran mînakên jî binivîsin:
Lêkera “meşîn”: Lêkerêke bi rêzik a ji koma lêkerên bi –în bi dawî dibin e. Ji bo dîtina rayeka vê koma lêkerê; mirov –în jê derdixe, tiştê dimîne rayek e. Ji bo dema niha pêşgira demîn –di, ji bo dema bê pêşgira demîn –bi ye. Em niha di her du deman de lêkera “meşîn” a ku rayeka wê “meş” e bikişînin:

<u>dema niha</u>	<u>dema bê</u>
Ez dimeş im	Ezê* (Ez ê) bimeş im
Tu dimeş î	Tê* (tu yê) bimeş î
Ew dimeş e	Ewê* (Ew ê) bimeş e
Em dimeş in	Emê* (Em ê) bimeş in
Hûn dimeş in	Hûnê* (Hûn ê) bimeş in
Ew dimeş in	Ewê* (Ew ê) bimeş in

(* Li vê derê tê pêşniyarkirin ku cînavkên dema bê ji ber hêsanitirbûnê bi vî awahî werin bikaranîn.)

Em di her du deman de, li kişandina lêkerê binêrin, li dawiya hemû kesan paşgiran li gorî wan kesan dibînin ku ev yek me bi tîpên stûr dan diyarkirin.

Lêkerên bireserê nagrin ango yê intransitiv, negerguhêz di dema borî de jî vê rêzikê diparêzin. Em dîsa mînakê li ser lêkera “meşîn” bidin. Ji bo lêkerên bi –în bi dawî dibin yê bireserê nagrin: –în tê derxistin, li şûna wê –iya cih digre û bi vî awahî rayeka lêkerê ya ji bo dema borî tê bidestxistin:

Ez meşiyam
 Tu meşiyayî
 Ew meşiya
 Em meşiyam
 Hûn meşiyam
 Ew meşiyam

Tê dîtîn ku derveyî kesê/kesa sêyem ê/a kit, hemû kesên din tîpa xwe ya dawîn şibandine rêzika me li jorê ji bo dema niha û ya bê qalê kir. Ev yek derveyî çend lêkerên bi awayekî hişkehişk bê rêzik in, ji bo hemû lêkeran wiha ye. Niha em mînakê ji bo lêkerê hişkehişk bê rêzik ji bidin:

Lêkera “hatin”: Lêkerê bê rêzik e. Lêkerên bi –tin bi dawî dibin hema hema tevahiya wan bê rêzik in û divê mirov rayeka wan jibere bike. Em rayeka çend lêkerên wiha ji bo dema niha û dema bê binivîsin:

<u>lêker</u>	<u>rayek</u>	<u>işandina dema niha</u>	<u>kişandina dema bê</u>
Hatin	ê	ez tēm, tu tēyî, ew tē, em tēn	ezê bēm, tē bēyî, ewê bē,
Şuştin	şo	ez dişom, tu dişoyî, ew dişo,	ezê bişom, tē bişo(yî), ewê bişo,

Di van lêkeran de tê dîtîn ku mînak; lêkera “hatin” hem pêşgira demîn û hem paşgira kesane daye guhertin, lê her çiqasî guhertibe jî ji tîpên dawîn ên wekî –m, –î, –ê , –n mirov têdigihêje bê qala kîjan kesî/kesê tê kirin. Yanî gava kesek bêje: “tēm”, em dizanin ku kesê/kesa yekem e, gava bêje “tēn” em têdigihêjin ku wê kesên kom werin.

Di paşgirên kişandina lêkeran de çewtiya tê kirin di navbera kesê/kesa sêyem û duwem ên kit te tê kirin. Gelek kes di awayê devkî angî nivîskî de li şûna –î, –e bi kar tînin. Ger em hinek mînak bidin:

<u>Awayê bikaranîna rast</u>	<u>awayê bikaranîna çewt</u>
Ez li ser rêkê dimeşim.	-----
Tu li ser rêkê dimeşî.	Tu li ser rêkê dimeşe/ Tu li ser rêkê dimeşî
	Tu li ser rêkê dimeşe
Ew li ser rêkê dimeşe.	Ew li ser rêkê dimeşe / Ew li ser rêkê dimeşî

Çewtiya ji bo kesê sêyem ê kit/kesa sêyem a kit tê kirin ew ji devokê tê, lê çewtiya li ser kesê/kesa duwem ê/a kit tê kirin bi tevahî bandorê

li ser rêzika rêzimanî dike û xera dike. Ew ji devokê zêdetir, xerabûna rêzimanî ye. Divê mirov nekeve nav vê çewtiyê. Nexwasim ger yek bi îdiaya nivîskariyê dest bi nivîsandina pirtûkekê dike, divê hay ji vê rêzikê hebe û vê çewtiyê neke. Dibe ku di vî warî de ne pîspor be, wê demê dikare berya biweşîne, nivîsa xwe bi kesên li ser mijar pîspor bide sere-rastkirin. Bi vî awahî wê di pirtûkan de kêmasiyên rêzimanî kêmtir bibin û xwendekar zêdetir jê sûd bigrin.

3- Kişandina lêkeran herî zelal di lêkera “bûn” de xwe dide der, ji ber ku lêkera bûn guhertineke bi pir awayan bi xwe re çêdike. Em li van mînakên li jêrê binêrin:

Lêkera bûn a bi navdêrekê ango rengdêrekê re bi kar tê, divê cuda were nivîsîn. Mînak:

Ez mamoste me. Tu mamoste yî. Ew mamoste ye. Em xwendekar in. Hûn xwendekar in.

Derî sor e. Çiya bilind e. Av sar e. Dar kesk in. Ezman sayî ye. Kulîlk rengîn in...

Lê paşgira ji lêkera bûn tê û pêveberê li gorî kirdeyê ditewîne divê bi pêveberê ve -pev ve- were nivîsandin. Mînak: Ez dimeşim. Tu dimeşî. Ew dimeşe. Em dimeşin. Hûn dimeşin. Ew dimeşin.

Di dema borî de ev yek xweştir êşkere dibe. Mînak: Ez mamoste bûm. (navdêrî) Derî sor bû. (rengdêrî) Ez meşiyabûm. (lêkerî)

Di hevokên neyênî de jî ev rêzik divê neyê xerakirin: Ez nameşim. Tu nameşî. Ew nameşe. Em nameşin. Hûn nameşin. Ew nameşin.

Lê dema neyênî bi navdêr û rengdêran were çêkirin peyva neyênîyê `na` dibe „ne“ û divê cuda were nivîsandin. Mînak: Ez ne mamoste me. Derî ne sor e. Ez ne mamoste bûm. Derî ne sor bû.

4- Dîtina rayeka lêkeran li gorî komên lêkeran û kişandina wan:

Li jorê me bi kinahî dîtina û kişandina koma lêkerên bi -în û ya bi -tin bi dawî dibin dît. Em dikarin mînakên berfirehtir bidin. Di hijmara pêşiya me de, emê bi berfirehî, li ser mijara dîtina rayeka lêkeran a di demaniha û dema bê de û awayê kişandina wan bibînin.

Zivistan û baweriyên kurmancên Xorasanê li bara wê

Berat Qewîendam

Cîgeheke taybet a demsala zivistanê li ba kurmancên Xorasanê heye û bawerên li bara vê demsalê li nav xelkê hene. Ez dixwazim li vê nivîsarê hinek ji bawer û urf û edetên kurmancên Xorasanê di heyama demsala zivistanê da pêşkêşî we xwendevanên hêja dikin. Helbet Xorasan devereke mezin û berfireh e û kurdên Xorasanê jî li zêdetir ji 20 bajarên mezin û biçûk û bi çend sed gundan belav bûne. Bi dehan eşîrên mezin û biçûk ên kurmanc li Xorasanê hene ku her yek xwedan taybetiyên cuda ne. Gelek kurmancên Xorasanê li deverên çiyayî û bilind û sar dijîn û hin kes jî gund yan bajarên nizim û germ wek Deregez, Layîn û hwd in û zivistanên wan ne pir sar in. Kurmancên mina hinek ji baçîyan, hêzolan, birîvanan, miliyan, qaçikan, qeremanan û yên din ku hîn jî di rewşa koçberiyê dijîn di zivistanan da ligel pezê xwe berê xwe didin aranên wek Merawe Tepeya parêzgeha Gulistanê, Serexê,

Kaşmerê û derên din ên germtir. Diyar e ku anegorî her êl û eşîrê û gund û navçeyekê hin urf û edet û rêûresmên taybet hene ku kurmanc li demsala zivistanê xwe mijûlî wan dikin.

Ez li vir dixwazim hinek ji bawerî û rêûresm demsala zivistanê li herêma ji sedî sed kurdnişîn û çiyayiya bakûr-rojhilata Qûçanê ji we ra binivîsim. Destpêkê ez dixwazim navê hinek ji gundên vê deverê bînim: Xelikan, Keçeren, Gogan (Ceferqulî zengilî, helbestvanê kurmanc xelkê vî gundî bûye), Dudan, Canan û Çiran, Îg, Pîran, Tiwîl, Ellayan, Xadiman, Keykan, Dewletxane, Kela Xên, Qaçikan, Qazme, Derwendiya jorîn û jêrîn, Zengilan, hemzikan û hwd. Xelkê van gundan ji eşîrên cûrbicûr in: Baçîyan, Badilan, xelikan, Pîran, Kawan, Çûkan, Xadiman, Keykan û hwd.

Ji ber çiyayîbûna vê navçeyê piraniya xelkê ji berê va mijûlî xwedîkirina pêz û dêwîr her wiha

cotkarî û baxdariyê ne. Piranî genim û ceh û nîsk û nûkan diçînin û baxên wan jî ji sêv û gwîz û tirî û hwd in. Em dikarin bêjin çavkaniya sereke ya debara xelkê ajeldarî û cotkarî ye. Zivistanên vê derê pir sar û çaxûn in.

Piştî danasîneke kurt li bara erdnigarî û gundên vê herêmê em vegerin ser mijara xwe. Ez qada lêkolîna xwe biçûk û biçûktir dikim û li vir hinek ji bawerî û rê û resmên di demsala zivistanê da li gundê me yê ‘Kela Xên’ (Kela Xên, Xan) ku min bi xwe di biçûkatî û nûciwaniya xwe da derbas kirine pêşkêşî we dikim. Piştî xermankutanê ku carna heta destpêka îlonê heta navbera vê mehê jî didomand, êdî xelkê dest bi nûkirina banên malan û laşkirina baxên sêv û gwîzê dikirin. Serê qefsê anku mîzanê (destpêka demsala payîzê) dest bi çandina genim dikirin. Berî ku maşînen nû wek traktorên derkevin xelkê bi gan erdên xwe diajotin ku helbet gelek zehmetî didîtin. Helbet wê demê êdî kêmtir ker û ga ji bo ajotinê bi kar dianîn û piranî bi traktorên erd diajotin. Genimê ku vê çaxê diçandin genimî qefsî dihat gotin.

Bi nêzîkbûna zivistanê ra berf û çaxûnan dest pê dikir. Êdî pez bi şevan li çolê danedigirtin. Êvar ku dibû me radihişte çûyê xwe û diçûn li ber deriyê kûçê li benda kêrî diman. Kerî ku dihat her mîh yan beran û kavirek li xwediyê xwe digerrî. Her kes li derê hewşê disekinî û dema ku kerî ji ebr derî malan derbas dibû bi “Hêzkirinê” û gotina Hêzhêz`ê peze xwe vedixwendin hundir hewşê.

Şeva Çêlle (Şeva Çileyê)

Payîz yan heman qefsa me bi dirêjtirîn şeva sale anku Şeva Çêlle (22`ê kanûnê û 1`ê meha 10an a tavî anku dêy`yê) bi dawî tê û zivistan dest pê dibe. Şeva Çêlle li ba gişt xelkê Îranê û ji wan kurmancan şeveke naskirî û binirx e. Xelk vê şevê bi kombûna li dora hev û bi xwarina mêwe û fêkiyan, bi zebeş û kundi-rên kelandî û dendik û xwarin û vexwarinên din li xwe sibe dikin. Malbatên ku lawekî wan bi destgirtî ye xelatekê ji xwarinên rojane, cil û berg û tiştên visa ji bûk û malbata bûkê ra dibin. Bi vê xelatê da ‘Şevçellegî` dibêjin. Ev şeva bi giştî şevêk pîroz tê hesêb.

Çilegir û Çileqîçik

Şeva Çileyê li Îranê bi `Şeva Yeldayê` tê naskirin. Ji Şeva Çêlle heta 40 şevan anku şeva 1'ê sibatê (1ê meha 11'an a tavî anku meha Behmenê) dibêjin `Çellegir` yan `Çilleya Mezin` ku 40 roj in. Her wiha ji 1'ê sibatê heta 20'ê sibatê (destpêka meha Isfendê, meha 12'an a tavî) wek `Çelleqîçik` yan çilleya biçûk tê gotin.

Zivistan û `Gerîyan`

Malbat di şevên Zivistanê da – helbet berê zêdetir û niha kêmtir – diçûn gerîyanê. Gerîyan çi bû? Me piştî xwedîkirina pêz û dêwîr û xwarina şîvê biryar dida ku em herin mala cînaran yan xizmên xwe. Carna jî me şîv nedixwar û dibûn mêvanê şîva wan. Yan jî ewna dihatin mala me. Ferq nedikir. Gelek çîrokên ku niha di guhê me da mane li van gerîyanan jî me ra gotine. Mezinan jî mijarên rojane û rewşa pêz û kar û xebatê digotin û biçûkan jî guhdariya çîrokên dayîk û dapîran dikirin. Eger kesek dengbêj û sazjen hebûya stiranek (kulam) bi deng û sazê xwe dixwand. Xwendina kulamên kurmancî hertim li van civînan hebû:

Ez ki mest im mestê te me, hey lêlo gede,
Ez bazinê destê te me hey lêlo gede,
Her der herî ez ya te me, hey lêlo gede,
Hey lêlo gede, ûrxanê vede,
Şemalê Qûçanê sar e, dele min mede (dest le min nede).

Wê çaxê têlêvîziyon li malan tunebû. Ez qala salên 1990 û dû ra dikim heta 1995-6'an. Kehreba jî tinebû. Me bi batriyan (qûwe) li radiyoyê guhdarî dikir. Bernameya Kurmancî jî mêj va ji Meşheda navenda Xorasana mezin bi qasî saetekê belav dibû û gelek xelkê jê hez dikir. `Her gepek je derekê`, `Xalê Medqulî` û hwd. Wê çaxê li aliyê kasitên Remoyê Xelikî li her malekî peyda dibû. Dengêkî xwe yê pir zelal hebû û gelek xelkê jê hez dikir. Carekê tê bîra min hatibû dawetekê û ez jî li odeya ku wî distirîya bûm. Dema ku dixwand destê xwe lis er guhên xwe datanî û piştî demekê ku dengê xwe radiwestand, bi çar tiliyan li paş guhên xwe

işare dikir. Dema ku mezinekî jê pirsî ku Remo tu çima visa dikî? Got: Ez dema visa dikim kulamên min tênbîra min!

Elê gulê guldeste

Axiriyê xwe aware wûm je dest te
Ez karê xwe dewînmi xelko je şansê pest e
Le ba caylên xelkê gul timêşe sermest e

...

Şevêk hatim elê lê, we mêvanî girda min
Ez aşiq im xecê can, kes nizani rinda min

...

Were henî elê lê, nav Delavan girdê can
Ez ramîsim elê lê, her du çavan girdê can
Îman tune elê lê, wax le dêbavan girdê can
Çarçar di navbera Çilegir û Çileqîçikê da

Bi heşt rojan ku çar rojên dawîya çileyê mezin û çar rojên destpêka çileyê qîçik digirtin ber ra digotin `Çarçar`. Xelkê visan bawer dikir ku serma herî zêde ya zivistanê li van heşt rojan e.

Sê şevên dawîya çileyê qîçik

Sê şevên dawîya çileyê biçûk anku ji şeva hejdehem heta şeva bîtem a sibat`ê (28 heta 30`ê Behmenê), sê şevên taybet in. Li van şevan bi pîroz-bahiya bidawîhatina her du çileyên xelk bi taybet yê ciwan ji serê êvarê heta beşeke şevê derdikevin nav hewş û kolan û ser girêkan û bi coş û kelecaneke bêmînak bi êgir dilîzin. Dema biçûkatîyê me gogên xwe yê ji kincan û tiştên din ji çend rojan pêştir da amade dikirin û di nava niftê da datanîn ta ku rind niftê hilçine xwe û baş agir pêkeve. Bi gihîştina şeva yekem û daketina tarîtiyê bi dehan gogên agirîn li nav hewşan, li ser girêkan, li nav kolanên diçûn esmên û vedigeriyan. Dîmeneke taybet û coş û kelecaneke çêdibû. Li nav hewş û kolanên endamên malbatê û der û cînar li ba hev li dora êgir kom dibûn û ji serê bazdidan û hin tişt digotin:

Çelle çû, mi dad û

Emen Demen (Ehmen û Behmen)

Piştî van sê şevan bi qasî deh rojan ji 20 heta 30`ê sibatê (1 heta 10`ê Isfendê) `Hemen demen` dihat gotin. Helbet li hinek deverên Îranê `Ehmen û Behmen` ji 1 heta 20`ê sibatê dibêjin û bi bawer in ku Ehmen û Behmen du bira bûne ku di dema serma û çaxûnan da ji bo dabînkirina xwareka ajelan berê xwe didin çola û çîyan, lê dema vegeyriyanê û li nêzikî malan ji ber serma zêde jiyana xwe ji dest didin.

Oskîlo Gîsklo

Piştî Emen Demenê bi qasî 10 rojan ji 1 heta 10`ê adarê (10 heta 20`ê Isfendê) Oskîlo Gîsklo digotin. Li vê heyamê hinekan dest bi çandina daran dikirin. Ciwanan hêdî hêdî xwe ji bo kuşniya Newrozê amade dikirin. Lê mijara herî balkêş `HevdeMal` û Kûmaca wê bû.

Hevdemal (Hevde Mal)

Di vê navberê da şeveke hêja û pîroz hebû ku jêra `Şeva Hevdemalê` (Hevde Mal) digotin. Ew şeva jî şeva 3`ê adarê (13ê Isfendê) ye ku ji wê şevê heta Newrozê 17ê şev dimînin. Li vê şevê ku kurmanc şeveke pîroz dizanin xwarinek bi navê `Kûmacê` çê dikin. Ew xwarina xweş ku ji ard û rûn û tiştên din çê dibe visa ye ku kevaniya malê dema ku hevîra wê distirê, moriyeke bi rengê şîn yan kesk dike navê. Dema ku xwarin amade dibe û tînin ser sifrê, bi kêrê bi qasî hejamara endamên malbatê ku hazir in dikin çend beş. Her kes para xwe hiltîne û di nav dewriyê xwe da datîne û bi vî awayî dest bi xwarinê dikin. Tiştê ku li vir gelek balkêş ev e ku ev morî li para her kesî be û li devê her kesî xuya bibe, bi bawera xelkê ew kesek xwedîşans û bextewar e. Dibêjin ku di sala bê da dê rozî û nêmetên Xwedê bi ser wî/ê da dibare.

Di vê heyama salê êdî ev seramaya destpêka zivistanê işkestiye û eger jî berfek bibare zû dihele û vedibe. Carna bayeke tund lê ne weqes sar tê û berf û cemedan dike av ku jê ra `Bayê Kûwatê` dibêjin.

Êşe pêşe`

Piştî Oskilo û Gîskiloyê ji 10 heta 15`ê adarê (20 heta 25`ê Isfendê) `Êşe pêşe` tê gotin. Wer xuya dike ku navê wê ji ber vê yekê ku bi nêzikbûna biharê va pêşû û kurm û kêz êdî xuya dibin.

Jinebî`

Piştî Êşe pêşeyê ji 25 heta dawiya salê `Jinebî` tê gotin û egera vê navê jî ew e ku dibêjin zivistan di van çend rojên mayî da girr û bêrehmiya xwe herî zêde nîşan dide.

Çarşema sor

Şeva çarşemiya herî dawîn a salê ne tenê li nav kurmancan belkê li gişt deverên Îranê wek Çarşema Sor (Çarşenbê Sorî) tê binavkirin ku van salan bi coş û kelecaneke zêde û bêmînak tê lidarxistin û her sal jî li bajar û deverên cûrbicûr gelek birîndar ji ber vê bûyerê çê dibin. Helbet ev babet li berê kêmtir li nav gundên kurmancan hebû yan ez bêjim qet tunebû û pirtir sê şevên dawiya çileyê biçûk weku li jor hat gotin, bi lîstina bi êgir pîroz dikirin.

Eyda Gir (Newroz)

Di dawiya zivistanê jî da Newroz yan visan ku kurmancên Xorasanê dibêjin `Eyda Gir` tê.

Gelek babetên folklorîk û taybetiyên çandî yên kurmancên Xorasanê hene ku mixabin nehatine nivîsîn. Dema ku em li çand û folklore kurmancên Xorasanê dinêrin gelek babetên hevpar ligel kurmancên êzdî, elwî û her viha yên din li deverên cûrbicûr wek Ermenistan, Anatoliya Navîn, Dêrsîm, Semsûr, Sêwas û hwd hene.

Tevî ku gele xebatên hêja li ser nasnameya kurmancên Xorasanê hatine kirin, lê sed heyf û mixabin ku hertim çand û folklore di bin sîbera lêkolîn û xebatên di warê dîrokî da nehatine berçavgirtin û em kêmtir dibînin ku berhemêke baş li vê barê hatibe nivîsîn.

Kiloça serê salê li cem êzdiyên Ermenîstanê

Marîna Siyabend

Her olek (dîn) bi cejnên xwe dewlemend û rengîn e. Baweriya olî jî bi pêkanîna rê û resman, bi pîrozkirina cejnan xurt dibe.

Kurdên êzdî di nav penc hezar salan de, di nav sirgûn, talan, girtin, qirkirin û penaberiye re ola Ezdayetiye xwedî kirine û gîhandine rojên me. Îro jî li tevahiya gerdûnê belavbûyî, di nav netew û oldarên cur bi cur de anîna dîne xwe diparêzin.

Kurdên Ermenîstanê ji sedî nod û neh êzdî ne. Gelek taybetiyên olî êzdiyên Ermenîstanê ji wendabûnê xelas kirine. Yek ji wan Kiloça Serê Salê ye ku tenê ji aliyê êzdiyên Sovyeta berê ve tê pîrozkirin.

Di nav netew û olên cuda de di rojên biharê vejîna xwezayê û destpêka jiyana nû bi cejnên cuda tê pîrozkirin.

Ji bo miletên arî Newroz cejna vejîne ye.

Li cem êzdiyên Kurdistanê bakûr, başûr û rojavayê wek cejna biharê û jiyana nû Çarşema Sor e, li cem êzdiyên Sovyeta berê Kiloça Serê Salê ye. Ferqa van herdu



cejnên êzdiyan dema pîrozkirina wan e.

Kiloça Serê Salê ku di heftiya sêyem a meha adarê de tê pîrozkirin, bi çarşemên hesaban dest pê dibe û di nav milet de her wisa bi navê “Çarşemê hesava” tê naskirin. Pîrozkirina cejnê ji çarşema ewil dest pê dibe. Di her malbateke êzîdî de çarşema yekem û duyem xwarinên baş tên çêkirin. Ji wê xwarinê parek wek xêr ji malê derdixin û dibin mala ruhaniyan an jî cînanan. Her wisa diçin serdana gorên miriyên xwe. Çarşema sêyem tevî xwarinên bijartî kiloç jî tê pêtin.

Kiloç divê ji heft tehman were pêtin: ar, rûn, hêk, şekir û hwd. Morî an jî bişkokekê dixin di nav hevîra kiloçê û wisa distirên ku

xuya nebe. Kevaniya malê çarşema sêyem kiloçê dipêje. Sibeha pencşemê kiloç ji aliyê malxwê (bav an kal) malê ve tê kerkirin.

Kerkirina kiloçê jî taybet e.

Di sêrî de li ser kiloçê bi kêrê rêçê vedikin û ji vê re dibêjin “Xeta Cor”. Gava morî li ser xeta cot xuya bû, êdî kerkirinê berdewam nakin. Lê gava morî li ser xetê dernekeve, kiloçê dikin du beşa. Li ser beşekê navên Xas û Babçakan (Mêr û Miliyaketan) tê nivîsandin: para Şems (Şêşims), Xwedanê Malê, Memê Şivan, Gavanê Zerzan, Xatûna Fexra û hwd. Li ser beşa din navên neferên malê tê nivîsandin. Morî di nav para kîjan Xas û Babçakî de derket, êzdî bibawerin ku wê salê ew dibe piştevan û du-açiyê wê malbatê. Lê ger morî ji para neferekî malê derdikeve, dibêjin ku ew sal wê ji bo wî bibe sala xêr û xweşî û bextewariyê.

Piştî nîşankirina navan malxwê malê kiloç li ser pišta lawê biçûk dişkêne bi wê baweriyê ku ev quwetê dide wî. Hemû bi hêvîyeke mezin para xwe dixwin. Morî ji para kî derkeve pir kêfxweş dibe: dibe sedema pîrozkirinê.

Di vê cejnê de hêk tên kelandin û rengkirin.

Bi hêkên rengkirî dileyîzin û pêşkêşî hevdu dikin. Hêk sembola gerdûnê ye, bi rengkirina hêkê jî vejînê, destpêk û rengîniya jiyana nû nîşan didin. Helbet, şîrove û vegotinên pispor û zanyaran dibe ku cuda bin. Lê ev şîrove li gorî zanîn û gotinên êzdiyên Ermenîstanê pêk hatiye.

Çarşema sêyem berêvarê agir tê dadan: mezin û biçûk, keç û xort, jin û mêr, nexweş û belengaz li ser re banz didin. Li gorî adetê bi banzdana li ser agirê pîroz re hemû êş, nexweşî û xerabî derbas dibin û bi ruheke paqij ber bi jiyana nû ve gav dikin. Di vê cejnê de tê gotin:

Newroza me siltanî

Darê xwe hilanî,

Berî zivistanê da,

Bihar dewsê anî.

Eleqeyên cejnên Newroz û Kiloça Serê Salê çî ne- karê lêkolîner û pisporan e û bila ji wan re jî bimîne.

Emê bi parastina hemû rê û resm, erf û adetên neteweyî û olî cejna Vejînê pîroz bikin.

Kiloça serê salê, hêkên rengîn û agirê newrozê bila bibin sembola yekîtiyê û serxwebûna kurdan, biratiya gelan û aramiya tevahiya cîhanê Çavkanî: <http://yeziden.de>

Bizmarê zingarî û gûzên Qendilê

Seyidxan Anter

Serma tûj û dijwar î. Amedê cîh ji mij û moranê re hişti bû. Nemaze serê sibehê. Pîştî nivro jî hin bi hin dunya xweştir û hewa zelaltir dibû. Mij hînekî sivik bibû.

Wek ku me li hev kiribû, bihara 2013an, bi du dostên xwe yên licî ve me da rê û em çûn Licê. Ez cara yekem ku diçûm Licê. Lêbelê min licî baş nas dikirin.

Hîn dema zarokatiya me de, qaçaxçiyên licî ji Licê dihatin di ser gundê me re derbasî Binxetê dibûn û piştî ji Binxetê dihatin dîsa di gundê me re diçûn Licê. Hespên wan rewan bûn, barkirî li nav siwar û tifingên wan li ser çogên wan bûn. Carnan li gundê me dibûn mêvan û stran digotin. Piştî dema dibistanê de ez rastî liciyan hatim.

Dema ez hatim Swêdê min ji nêz ve gelek dost û hevalên licî nas kir û me li gel hev kar kir. Min di van bûyerên salên dawî de liciyan şopand û li ser Licê gelek nivîs û pirtûk xwend.

Belê, em ji Amedê ketin ser riya Licê. Di ser çemê Tigrîs (Dicle) re heta duriya Farqînê rasterast çûn û

piştî em ji riya Farqînê qetiyên û me berê otomobîla xwe da bakur. Li herêma gundê Mermelerê em gehîştin "koloniyên" liciyan. Ango zeviye liciyan heta deşta Amedê he- ne. Çend kîlometre bi şûn ve depoya mezin a petrolê ku bi pompê dikşînin warê tirkan balkêş û bi heybet bû.

Karaz ku berê gundê Licê bû anihî bûye bajarok, piştî xwe dabû çiyê û berê xwe bi deşta Amedê ve kiribû. Ji Karazê şûn ve me deşt derbas kir û em gehîştin çiyê. Di nav du zencîrên çiyên de naverasteke zirav û dirêj derket pêş me: Deşta Fîsê. Li herdu aliyên re xanî lêkirine. Ê Fîsa kevn li milê rastê, ji rê dûr li hevrazê dixuya. Piştî şewat û xerabkirinê nihî carek din çend mal li heman cihî hatine avakirin.

Em hatin dawîya deşta Fîsê, ciyeke bi dar û ber û çend kavi- lî xaniyan li kêleka rê hebûn. Em rawestan û çûn nav wan kavilan. Yek ji wan ya dîrokî bû ku di sala 1978an de PKK kongreya xwe ya yekem li wir li dar xistibû. Me çend dîmenên wê xirbeyî girtin. Ew di nabêna çend darên tûyê de



bûye pîrozgeheke kurdan. Li hem-ber çiya û Zarga Fîsê û li quntara çiyê ala PKKê li ser zinêr neqş kirî ye, rêwiyên ku diçin û tîn, ji dûr ve wê dibînin. Li vir, mirov, bi xwe bawerî, guman û meraqa licîyan re rû bi rû dibe.

Wa diyare ku li ser riya Licê hertim kontrola leşkerî heye. Her çar aliyên Licê bi leşkeran ve dorpêçkirî ye. Gava mirov dighêje bajêr dezgeha leşkerî heye. Dema mirov ji bajêr derdikeve li ser riya Pasûr û Mûşê qerergaha leşkerî heye. Dibistana "Yatili Okulu" qereqola eskeran e. Û nexweşxane jî kirine qîşla eskerî.

Ordiya tirk radar û qerargeha xwe li hember Licê, Hênê û Pasûrê, ango Torosên başûr û raserî deşta Amedê, li pozê Çiyayê Engul û Hezanê bi cîh kirine.

Di nav gomên deşta Licê re em gihîştin navenda Licê. Em bi otomobîla xwe li nav taxên Licê geryan. Rewş felaket e. Pêwîst nake ku liciyekî ji mirov re behsa vê zilm û zordestiya salan bike, bereqeyên (prefabrîkên) Licê ji mirov re bi dokument behsa zilm û çavSORIYA salan vedibêjin.

Licî dibêjin: "*Gelek caran erd û asîman li me hatiye xezebê.*" Berya erdheja sala 1975an Licê mîna gerdnekê li kontara ciyayê Şîro bû. Aniha bajar li naverastê daketîye jêra çiyê.

"Di dîroka Komara Turkiye de Licê bi gundên xwe ve sê caran ji aliyê dewletê ve hatiye şewitan-din i werankirin. Şewata yekem di sala 1927an de piştî şkestina Şerê Şex Seid bûye. Şewata duyem di sala 1928an de ku licî dibejin sala


şewatê dîsa dewletê şewitandîye. Şewata sêyem û ya herî dawî jî di sala 1993an de destpêkirîye û heta sala 1995 dom kirîye” (Amed Tigris, *Licê*, Weşanên APECê, Stockholm 2008)

Şopa şewatê, derbên fişekan yên li dîwarên malên ji baraqan û kîna li hember desthilatdarîyê, li kolanên Licê aşkere ne. Licê xopan e, Licê wêran e. Licê bîrindar e. Licê li ser pîyan e. Derbên çu yên licîyan giran e.

Aniha pirtûkek din gihiştîye destên me xwendevanan. Şopên şewata Lice yan 1993-1995 an. Ji bo ku bar giran nebe, Rojîn zarg, bi navê *Şopên şewata Licê 1993* an, pirtûkeke dokumenter amade kiriye. Rojîn Zarg dinivîse:

”Min hewl da ku di bîst salîya şewitandîna Licê de navend û gundên Licê yên ku di navbera salên 1993-1995an de hatine şewitandin û vala kirin, bûyerên wan yek bi yek ji devê kesên yekem guhdarî bikim û binivîsînim...” (Rojîn Zarg, *Şopên şewatê Licê 1993*, Weşanên APECê, Stockholm 2014)

Ev dokumenter xwêzîyê di qirika mirov de dihele. Rojîn Zarg rê li ber gelek kesan vekirîye ku serpêhatîyên xwe, gund û bajarên



xwe bi xwendevanan re par veke. Rê bidin min ji vê pirtûka Şopên Şewata Licê 1993, nivîsa bi navê ”Bizmarê Zingarî”, hinekî kintir bi we bighînim:

”... Çend sal beriya niha bû. Em ê ji Hewlêrê biçûna Maxmûrê. Di nav pîkabê (erebê) de ciyê rûniştinê nema bû. Ez û hevalekî li paşîya pîkabê runiştin. Keçika ciyê wê li pêş bû çewalek gûzên Qendîlê danî cem me û çû li ciyê xwe yê li pêş rûnişt. Hevalê ku li kêleka min rûnişt xortekî kej û bêdeng bû. Her çiqaşî hevalan pesnê gûzên Qendîlê dabûn jî, lê derfet çênebû ku ez heta wê demê gûzên Qendîlê tahm bikim. Min ji hevalê kêleka xwe pirsî:

Navê te bi xêr?

Navê min Azad e.

Azad tu ji ku yî?

Ez ji Licê me.

Hooo! Em hemşeriyê hevdû ne.

Ma tu jî ji Licê yî?

Belê ez ji gundê Fîsê me.

Ez jî ji navenda Licê me.

Her çiqaşî ez bi Azad re dipeyivim jî, bala min li ser çewalê gûzan bû. Min destê xwe kir nav çewalên gûzan, çend gûz derxistin û kir nekir di nava kefa destên min de nehatin şikandin. Min ji Azad pîrsî:

Tiştêk wekî kêrê tune ku em gûzan pê bişkînin?

Azad destê xwe kir bêrika xwe kêreke biçûk û sertûj derxist. Min ji dest wî girt û bi serê tûj pê gûz perçekir û kakilê wê derxist... Piştî Azad jî dest bi şikandina gûzan kir. Di vê rêwîtiya dom û dirêj de min dîsa ji Azad pîrsî:

Hevalê Azad ev çend sal in ku tu ji Licê derketî?

Ez piştî şewata derketim û 13 sal in (2006 bû niha dike 21 sal) ku ez ji Licê derketime.

Xebera dê û bavê te heye ku tu li van deran î û dijî?

Na wele, min heta niha ji wan re ne nameyek şandîye û ne jî telefonê kirîye.

Malneketo! Ma tu nizanî ev qas sal in ku dilê dê û bavê te li ser av û agir in. Çavên wan li riya dûr e... Çi mafê te heye ku tu malbata xwe wisa xemgîn bikî?... Ma te bêriya dê, bav, xwişk û birayên xwe nekirîye gelo?

Li ser van gotinên min, Azad destê xwe kir bêrika şapikê xwe kaxizek (salpak) wekî cixarekê pêçandî derxist û vekir. Di nav wê de bizmarekî zingarî derket û di nav kefa destê xwe de nişanî min da û got:

Di sala 1993an de dema li naven-da Licê esker agir berdan xaniyê me û şewitandin, ji derî vî bizmarê zingarî tu tiştêkî me nema. Min ev bizmarê zingarî girt kir bêrika xwe û berê xwe da çiyayên wekî navê xwe.

Azad carek din bizmarê xwe yê zingarî pêça û kir bêrika xwe ya hundir. Ez ketim nav xewn û xeyalan, îlham û helwesteke nedîtî bi min re peyda bû ku dema ez vegerim ez ê lêkolînekê li ser şewata Licê ya 1993an bikim. Mixabim min niha derfet dit ku bîranina bizmarê zingarî bi cî binim. Bizmarê Zingarî di 21 saliya şewata Licê de bû sedema neynika dîroka Licê. ..."

Bi rastî pirtûka "Şopên şewata Licê 1993" hêjayê xwendinê ye.

HESTÊN JAR

Xizan Şûlan

xizan44@live.com

na na
min hê nedîtî ye
karxezala xwe ya revok
rindika fistanqeytanî
esmera çavbelek
kezîzera çavşîn
gulsosina bêhnxweş
dilbera fodil
delala gerdenzêr
yara nazik û lihevhatî
ya ku ez derbider kirim
dil û gurçik û kezeb
li min şewitandî
bedena jar xurdexaşkirî
li bêçaretiya felekê
serî li min tewandî
û stûxwarkirî
ya zelaliya ava kaniyê
li min herimandî
şewqa çira hêviyên geş
vemirandî
ya di gewriyê min de
gotin kirî gulok
na
min hê nedîtî ye
ya ez çengî nav ba û bagera
malwêran kirî
bîranînên keskeşîn

li sir û seqema heyaman
cemidandî
ya serê min kirî
belaya demên rezîl û riswa
ya li nav qelebalixa bajarê xerîb
ez bi tena serê xwe hîştim
li qêrîna salên têkçûyî
henas li min fetisandî
ya bi tîra bijangên xwe yên tûj
ez kuştim
na
min hê nedîtî ye
ya ku ez li pey bedewiya wê
bûme derwêşê gerok
bûme şeyda û mecnûnê
çol û beyaran
ya li nav kelem û striyan
ez şerpeze kirim
li rêwitiya rêyên bêveger
çok li min qerimandî
û ling li min şemitandî
ya tizbiya sebirê bi min dayî
kişandin
di agirê hezkirina xwe de
helandî
ya piştî min dayî tenîştî
dîwarê hesretê
kirasê perîşaniyê

li bejna temenê min kirî
ya ku ez qet ji bêrîkirina wê
têr nebûm
na
min hê nedîtî ye
ya li ber pencera bendemanê
qalpaxa çavên min
qerimandî
pelên dara hewşa dil
weşandî
şev û rojên şad
ji min xeyidandî
ken û girî qedexekirî
ya di bin baranên payîzê de
ez şilopilo kirim
movikên stûyê qedera min
şikandî
na
min hê nedîtî ye
ya ku di parsûyên sînga min de
bîra kul û kederê
nalîn û keserê
û êşa birîna xedar vedayî
bi eşqa xwe ya nepenî
ez dîn û har kirim
ya çiçekên gulîstana rengîn
çilmisandî
ya li ber deriyê meyxaneyan
sermest û sergêj kirim

arzûyên dilê saf
bi xencera koh çînî çînî hûrkişî
ya konê kelecana tirsê
di hinavên min de
vegirtî
nexweşiya tayê sewdayê
li giyanê min
peydakirî
ya ku ez xistim
zîndana tenêtiya bêdeng
ya rondikên xwînê ji çavên min
herikandî
na
min hê nedîtî ye
awirên wê yên melûl
rûkeniya şên û şeng
guliyên bi morî û mircanan
neqîşandî
bejna wek dara çinarê
lezeta lêvên cirifandî
her tim
di xeyal û xewnên min de ye
ez ê
hetanî mirina bêwext
li şopa siya îlhama maçên wê
bigerim
axxx ax
çi jiyaneke bi jan û vikûvala ye
çi dinyayeke xemkêş û bêwefa ye

Înstîtuya Kurdî li Stockholmê
sê pirtûkên Nûman Samsûrî yên bo
zaroka weşand.

Nûman Samsûrî di sala 1980 an de li Anatoliya
Navîn li gundê Sêvika ji dayik bûye.

Samsurî di sala 1994an de koçî Swêdê kiriye.
Niha li zanîngeha Södertörnê xwendekar e.
Samsûrî di heman demê de werger, wênekêş,
blogger û sekreterê Înstîtûya Kurdî li Stockholmê
ye.

Navnîşana xwestinê:


Înstîtuya Kurdî li Stockholmê

Mogårdsv. 13

143 43 Vårby/Stockholm/Sweden

Telefon: +46 8 38 81 12

E-post: kudiskainstitutet@yahoo.se





Newroza me siltanî
Darê xwe hilanî,
Berî zivistanê da,
Bihar dewsê anî